


NÜDEM

No 13 1995



Kovara Hunerî, Edebiî û Çandî

NÛDEM Werger Derdikeve!

Piştî kovara Nûdemê û pirtûkên Weşanên Nûdemê, wê niha jî kovareke xwerû werger, bi navê "NÛDEM Werger" derkeve.

Polîfikaya NÛDEM Werger jî wê mîna ya NÛDEMÊ demokratîk û serbix-we be, bi gotineke din wê Kurdistanî be. Wê salê du hejmar derkevin, ango bîharan û payizan û wê her hejmarek ji dusedî (200) heta çarsed (400) rûpelî be. Wê ebada wê ji kovara NÛDEMÊ mezintir be, lê wê nêzîkî karektera wê be. Ji wergerên çîrok û helbestan wêdetir, wê wergerên teoriya edebiyatê bi giştî, tevgerên edebî, dîroka edebiyatê; li ser roman, çîrok, helbest, piyes, rexne û hwd bin. Em ê bi tenê xwe bi edebiyatê ve jî bî sînor nekin, herweha em ê hejmarêñ taybetî li ser felsefê, li ser dîn, li ser îdeolojiyan jî amade bikin.

Heta jî me bê, em ê wergerên ji zimanêñ orjînal bikin. Ji niha ve hevalêñ me li seranserî dînyayê dest bi wergerên ji zimanêñ mîna îngilîzî, almanî, fransî, tirkî, swêdî, erebî û hwd. kirine.

Kurdo/Kurdê, ger tu dixwazî em bigihîjin pîvana dînyayê û zimanê me têkeve nava refêñ zimanêñ dînyayê, divê tu ji niha ve haziriya abonetiya NÛDEM Werger bikî. NÛDEM Werger ya te ye, ya zimanê te ye, ya miletê te ye!

NÛDEM Werger di nêzik de derdikeve!

NÜDEM

Kovara hunerî, edebî û çandi

Xwedi û berpirsiyare giştî

Chief Editor

Firat Cewerî

Hejmar 13

Bihar: 1995

Serdêñ abonetiyê (salek)

Swed: 190 Sek

Welatên din: 50 \$

Institution 260 Sek

Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê: B. Haco

Pergala berg û rûpelan: Nûdem

Hekkar: Mehmed Uzun, Naci Küçük, Z. Zinar, Xelil Duhokî, Hesenî Metî, Husîn Duzen, Sebnî Botanî, Havîz Qazî, S. B. Soreklî, Bedîrsan Epözdemir, Tosinî Rejîd

Navnîşan/Adress

Termov. 52 2tr.


175 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-583 564 68

NAVEROK

- 4 BERPIRSIYARIYA NIVÍSKAR ◆ Firat Cewerî
- 6 SEREDANÎ ◆ Seydoyê Kûso
- 7 SÎNOR ◆ Tosinê Reşîd
- 10 MALCOLM X ◆ Mihemed Dehsîwar
- 18 SELÎM BEREKAT ◆ Mervanê Keleş
- 21 MÊRXASIYA BI TIRSÊ VE RAPÊÇAYÎ ◆ M. Aydogan
- 31 GUNNAR EKELÖF ◆ Werger: M. Ali Kut
- 35 BEND Û METELOKÊN KURDÎ ◆ Haviz Qazî
- 37 DEMA RONAHİYÊ ◆ Şerefhan Cizîrî
- 44 DIVÊ TURKIYE... ◆ Werger: Şefik Kaya
- 46 ROMANA THE DIPLOMAT ◆ Sebrî Botanî
- 48 BILA ZULMA TE ZÊDE BIBE ◆ YAŞAR KEMAL
- 59 BÊJINGA GÛMANAN ◆ Rûxweş
- 60 MIROV ÇAWA HELBESTAN DINIVISîNE ◆ Mayakovskî
- 65 ÇAR MIST XWELÎ ◆ Şahînê B. Soreklî
- 69 ŞÎRETÊN EHMEDÊ XANÎ ◆ Nûredîn Zaza
- 70 SÊ JINÊN KURD ◆ Zeynelabidîn Zinar
- 78 EMPEDOKLES ◆ Mustafa Düzgün
- 84 HEVPEYYÂN BI CAN YÜCEL RE ◆ F. Cewerî
- 95 DILÊN ŞIKESTÎ ... ◆ Xelîl Duhokî
- 102 KOVARÊN KURDÎ LI SÛRIYÊ ◆ Lokman Polat
- 105 TEFSîRA QURANÊ YA BI KURDÎ ◆ Z. Zinar
- 107 ... DANASîNA PIRTÜKAN

BERPIRSIYARIYA NIVİSKAR



Jean Paul Sartre nivîsa xwe ya bi navê "Berpisriyariya Nivîskar" bi gotineke Dostoyevskî dest pê dike. Dostoyevskî dibêje: "Her mirov li hember her kesî ji her tiştî berpirsiyar e." Paşê, Sartre nivîsa xwe weha didomîne: "Her almanê ku li dijî rejîma Naziyan şer nekiribin, em wan berpirsiyarên wê rejîmê dibînin. Te divê bila li ba me be an li welatekî din be, ger zilmeke nijadî an jî aborî hebe û mirov vê yekê eşkere neke û li dij dernekeve, mirov jê berpirsiyar e."

Nivîskarê navdar Yaşar Kemal jî ji ber ku di sala 1980'ê de bi dengê bilind li dijî cûnta leşkerî dernekîtibû, wî van salêن dawî xwe mîna yek ji súcdaran didit. Wî di gelek xeberdanêن xwe de digot: "Ger mehkemeyeke mafen mirovan li dar bikeve, ez ê de wê mehkemeyê de mîna súcdarekî mafen mirovatiyê werime mehkûmkirin."

Mîna têzanîn Yaşar Kemal bi nivîsa xwe ya di kovara alman Der Spiegel de ji bin wî barî û ji bin wî kabûsê ku ev panzdeh sal in destê xwe xistibû qirika wî, derket, rûmeta xwe ya nivîskariyê û rûsîpîtiya mirovatiyê bi dest xist. Kemal di nivîsa xwe de li ser avakirin û zulma Cumhûriyeta Tîrkiyeyê ya li ser kurdan radiweste û resimekî wê yê hovane radixe ber çavan. Orjînalâ vê nivîsa ku çend hefteyan dinya hejand û çapemeniya dinyayê mijûl kir, ji aliye Felat Dilgeş ve ji bo xwendevanê Nûdemê ji tirkî hatiye wergerandin.

Sartre di cihekî din yê nivîsa xwe de dibêje: "Gava nivîskarek di derheqa vê an jî wê rewşê de deng neke, mirov dikane jê bipirse: Te ji bo çi behsa vê kir lê behsa wê nekir? Ger tu ji bo guhertina hin tiştan dipeyivî, tu çîma ne vê lê dixwazî wê biguhêrinî? Tu çîma dixwazî ku çapa pûllan were guhertin, lê naxwazî li welatekî zilma ku li cihûyan dibe rabe?"

Firat Cewerî

Heta niha rewşenbir û nivîskarêñ tîrkan jî li dû gelek guhertinêñ dînyayê bûn, li dij diktator û sazûmanêñ nedemokratîk bûn, ji bo azadî û rizgariya hemû welat û gelên bindest bang dikirin, lê wan kurdêñ ku ji aliyê karbidestêñ wan ve dihatin pelçiqandin, ji hemû mafêñ xwe yên demokratîk û mirovî bêpar bûn, nedidîtin; an jî diditîn, lê bêdengî dipejîrandin. Navdarek dibêje: "Gava li civatekê neheqî li yekî bibe, ew nîşana ku wê di pêş de neheqî li hemû civatê bibe ye." Xuyaye, neheqîya ku li kurdan dibe, neheqîya ku li edebiyat û edebiyatvanêñ kurdan dibe, êdî serê wê digihîje tîrkan jî, digihîje edebiyat û edebiyatvanêñ wan jî. Loma di gera Derya Reş ya ku jî çarsed nivîskarêñ jî sî welatêñ cihê pêkhatibû de, yek ji nivîskarêñ tîr yê navdartîrîn Orhan Pamuk di sohbetêñ me yên taybetî de digot: "Divê em ji nivîskarêñ kurd û tîrkan komîteyan çêbikin û li dijî vê neheqîyê dengê xwe bilind bikin." Herweha pêşniyaza dengbilindkirina li dijî neheqîya li ser kurdan ji aliyê helbestkarêñ navdar Can Yücel, Arîf Damar û romannivîs û senarîst Vedat Türkali jî dihat. Me di vê hejmarê de bi helbestkarê tîr yê navdar Can Yücel re, li ser kurdan û riyêñ çareserkirina pirsa kurdan hevpeyvîn çêkir. Mîna ku di bersivêñ wî de jî diyar dibe, êdî rewşenbirêñ tîrkan jî ji wê sazûmana Tîrkiyeyê aciz bûne, dixwazin li dijî xwînrîjandina wê rawestin. Hevpeyvînê bi vî babetî yên bi nivîskarêñ tîrkan re wê di hejmarêñ pêş de jî bidome.

Di van demêñ dawî de termêñ "ekol", "rônesans" û "dema ronahiyê" di nava kurdan de pirr tête bikaranîn. Hin kes behsa ekolêñ edebiyata kurdî dikin, hin kes di întelektuelî û hişyarbûna kurdan de behsa rônesans û dema ronahiyê dikin, hin kes jî li dijî van hemû terman derdikeyin û civata kurdî civateke paşdemayî, jihevdeketî, birakuj û dûrî zanistiyê dibînin. Xuyaye wê ev munqaşeya han demeke dirêj dom bike. Şerefîan Cizîri di nivîsa xwe "Dema Ronahiyê" de civata kurdan ya îro beramberî civatêñ dema ronahiyê dike û bi mînak nîşanêñ dema ronahiyê tîne ziman.

Nivîskarê Nûdemê yên nû Mihemed Dehsîwar di vê hejmarê de li ser jiyan û nêrîna lehengê emerîkî Malcolm X radiweste û jîyana wî ya balkêş ku bi trajedî dawî tê, bi civat û kultura kurdan ve girê dide. Ev quncika ku me bi navê "Lehengên Civakî" vekiriye wê dom bike. Di hejmarêñ pêş de jî, em ê ji pênuşa Dehsîwar li ser Gandhî, Martin Luther King, Nelson Mandela û hwd. bixwînin. Em bawer in ku nivîsen di vî babetî de valahiyekê di Nûdemê de dadigirin. Herweha wergera Süleyman Demir ya ji Mayakovskî "Mirov Çawa Helbestan Dînîvisîne" jî di warê xwe de nivîseke balkêş e. Ev nivîs jî wê di çend hejmaran de bidome..

Bi hêviya ku wê cenawirêñ welatê me mîna "cenawirêñ ku di neynika hunerê de spehî dibin" mervan bibin, ez Newroza we ji dil pîroz dikim. ↗

SEREDANÎ

Di şevek reş de
ba çû seredaniya baranê...
di rê de rastî ewran hat,
yên ku ji baranê qeherîbûn,
ji ber ku wê xwe guhertibû teyrokê,
û roniya hîvê gemarî kiribû,
Dilê ba şikestî ji ber kirina baranê...

Ba vêca bi rê ket ber bi seredaniya berfê,
di rê de rastî daristanekê hat,
ya ku li ber mirinê bû,
wê nedikarî êdî bîhna xwe hilde,
ji ber ku berfê xwe guhertibû heriyê,
û li ser wê bariyabû,
Dilê ba şikestî ji ber kirina berfê...

Ba çû seredaniya tavê,
di rê de rastî deryayeke bêav hat,
ya ku bi tîrêjên tavê hatibû ziwa kirin,
Dilê ba şikestî ji ber kirina tavê...

ba biryar da,
vegeriya mala xwe,
di xewa xwe de
xwe guhert tofanekê,
hêvidariya dinyayekê kiri,
dinyayek
tijî aştî,
tijî hevaltî,
tijî azadî...

Seydoyê Kûso

SİNOR

- Were em bibezin, ka ji me kî zû digihîje qotê çiyê.

Mehmed nizanibû Husênê kurmetê xwe çawan mijûl bike. Husên ji serxetê hatîbû, kurxal û kurmet cara yeke-mîn hevdu diditîn. Herdu jî çardeh salî bûn.

Husên amade bû:

- Were, got.

- De ka em li kêleka hev rawestin, hema min got sisê, em ê bibezin. Mehmed got û bi milê Husên girt.

- Baş e.

- Yek, du, sê.

Mehmed destê Husên berda û bêyî li dor xwe binihêre da hevraz. Husên berê hinekî bi şûn va ma, lê paşê hat ji kurxalê xwe derbas bû û berî wî gîhîste serê çiyê.

- He, çawan î.

Hilke-hilka Husên bû û zîpikên xwîdanê ser enî û rûyê wî di çûrisîn.

- Baş im, ez ê çawan bim.

Bêhna Mehmed nedihate ber û dengê wî dihate birî-nê.


- Ji te tirê ku min bixwesta ez ê nikaribûma berî te bigîhîstima serî. Lê min got mîvan e, xatirê wî nekevim.

Piştî hinekî bîna Mehmed hate ber, got.

- Erê, lê çawan, lema usa bîn çîkyayî. Welle te bikaribûya, te li mîvantîyê nedînihêrî.

Her yekî li ser kevirekî rûniştî, bi milê potê xwe xwîdâna ser çavêن xwe paqîj dikirin. Hê demeke dirêj bîna wan nedihate ber wan.

Ji bakûr bayekî nermî û hênik dihat. Rast e hinekî sar bû, lê ew ba li xorxen kesirî xweş dihat. Ewana ser qotê topekî ne bilind bûn, dora wan beriya Mêrdînê, ku ji bakûr bi cêrga çîyayêن bilind qut dibû. Binatara wan çe-



TOSINÊ REŞİT

mê Dicle bû. Alîyê rojhilat jî ser asoyê bi zincîra çiyayên bilind qut dibû. Lê li alîyên rojava û başûr heta çav-çava bibire, berîya rast î bê serobin bû, tenê cî-cîya nolî lodêñ gîhê topikêñ biçûk jî rasta berîyê bilind dibûn. Li cîkî pir dûr erd û esman di nav xumamê da digihîstine hev.

Xêlekê şûnda, gava bîna wan hate ber wan, Husêñ destê xwe ber bi çiyayê li bakûr dirêj kir û got:

- A gundê me wa ye, ha, dibînî, li berpalla wî çiyayê bilind. Binihêre li cihekî çawan xweş e.

- Bavê min jî min ra gotîye, wekî gundê we pir xweş e. Ne axir berê mala me jî li wî gundi bûye.

- Welatê me gişk xweş e, lê ne welatê we, kîjan alî dinihêri, berîya hişkehola ye

Piştî bezê kêfa Husêñ bi cîh bû û wî dixwest di her tiştî da serdestîya xwe nîşan bîke. Ev gotin li Mehmed xweş nehat û wî jî xwest bi ten bersiva kurmetê xwe bide:

- Ew kîjane welatê we, welatê me. A, heتا pişta wan çîyan jî Sûriya ye. Em vî sînorî nas nakin û rojek bê em ê axa xwe jî we bistîniñ.

- Ci, ci, ew kî jî te ra got, wekî ew Sûriya ye, Husêñ bi metelmayî pirs kir.

- Kî got! Kî gerek bêje, meelimê me got, kî got. Yan dibe meelim weke te nizane, Mehmed usa bi xwe bawar got, qey bêjî gotina wî kîrta kîvir e.

- Meelimê te, meelimê te qet bi tiştekî nizane. Ha, ha, Husêñ guve kenîya.

- Welatê me, Sûriya. Sûriya jî ku hat. Ev axa gişk ya tîrkan e, kafira welatê me perçe kirîye û jî xwe ra sînor danîne. A, wî alî binihêre, Husêñ destê xwe dirêjî başûrê kir, heta çavê te dibîne welatê tîrka bûye. Di dînyayê da dewleta lape zor Tîrkîya ye,

miletê lapî baş, miletê ji şerefa misilmanan ra xwedî derdikeve, miletê tîrke û ez serbilind im, wekî tîrke im.

Husêñ usa zû-zû dipeyivî, qey bêjî ditirsiya yek navbirîyê bide gotinê wî û ew nikaribe gotinê xwe bibe sérî.

- Pah, pah, çû derkete ku, ha. Îcar bi gotina te tu tîrke û, erê? Mehmed xwest kurmetê xwe hinekî nerm bike.

- Erê, ez tîrke im û meelimê me ez begçîyê zimanê tîrkî kîvî kirime. Gava şagirt di nav gund da, an jî di malêñ xwe da bi zimanekî din dipeyivin, ez jî meelim ra dibêjîm û meelim wan ceza dike. Zarokêñ gund gişk jî min ditirsin, Husêñ qure-qure got û bêyî li benda gotinê Mehmed bimîne jî ciyê xwe rabû û berê xwe da gund.

Mehmed qasekê usa rûniştî ma û mèze dikir, ka Husêñ wê çî bike. Lê gava dît, ku Husêñ berê xwe daye gund û qet li pişt xwe jî nanihêre, ew jî bêyî dilê xwe jî cî rabû û da pey Husêñ.

Di rê da herdu jî bêdeng bûn û usa jî gitîstîne malê.

- Xwedê bike yeke xêr, ew çî bûye, rûvîyê reş di navbera we ra baz daye, Pîrik li hewşê rastî wan hat. Kuro, Mehmed, emrê te kin be, ne kurmetê te mîvan e, te çawan bi wî ra şer kirîye.

- Şerê ci, pîrê, kî jî te ra got, wekî me şer kirîye, Mehmed hêdîka di ber xwe da got.

- Lê jî bo çî hûn herdu jî usa werimîne û bi hev ra napeyivin.

- Ez nizanim, jî Husêñ pirs bike, Mehmed got û ber bi malê çû.

- Çîma jî min, bira jî te pirs bike. Bêje, bira pîrê jî bizanibe ka meelimê te te çawan fîr dike, Husêñ pir bi gotinê xwe bawar bû.

- Tişt nabe, kurê min, tu kurekî zîrek û,

tu ji pîrka xwe ra bêje ka we li ser çi li hev ne kirîye.

Pîrikê destê xwe da ser milê Husêñ.

- Mehmed dibêje heta gundê me, çiyayê me ji pêra gişk Sûrya ye. Meelimê wî usa ji wî ra gotîye.

- Tu ji dibêjî heta Şamê welatê tirkan e, lê kî tu usa fêr kirî, Mehmed vegeŕiya ser Husêñ.

- Min navê Şamê hilnedaye, ew ji te ji ber xwe derxist.

- Lê heta çavê te dibire çîye? Dighîjj Şamê êdî.

- De tu çawa fam dikî ew karê te ye.

- Hilbet karê min e, na bi gotina te be, tu tirk i,-Mehmed fikirî ev gotina wî wê serê lodê bigire.

- Erê, ez tirk im, lê gotina te çîye.-Husêñ dîsa quloz bû.

Pîrê, ku heta hingê guh dida wan û dixwest bizanibe li ser çi dilê wan ji hev maye, dît wê dîsa germ dibin û ew dane rawestandinê.

- Hela sebir bikin, sebir bikin, Pîrê got. Ger wilo here hûn ê bi dara rabine hev.

Pîrê demeke kurt bêdeng ma, paşê gotina xwe domand.

- Her yekî ji we li gorî gotina meelimê xwe dibêje, ne?

Herduya ji bi erênî serêne xwe hejandin.

- Usane meelimên we herduya ji derewa dîkin, Pîrê serê xwe bilind kir û bi fen li çavêne wan nihêrî.

Xorta metel mayî li çavêne hevdu nihêrîn.

- Erê, erê, derewa dîkin, usa li çavêne hevdu nenihêrin. Çiqas min bihîstîye, çiqas ez bi vê nexwendîtiya xwe zanim, vî alî sînor ji, wî alî sînor ji welatê kurdan e û li herdu alîyan ji ji berê da kurd dijîn. Hela

berê qet ev sînorêne ha tunebû ji. Ez nizanîm ev sînor kî danîye, lê va ye keça min li serxetê dijî, kurê min ji li vira, li binxetê.

Pîrê hinekî fikirî, bi ser da zêde kir,

- Mabuyê min, kalkê we yê rehmetî di şerê Şêx Seyîd da şehîd bû. Wan hingê dixwestin dewleta kurdan ava bikin. E, di dû ra me qet çi dît, çi nedît. Ji zilma tirkan nîn bû me gund û warêne xwe hîştin, hatin derketine vira.

Herdu xort di ciyê xwe da rawestîyabûn û nedilipîn. Pîrê di serên wan da her tiştev li hev kiribû.

...Hilbet wê rojê xorta ewqas ji bawarîya xwe bi gotina pîrê neanîn, "ew çawa bû, ku meelimên wan heduya ji derewan dîkin. Ne axir meelim merivne xwendî û zane ne û timê tiştên rast dibêjin."

Lê gumanê êdî di dilên wan da cî girt, çavêne wan vekirin. Ji wê rojê da "dewleta kurdan" û ew sînor ji wan ra bûne xem.

...Sal buhurîn. Xortan ji mirovên zane pirsîn, kovar û rojnamên li ser kurdan xwendin, bi rêxistinên kurdan, yêni sîyasi va pêwendî çekirin.

Ü rastî ji bo wan ronî bû.

Niha Hesen bûye Azad, Mehmed ji bûye Serbest û herdu ji "Kalaşnikof" di milên wan da, li çiyayen Kurdistanê ji bo azadiya gel û welatê xwe şer dîkin. 

15 06. 94

MALCOLM X

(1925-1965)



Mihemed Dehsiar

Dîroka mirovaniyê de gelek meriv hene ku di cîvaka xwe de cîhekî giring û taybetî girtine. Ew ji awayên civakî û siyasi bûne pêşevanê civakê; li ser der-dora xwe tesîrek mezin kirine û di dînyê de bûne şexsiyetên leheng û birûmet. Civak bi fikir û ramanên wan, bi zanebûn û pêşevaniya wan gîhiştine pergalên nuh; azadî û rizgariya xwe.

Şexsiyetê leheng ên wek Martîn Luther, Gandî û Mandela ku hîmdarênen damezrandina civakî yên gelê xwe bûn; ne tenê di nav neteweyên xwe de, her wiha li çar aliyê dînyê hatine nasîn û ji tekoşîna gelên bindest û civakên paşdemayî re bûne tîmsalîn rîzaniyê. Ji çar aliyêni dînyê gelên bindest û belengaz li hember koletî û bindestiyê ji fikir û ramanên wan fêde girtine, ew jî bûne lehengên azadî, aştî û wekheviyê.

Cî heyf û mixabin, gelek ji van kesan di jîyana xwe de qedr û rûmeta xwe ji teref civakê negirtine, civakê wan di saxiya wan de ew bi serê xwe û tenê hiştine. Ji bilî vê jî ew ji aliyê hêzên reş û tarî yan jî rasterast bi tiliya wan ji teref hinek hemwelatiyên xwe ve hatine kuştin. Îcar di civakên paşdemayî de wendabûna kesen wiha, civakê bê rîçûdirb dihêle; tarîtî û bêbaweriyê, belavbûn û bêîktîdariyê dixe nav gel. Ya herî xirab jî ew e ku ev leheng ji teref hevwelatî û hetta ji teref hevalên xwe bênen kuştin.

Di dîroka gelê Kurd de -ya kevnare jî û ya nuh jî- gelek rewşen wilo hatine jîyîn. Piraniya serhildan û berxwedanên Kurdan, bi birakujî û xweneyartî têkçûne. Kurd, di gelek serhildanên xwe de biserketine, dewlet û koloniyên xwe jî avakirine, lê bextreşî tiliyên dijmin ew ji hev tarûmar kirine. Gelek lawên Kurd, egitêن Kurd bi tiliyên dij-

min ji teref "Kurdên" bêbext û xwefiroû ve hatine kuştin an jî "firotin". Rewşa Malcolm X û jiyana wî bi tevayî nebe jî, bi gelek awayê xwe û bi taybetî jî kuştina wî ya ji teref hevwelatiyêن wî, dişibe rewşa Kurden ber bi 2000 salan ve.

Jiyana wî û tekosîna wî û di fikir û ramannen xwe de saxlembûna wî ji min re balkêş hat. Belê her wiha saxikbûn û ne xweser fikirandina wî jî ji min re balkêş hat. Lewra jî min xwest li ser Malcolm X lêkolîn bikim û hinek agahdarî di derheqa jiyana wî de pêşkêşî xwendevanêن Kurd bikim.


Malcolm X jî yek ji wan lehengan e ku li ser civaka xwe tesîrek mezin kiriye û li çar aliyê cîhanê hatiye nasîn. Tekosîna wî ya li hember nîjadperestêن Amerîkayê (Ku Klux Klan û yên din) û ji bo azadî û rizgariya reşikêن Amerîkayê, ew li seranserê dinyayê wek pêşevanekî reşikan dixist rojeva gelên bindest û koledarêن serdest.

Malcolm ji malbateke belengaz tê. Bavê wî Earl Little keşeyekî reşik û diya wî Louise jî jineke İndiyan bû. Louise jîna Earl a duyem bû. Ji jîna wî ya berê sê zarokên wî hebûn. Louise jî jê re şes zarûk tîne dinyê. Malcolm ji jîna duyem, di 19-ê gulana sala 1925-an de li bajarê Omaha ku dikeve he-rema Nebreskayê, wek zarokê 7-a tê dinyê. Hîn ew şes salî bû, bavê wî jî aliyê Ku Klux Klan, rêxistina nîjadperestêن spî ve tê kuştin. Şes zarok di stûyê dê ya belengaz de dimînin. Karmendêن sosyalê, ji ber baxiziya xwe, belengazbûna malbatê û şemûzbûna Malcolm, zarûkên piçûk li malan beladikin û malbat jî bi vî awayî jî hev tarûmar dibe. Her du zarokên mezin di zarokiya xwe de jî mecbûrî dev ji dibistanan berdidin û dest bi kar dikan. Zarokên din jî li malan an jî li etîmxaneyan têن belakirin.

Malcolm bi xwe him di zarokiya xwe de pir şemûz û belakir bû û him jî di xortaniya xwe de pir caris serberda bû. Xortekî pir jîr bû û serê wî gelek dişuxilî, lê di wê demê de rewşa reşikêن Amerîkaya Yekbûyî pir xerab bû û îmkanêن xwendinê û xwegihîştandinê gelek kêm bûn. Malcolm jî wek hezaran reşik, piştî çend tecrûbeyên xwendinê ket zaboqan.

Her çiqas ev ji piraniya şagirtan zîrektir û zanetirbe jî, rengê wî reş bû û îmkan û de-riyên xwendegêhê jê re girtûbûn. Malcolm dixwest bibe ewûqat; lê çaxê mamosteyê wî vê gotinê bihîst, pê kenê xwe kir û ew ket listeya reş. Li ser vê yekê Malcolm dev ji dibistanê berdide. Piştire dev ji malbata ku ew xwedî dikir jî berdide lê dikeve zarokxane-ya êtîman. Malbateke spî ew digrin cem xwe û wî weke súcdarekî çendeyekî xweyî dikan. Lê malbat ji ber jîrbûn û çeknasiya wî gelek jê hez dikan û alîkariya wî dikan. Dê Malcolm piştire di serpêhatiyêن xwe de, vê malbata spî yekem kesên spî ku alîkariya wî kirine û firqa rengan neanîne ber çavan bihesibîne.

Malcolm zû bejin davêje û tiştan gelek zû fêr dibe. Ji ber wê jî malbata rengspî destûra wî dide ku here ji xwe re bixebite. Ew bi alîkariya wan destûrê ji karmendêن sosyalê jî digre û dest bi kar dike. Gelek cîh û karan diguhîrîne, lê ew li tu deverê cîhnagire. Piştî çend karêن kêm-meş li cem grûbeke mafyayê dest bi karên dizîn û şelandinê, sextekariya lotterî û tevlîhevki-riñê dike. Bi wan re fêrî kişandîna esrar, ero-în û afyonê dibe. Ew jê re dibe weke jiyana rojane; esrar û eroînê wek çixareyê bikartîne. Li wir jî pê nagire; nexweşî dikeve navbera wî û hevalên wî û ew dîbin dijminêñ hev. Ji bo ku nê kuştin an jî nekuje; li ser



Malcolm X

pêşneyariya hevalekî xwe, xwe ji wê bajarî dide alî.

Ruhiyeta bindestbûnê û di nav nîjadprestiya dijwar, ew dixin bin komplekseke xirab. Lewma jî li ser pêşniyara hevalê xwe dixwaze rengê porê -tevî ku porê wî ber bi sorî ve jî diçû- sortir bike û xingalokiya wî bi şiklekî rast bike. Ji bo wê jî bi derman û kremên curbecur rû û porê xwe dixist bin îşkence û tadeiyîen mezin. Ji ber êşa wê, Malcolm bi rojan nikaribû serî deyne.

Piştî demekê ew û hevalekî xwe tevî du jinêner dest bi şelandina malan û avahîyan dikin. Bi besdarbûna xortekî niv-reşik xwe bi qewettir dikin lê çi pereyê tê jî didin eroînê û dikşînin. Dema xwe li bar û pav-yonan derbas dikirin û diravênu ku dihatin bi van teheran tewa dibûn. Piştî fîrbûna ji-yanek wiha, pere xwe di destan de nagirin. Ew jî him ji bêdiqqatî û him jî serxwesbûnê dikevin nav lepêñ polêñ û dikevin girtîxaneyê.

Di eslê xwe de cezayê dizîn û şelandinê diviya ku du-sê sal bûna, lê ji ber ku ew reşikbûn û dostikên wan jinêñ spî bûn, dad-gehê her yekê heşt sal ceza dan wan û jini-kên spî jî bi kefalerê têñ berdan. Edaleta (!) dadgehê jî bi vî awayî xwe diyar dike.

Dema ku Malcolm dikeve hepsê, lê pir zor tê. Dinya lê teng dibe û xwe wenda dike. Ji esrar û eroînê dûrketin wî hîn bêtir dixe rewşike xirab. Di hepsê de her babe-tên esrar û eroînê hene lê çi feyde pere tune ye. Di hepsê de zilamekî reşik dinase; ew bi xwe misilman e û dixwaze alîkariya Malcolm bike. Malcolm di destpêkê de guh nadê û heta jê tê xwe jê dûr dike. Her çiqas bavê wî keşe bû û derdora wî mesîhî bûn jî, ew bi xwe ji awayê olî ve bêbawer bû. Lê piştî demekê, rastbûn û baweriya wî, zane-

bûn û ciddiyeta wî li ser Malcolm tesîrek mezin dike.

Malcolm jê fîrî usûl têgihîştina pirtûkan dibe û dest bi xwendinê dike lê tiştekî ji xwendina xwe fam nake. Radibe ferhenge-kê datîne ber xwe û him bejeyan him jî maneyêñ wan li ser kaxezê dînivîse. Tişten ku famnake dubare dike û piştre jî ji xwe re bi deng dixwîne. Xwe jî dînyayê û girtîyan qut dike; tevaya dema xwe di pirtûkxaneya hepsê bi xwendin û nivîsandinê derbas dike. Dema razanê jî çaxê ku lembe têñ te-fandin jî li ber lembeya hucreya xwe heta berê şeveqê dixwîne. Jê re xewa zêde pêwist nake, şevê du-sê seet têrî wî dikirin.

Di girtîxaneyê de xwişk û birayêñ têñ se-redana wî jê re pesnê mislimantîyê û qenci-yen wê didin. Jê re qala serokê rêexistina Îslam Nation Elîjah Muhammed û pîroziya wî dikin. Ev jî Malcolm re dibe meraq û ew dest bi xwendina agahdariyêñ li ser Îslamî dike. Bi alîkariya hepsiye misilman to-be dike û dibe misilman. Piştî ku xwe fîrî namenivîsandinê dike, dest pê dike û her roj ji Elîjah Muhammed re name rîdike. Bi girtina nameyêñ Elîjah hîn pirtir dilşad dibe û xwe bi her awayî dide Îslamî.

Mirov ji der-dora xwe fîrî tişten nuh di-be û li bûyerêñ dora xwe bi çavekî rexnegi-rî dinêre. Kesên ku di dilên wan de xerabî heye, xerabiyê û yên qenc jî qencî û xweşî-yê dikin rîberê xwe û li gora wan bîr û baweriyan kar û xebatê dikin. Malcolm vê ri-ya han ji xwe re riyek pîroz dibîne û dixwaze di vê rî de kar bike. Çaxê ku ji hepsê derdikeve bi van bîr û baweriyan rasterast diçe cem Elîjah Muhammed, li ber destê wî tobe dike û dibe şagirtê wî.

Li Amerîkaya Yekbûyî gelek rêexistinê reşikan hene; Elîjah Muhammed jî serokê

rêxistineke gelek qels e ku jê re 'Îslam Nation' tê gotin. Elîjah zilamekî navsere bû û bi eslê xwe Hîndo-çînî bû. Li gorî ku ew serpêhatiyên xwe ji Malcolm re dibêje, ew di sala 1931-ê de li Detroitê rastî zilamekî bi navê W.D. Fard tê. Fard dibêje ku ew Qureyşî ye, ji aliyê Xwedê ve hatiye şandin û navê wî jî Mehdî ye. Elîjah bi xwe jî xwe wek qasidê Mehdî û her wiha yê Xwedê dibîne û li gora vê kar û xebatê dike.

Elîjah zêde propaganda nedikir û pirr bi dizî dixebeitî, lewra jî rêxistina wî negihîştiye kamiliya xwe. Ji ber wê jî pêwistiya wî bi kesên wek Malcolm bêtirs û demagog hebû. Elîjah li gorî dîtin û baweriyên xwe ders dide Malcolm û wî ji bo pêşerojê digîjîne. Ji aliyê din ve jî li medreseyâ xwe ders dide şagirtan û di civînên wir de propagandayê dikir.

Wek her fikrê ku nuh dikeve nav civakê, ew jî di destpêkê de pirr qels in. Kes li dora wan nacive û pirraniya civakê kenê xwe bi wan dike. Lê demagojiya Malcolm û ïnada wî bi ser dikeve. Ew rewşa reşikên bindest û koleyan baş dizane; dizane ku ew ci jiyanê dijîn. Eroîn, esrar, alkol, bindestî û şerpezetî... Malcolm bi zimanê wan, weke ku bi çakûcan li serê wan dixe diaxife. Şerpezetî, bindestî û belengaziya wan bi zimanekî ku ew jê fambikin tîne bîra wan. Wan dawetî dînê îslamê û rêxistina di bin serokatiya Elîjah Muhammed ku 'qasidê' Xwedê bû dike. Zêde dom nake, gelek reşik ji bin 'patraxan' derdi Kevin û xwe li dora wî dicivînin. Dora wan roj bi roj fereh dibe û hevalên wan zêde dibin. Medya û rojnameyên welêt ji çar alî ve li ser Malcolm û rêxistina wî disekinin. Her gavê wî ji çar alî ve dikeve bin kontrolê û di demeke kin de li her derî tê nasîn.

Ji ber vê serkeftina wî, Elîjah wî dike berpirsiyarê damezrandina mizgeft û medreseyan. Malcolm li çar aliyê welêt digere; li meydanan, xwendegeh û unîversîteyan ji gel re diaxife, wan îqna dike. Li gelek cihênu ku reşik tê de pirr in mizgeft û medreseyen nuh ava dike û hevalên wî jî rêxistinê heremî dadmezrînin. Jê re jiyanâ şexsî namîne; ew bîstûçar seetên xwe dide kar û xebata xwe. Lew ew gîhiştiye wê baweriyê ku şagirtiya Elîjah Muhammed ne kar û wezifeyike hêsa ye û divê meriv ji bo fikir û baweriyên wî bê navbir bixebeite.

Dîtin û ramanên Elîjah Muhammed pirr tûj û ekstremlî bûn. Ew reşikan ji hemû qewmiyetan mezintir, qewtitir û kevntir dibîne. Li gora Elîjah "Çi wehî û pêxember hatibûn; ji bo reşikan hatibûn xwarê, kânât ji bo reşikan hatibû avakirin û kesen din bê xwedî şexsiyet bûn. Pêwîst bû reşikan li hember 'şeytanên spî' yan şoreş bikirna û dewleta reşikên misilman ava bikirna." 'Şeytanên spî' bela serê cîhanê bûn û cihê wan mezel û cehneme bû!" Gelek eşkere û berbiçav e ku kesen mirovperwer û demokrat ji azadî, aştî û wekheviyê ne aciz in; angò ew daxwazên wan bi xwe ne jî. Bindestî, perçebûn û birçtî yekemîn dijiminê mirovantî û demokrasiyê ye. Her wiha xwe ji koletî û bindestiyê rizgarkirin ji dîtineke pîroz û muqaddes e. Lê nîjadperestiya bi vî awayî û dijmanitiya gelên din, bi kêrî tu gel û neteweyan nayê. Ew tenê zerar dide dora xwe. Netewekarî û welatparêzî dîtineke pîroz e û tê de cihê dijmintiya gelan tune ye. Nîjadperestî wek dîtin xwe dixe quncikên tarî û nakokiyên mezin dixe nav gel û neteweyan. Ew her wiha zerarê dide gelê xwe.

Malcolm bi xwe jî heta ku ji rêxistinê tê

avêtin vê îdeolojiya ekstrem û nîjadperestîyê diparêze û di nav gel de bele dike. Anagorî Malcolm reşikên Amerîkayê tevî jiyan, xwarin, vexwarin û ruhiyeta xwe hatibûn serşûstin û asîmîlekîrin. Diviya ku ew 22 milyon reşikên bindest û serşûstû pêşî mejûyên xwe jî baweriya ‘şeytanên spî’ rizgar bikirna û bi mejûyê reşikîtî û tenê jî bo reşikan kar bikirna. Dîtinên Malcolm ji awa-yêñ usûl ve jî ji dîtinin serokên reşikan ên din cuda bûn. Ew û gelek serokên reşikan, di serî de jî Martîn Luther King diketin nî-qâşen mezin. Malcolm dîtinên Martîn bi passîvtiyê rexne dikir û serhildana bi şer û şoreşê diparast. Wî di vî awayî de wiha digot: “Ger meriv aliye rûyê xwe yê din jî pêşkêşî serdestan bike, dibe ku meriv serê xwe jî wenda bike!” Wî li hember gotinên Martîn Luther ên menşûr ku li hember bi sedhezaran merivan digot “xewneke min heye!” wiha digot: “Ez kabûsê (xewna tarî) temsîl dikim.

Malcolm bi dîtinên ekstrem û tûj û her wiha bi demagojî û zanebûna xwe zêde hat naskirin û axaftin. Helbet zêde hatin nasîn û zêde bi qedîrbûn dê gelek kesan jî aciz bikirna. Meseleya “giyayê hewşê tahl e” tê serê Malcolm jî. Ew ne tenê jî aliye serdestan, her wiha jî aliye beşek reşik û hetta ji teref hevalên xwe jî tê çavreşkirin. Gelek hevalên wî û bi taybetî jî du zarûyên Elîjah bi xwe jî ji pêşdeçûn û biserketina wî aciz dibûn û li cem bavê xwe bi çavreşî davêtin Malcolm. “Malcolm tenê jî bo navê xwe xebatê dikir û çavê xwe berdabû cihê Elîjah Muhammed.” Elîjah di destpêkê de ji van gotinan bawer nake; ji ber ku Malcolm di her axaftina xwe de wî weke serokê xwe pêşkêş dikir, bi navê wî rûdinişt û bi navê wî radibû. Hebûn û tunebûna wî bi Elîjah

bû. Lê tevî vê jî şik dikevin dilê wî. Gotin û propogandayêñ di dijî Malcolm cîhêñ xwe digrin.

Tê gotin ku “xweyê mirî kor e”; îcar Malcolm jî ji van dek û dolaban bêxeber, ji jin û zarokên xwe dûr li çar aliyê welêt digeriya û xebatê dikir. Çaxê birayekî Malcolm li rêxistinê û bi taybetî li Elîjah Muhammed dikeve şikê ku hinek nebaşî çêdi-bin û ev eşkere dibe; ew jî rêxistinê davêjin. Di ser de malbata wî û Malcolm bi xwe jî pêwendiyêñ xwe jî birayê xwe qut dikin. Ew bi serê xwe tenê dimîne û li ser propagandayêñ li dijî wî yên ne di cîh de xwe wenda dike û piştre jî dîn û eware dibe. Her wiha kurekî Elîjah bi xwe jî li bav û birayêñ xwe yên mayîn rexne dike, lê ew jî jî rêxistinê tê îxraçkirin.

Malcolm bi xwe jî bi van tiştan dihise. Pê dihise ku zarûyên Elîjah û derdora wî rêxistinê li gor hesabê xwe bikartînin û roj bi roj dewlemend dîbin. Her wiha pê dihise ku Elîjah Muhammed; serokê İslâm Nation û ‘qasidé’ Xwedê, roniya çavêñ wî bi hinek keçikên sekreter re maye û jê çar zarokên bê nîkah hatine dinê. Dinya Malcolm hildiweşê û serobino dibe. Rojên wî dîbin şev û şevêñ wî jî dîbin tarî. Lê ew di destpêkê de van gotinan wek leystikên dijimin qebûl dike. Pişti ku bi her du jinikan re diaxife û zarokên wan dibîne rewşa wî hîn xerabitir dibe. Di ser de ji malbata Elîjah tu alîkarî jî nagirin. Lê heta ew rastiyê jî Elîjah bi xwe jî nabîhîze, xwe wenda nake. Lê dema ku bi Elîjah re diaxife rewş diguhire. Li gorî Elîjah Muhammed pêwendiyêñ bi van jinikan re tiştekî pîroz e û ji aliye Xwedê ve hatiye biryardan. Pêwist e ku nesla wî li her derî bela bibe. Ji xwe pirriya pêxemberan gelek jinan jî xwe re anî-

bûn û 700 jinên Hz. Suleyman hebûn!

Malcolm demekê xwe ji her tiştî dûr dike û hê bi çavekî rexnegirî li xwe û hevalên xwe dinêre. Ew serokê ku herkesi bi serê wî sond dixwar û hewqas xwedî rûmet bû, keticibû ci halî! Çawa heta niha li ser vê meseleyê lékolîn nekiribû? Malcolm hê rastiya ku birayê wî û kurê Elîjah gotibû qebûl kir. Tevî vê ji demekê qet tiştek nekir û li malê tevî jin û zarokên xwe ma. Lê rêxistin û zarûyên Elîjah ji niha ve bîra wî dikolan û di derheqa wî de gotinêne xwes digerandin.

Çaxê ku Kennedy tê kuştin, rêxistin biryar dide ku tu kes û bi taybetî ji Malcolm di derheqa kuştina wî de tu gotinan nebê-jin. Malcolm ji ji safitiya xwe û ji dek û dolaban bê xeber, li ser pirsa rojnamevanan bersîveke ku ne li hesabê Elîjah tê dide. Elîjah Muhammed piştî gotara wî bangî Malcolm dike, ew 90 rojan ji rêxistinê dûr dixe û mafêna axafatinê jê digre. Piştî destê wî ji her tiştî dikşinîn û ji rêxistinê bi temamî davêjin. Malcolm hê pê dihise ku ci dek û dolab li serê wî hatine gerandin, lê idî tiştekî ku bihatina kirin nemabû; veger ji bê fede bû.

Malcolm bi moralekî ne xwes û sergêj xwe ji civatê dûr dike û piştî ji tevî kurê Elîjah bi xwe li New York City camiyeke nuh bi navê "Muslim Mosquo, Inc." ava dike. Piştî damezrandina medreseya xwe hêdî hêdî ji serî ve dest bi kar dikin. Islam Nation û alîgirên wê, Malcolm û hevalên wî rihet bernadin; mala wî dişewitînin û malbata wî bi nivîs û telefon dixin bin tacîzê. Tevî vê ji ew dev ji karê xwe bernade û di dema hecîtiyê de diçe hecê.

Malcolm li vir gelek kesen ji cuda rengan dinase û bi wan re pêwendiyêن wî xurttir dibin. Ew cihê ku diçê wek serokê dewlete-

kê tê qebûlkirin û li gelek welatên Afrîkayê wek mîvanekî gelek giranbiha tê xweyîki-rin. Ew li wirê fêri limêj û taetan dibe û bi gotina xwe dibe 'misilmanê jidil'.

Li Afrîkayê, di nav gelên ji her welat û ji her rengî de fîkrêñ wî yên di derheqa nete-weyan de ji diguhire. Idî li gorî wî "nîjadperestî nekarê mirovantiyê bu" û "di nav rengspiyan de ji kesen baş û fidakar hebûn." Her wiha ji bo ku civak bê guhartin û pêşkeve, "diviya ku meriv dîrokê baş nas bikirna û rewşa îroyîn baş biarîna ber çavan." Guhartina civakê bi têgîlhîstîn û zanebûnê, ji hev famkirin û bi berxwedaneke qewî dikaribû biguhriya."

Carina hinek tiştîn piçûk an ji ne zêde balkêş jiyan û fîkrêñ meriv diguhêrin. Zarakî û xortaniya wî di bin tade, perîşanî û rezîltiyê de derbas bûbû. li kuçe û zaboqan bûbû araqvexwir û narkoman. Dizî, hîle-bazî û tolazî bûbû karê wî yê rojane. Her gav û seet xetera kuştina wî hebû yan ji dibû ku ew yekî bikuje. Heta ku neket hepsê, hisê wî nehat serê wî. Di wir de fêri xwendin û zanebûnê dibe, di wir de xwe digîjîne û li wir bêhna azadyê dike dilê wî. Piştî ku dibe endamê Islam Nation û mirîdê Elîjah Muhammed ji çavgirtî dîtinêñ wî qebûl dike û dibe nîjadperestekî dijwar. Di nav 12 salan de li pirraniya bajarêñ bakurê Amerîkayê medreseyêñ vê rêxistinê ava dike. Li dijî serokên reşikan ên wek Martîn Luther King û yên din nîqaşek zor derdixe û wan gelek rexne dike. Ji Elîjah re çavgirtî kar dike û xwe bê qeyd û şert perçeyek ji wî dibîne. Ji bo wî neyartiya birayê xwe û gelek hevalên xwe yên eziż dike.

Dîsa bi hisê xwe ve nayê. Dibîze ku serokê wî neheqî û firqûmîlûtiyê dike, guh nadê. Sadike ku serokê wî yê 'ruhanî' bi çend

sekreterên bîst salî re rabûrûniştiye, bawer nake. Di nav xwe de di cinciqe û xwe nerihet hîs dike, lê naxwaze rastiyê fér bibe. Ji rêxistinê tê avêtin jî hê naxwaze ji bûyeran bawer bike. Ta ku qestî kuştina wî dikin û li her deverî di derheqa wî de bi nexweşî diaxîfîn û piştre jî wî ji rêxistinê dûr dikin, hê rewş bi çavekî rexnegirî tê ber çavên wî. Xwuya ye ku ger neçûya Afrîkayê, dîtinê wî di pirsa nîjadperestiyê de jî nedigûhirin an jî dê ew gelek wext bigirta.

Îcar vegera wî ya ji Mekke û Afrîkayê di be heytaholeke mezin. Rojnamevan û spîkerên medyayê dora wî digrin û wî di bin pirsan de dihêlin. "Çima fîkrê xwe di derheqa reng û gelan de guhartibû?", "Çima ji rêxistinê hatibû avêtin?", "Çima pêwîstiya rêxistinek nuh dîtibû?", "DÊ reşik û spî çewa karibûna bi hev re bijiyana?" pîrsên se-reke bûn. Malcolm bi zimanekî xwes û helîm bersîva wan dide lê disa jî dizane ku ew dê spekulasyonên xwe bikin. Malcolm idî di îdeolojiya xwe de bi her awayî nerm bûye; di warê dijminatiya rengspiyan de, di warê serokên reşikan û rêxistinê wan de û di warê şeklê tekoşînê de...

Malcolm bi van fîkrênuh kar û xebata xwe didomîne. Lî neheqî û bêbextî xwe ji dora wî nade alî; xérnexwaz û zikreş gav bi gav li pey wî digerin. Ew û malbata xwe di bin xetereke mezin de dijîn. Ew rêxistina ku Malcolm jê re 12 salan kar kiribû û hazir bû ku canê xwe di ber de fîda bike, bi

forten kuştinê ew ditirsandin. Malcolm ji kuştinê neditirsîya, lewra wî zanibû ku dê bi kuştin. Lî bi destên hevwelatiyên xwe hatin kuştin... Ha ya herî xerab ew bû.

Rojeke serma a sibatê di sala 1965-an de li Harlemê li salona Audubon Ballroom ci-vînek çêdibe. Dê ev civîn ji teref rêxistina wî ve bê amadekirin û wê Malcolm di vê civînê de biaxife. Ji destpêka civîne ve, berî ku Malcolm dest bi axaftinê bike bêhizûriyek di hundirê wî de dest pê dike. Tu dibê ew dizane dema wî hatiye. Kurê Elîjah yê ku hevalê wî ye bi vê bêhizûriya wî dihise û dixwaze axaftina wî taxîr bike. Lî Malcolm bi ya wî nake. Piştî ku kurê Elîjah pêşaxaf-tina xwe diqedîne û Malcolm dawetî ser kursiyê mîkrifonê dike, çend reşikên ku li pêş rûniştine û berî çend deqîqeyan bi za-rokên wî re dileyîzin berî ku ew dest bi axaftina xwe bike Malcolm gulebaran dinin.

Malcolm X, serokekî civaka reşikan, aza-dîxwaz û welatparêz li gorî gotinan ji teref çend qatilên ku ji serokê wî yê kevn Elîjah Muhammed re kar dikirin tê kuştin. Laşê wî di nav xwînê de dimîne. Doktor û he-kîm nikarin wî xilas bikin.

Ji nav civata reşikan serokekî bi rûmet û xwedî qedir, bi fîşekên dost û nasan tê kuştin. Guleke rengîn ji nav vê civaka bindest û perişan tê qurmiçandin û stêreke bi şewq û ronahî li esmanan dixurice û wenda di-be.⁴

SELİM BEREKAT

Mervanê Keleş

Ji bo Reş û belek

Himhim
Şûrê bê
Di dimdim de
Xewnan
diçîne
Bi baskên Silêmanê dunikil
Deşta Qamîşlokê
temîz û dûz
dike
dilorîne
û
ranazê
li ber finda
AVESTA
wâ
hechecîkên
tipan
berzûr dibin!
“Silo” were:
Livîna sêwiyan
sar e
bi hilma
çemê
Hilîlîkê

xewnêñ xwe
dirêse!...

Xuşxuşa dehlê
sînoran
dişo
û

Bîstanêñ tiwan çivîkan
diweşînin
“Silo”

“Reş” û “Belek”
ez û tu ne
“Silo”

hestiyêñ tiltivîkan
di qewlikê kilê diya
min de

dibişkivîn
lê devê kêlîkê
gi
rê
na
din!

Gola Qamîşlo
zuha dibe
û keroşkên
bêserî
dizê!

û dojeh
• bi toza agir
goşiyêñ
Xwedê
digvêşe kezebê!

bi mîranî
serhişkiya
Kurd
diparêze
û

“Búka Mîra”
bi tiliyêن TE
dihejmêre

Erê “Silo”

paşê
cewşenbaziya ba

û
avê
di
Pêşêra
hevdîtina
“REŞ” û BELEK”
de
pêk tê!...

Reş û Belek: di romana Selîm Berekat “Leşkerên Sermedê” de du dîk in. Wan di romanê de rola qehremaniyê standine.

MÊRXASIYA


BI TIRSÊ VE RAPÊÇAYÎ

Hîsên wî yên nostaljîk ji nişka ve bilind bûn. Di trêna binê erdê de, xweziya xwe bi demên berê anî. Mîna ku bibêje "Ka hevaltiya berê?" bi gazi-nî li çavêن Azad nihêrî. Navê "Mehemed Eli", piştî dake-tina binya xetê, bûbû Azad. Vî navî ew bi du awayan şâ kiribû; hem ji navê "Mehemed Eli" xelas bûbû û hem ji navekî bi Kurdî bi dest xistibû. Gava hinekan ji qestî bangî wî dikirin û digotin; "Mehemmed Eli!"

Pîr hêrs dibû. Ji hêrsa hingî ewqas sor dibû, nema dizanîbû bê wê çi bigota. Lê wî dizanîbû ku ew çiqas hêrs bûbuya, wê hevalên wî ewqas bêtir lê sor bûbûna. Ji ber vê, ji mecbûrî dev ji hêrsbûnê berdida û li ber hevalên xwe digeriya û digot:

- Lawo, ji bo xwedê li min weha nekin û ji bo ez ji vî Mehemed Eliyê ku bavê min kiriye bela serê min, xelas bibim, alîkariya min bikin.

Di malekê de gelek heval; ew û Azad ji di nav de, bi qa-sî şes salan, bi hevdû re jiyabûn. Tev gelek zehmetî û problemên wê demê, bi hevdû re gelek wextên xweş ji bi-hurandibûn. Di wê pêvajoyê de, hewa wê hêlîna sirgûnan ji tenefus kiribûn. Xweziya xwe disan bi wan rojan anî. Xuya bû ku bêriya wan pêywendiyêñ germ û ji dil, wê hissa hevaltiyê û wê dostaniya xurt kiribû. Gelek bîranînê wan yên muşterek hebûn. Ma bi hevdû re çi kiribûn, çi nekiribûn... Ma bi hevdû re, hindik caran nêzîkî mirinê bûbûn? Tew di sînor re derbasbûn... Ew ji nema dizanin, bê ji ber pêwîstiya xebatê, wan çend caran xwêdana sar



Mustafa Aydogan

dabûn; bê çend tayên porêن wan ji ber tirsa axa mayinkirî sipî bûbûn.

Wek îro dihat bîra wî. Wexta dihat bîra wî, hingî weha kûr lê difikirî, mirov di-got qey, wê tirsa ku ew wek pelê çilo dilerizand, wê heyecana ku xwîn di damaran de bi lezbûna herî bilind digerand û wê mîrxasiya ku bi hêviyê ve hişk girêdayî, la-şê wî ji nû ve didan ber xwe. Sînor... Di sînga axê de xencereke zingarî, qada mirinê... Carinan ji bo ferdekî çayê û carinan ji ji bo xatirê çend kullekan, lingên gellek lawêن bavan bi dengekî ku tarîtiya şevê qelaştibû, firiyabûn. Lê di pêywendiyêن wan û sînorî de, mîna kaçaxçıyan ne çay û pelên çixara li bakur dihatin firotin û ne jî pez derbasî binya xetê dibû.

Wê şevê wê tava heyvê tuneba. Ji xwe, mirov nikarîbû her dema ku bixwesta li sînor bixista. Ji bo derbasbûnê diviyabû ya heyy zû biçuya ava, ya derengê şevê hilata ya jî li ber destê sibehê derketa. Ger heyy zû biçuya ava, mirov diviyabû piştî wê, di sînor re derbas bubûya. Ger heyy derengê şevê, an jî li ber destê sibehê derketa, mirov diviyabû beriya ku heyy hilata li sînor bixista. Wê gavê gellek kes ji xefika ta-va heyvê dûr û di tarîtiya şevê de derbasî aliyê din û sînor dibûn. Wê carê jî beriya ku heyvê rohniya xwe bida hedefen li axa mayinkirî, diviyabû reşahî bihata bikaranîn. Wê şevê jî beriya ku xezeba mirinê berê xwe bida wan, diviyabû kozikên veda-yî û funyeyêن li hemana bûn, li dû xwe bihiştana.

Meha Sibatê bû. Wê çar heval bi alîkariya rîberekî di sînor re derbas bibana. Di-vê hertiş pirr bi dizî bihata girtin. Ji ber vê, şeva beriya wê, bi alîkarî û çavnêriya du hevalan, xwestibû bê mala bavê xwe. Mala ku cara dawî, sal û nivek berê dîtibû. Ji bo wê li bende qutbûna cereyanê rawestiyabû. Cereyana bajêr rojê çend saetan, an jî heta serê sibehê qut dibû. Wê gavê, lampên kolanan yên ku ji ber voltaja kêm bi rohniyeke qels û lerzokî ve di ber xwe de didan jî vedimirîn û tarîtiyê xwe bi temamî bera ser bajêr dida. Di saetên weha de, ji bo çûyin û hatina wî, firseteke pirr baş peyde dibû. Wî wê rojê jî xwe dabû bende vemirandina lampeyan û gava rohniya ku ji xwe li hemana bû, kolan bi temamî bi destê tarîtiyê ve berdabû, sê kes ji xani-yekî derketibûn û xwe sipartibûn kolanêن tarî. Li ser cadeyê, tirumbêleke leşkeran bi dengê xwe yê nas, heybet û tirs li taxê belav dikir. Di bajarê bêdeng de, taxeke bêdeng. Taxeke kerr û lal... Ne xircira du cîranan, ne xelkên diciûn mîvantiyê, ne dengê leyizтика zarokan û ne jî tu evîndarêن di quncikeke kolana xur û xalî de, fir-seta hevdûdîtinê bi kar dianîn... Bi tedbîr lezandibûn. Karê cereyanê diyar nedibû; dikarîbû heta sibehê jî nehata û ji nişka ve jî bihata. Ji ber vê yekê, tu kesî nizanîbû, bê wê kengî ci biqewimiya. Diviyabû rohniyê ew di kolanan de zevt nekira. Li ke-sekî nas rasthatin, talûkeya girtinê zêdetir dikir.

Piştî ku dengê zîla deriyê mala ku bi heyecan û tirs li bende hêviyekê bû, hatibû bihîstîn, kilîta derî du caran ber bi aliyê çepê ve hatibû zîvirandin û ew dilê bi hes-

retê ve mişt bû, ketibû hundur. Di serê wî re hezar pirs derbas bûbûn. Gelo di malê de ci guhertin çebûbû? Gelo liberketinê çiqas tesîr li dê û bavê wî kiribû? Nuha zarok jî mezin bûbûn... Cîran, kolan, hewş, hertiş... Belê bi hesreta hertişti ve dikeliya. Bavê wî por, rîh û simbêl bi temamî sipî kiribûn. Berê jî di nava porêne wî de, çend tayêne sipî xuya dibûn, lê piştî sal û nivekê, çav bi hesreta tayêne reş bûn. Bejna wî ya dirêj nema dihat ferqkirin. Ancax bi alîkariya gopêl li ser lingan disekinî. Pişta wî bêhawê xûz bûbû. Wî zilamê ku sal û nîvek berê wek çiyayekî bû, li ber çavêne wî çiqas hûr bûbû. Gava rewşa wî dît, weha fikiñ;

- Heyhat! Ka ew zilamê ku di her nerîneke wî de jiyan difûriya? Mirov di wexte ke weha kin de çawa dikare ewqas bikeve?

Liberketinê ew ji halekî xistibû halekî din. Bavê wî ewqas hatibû guhertin, ger ew li deverike din lê rastbihata, belkî wî nas nekira jî. Diya wî kitana xwe dabû ber devê xwe û digot qey xewn bû, bihezkirin û hesreteke kûr, ziq lê dînihêrî. Bi tenê lê dînihêrî, qet tu tiş nedigot. Tew dikira xwarina ku çekiribû jî ji bîr bikira. Bi zorê û bi berger, çend parî xistibûn devê wî û dû re hinek qeliya ku jê re hilanîbû, xistibû kîsekî naylon û dabû wî. Wî kiribû û nekiribû, nikarîbû diya xwe îqna bikira û di dawiyê de jî bi ya wê kiribû. Diya wî ji nişka ve gotibû:

- Wî rebenê, min dikira pêlava te ji bîr bikira.

Û xar biribû qutiya ku pêlav tê de bû.

Bavê wî û diya wî, ji bo ku ew zêde neqehere, giriyêne xwe di qirika xwe de hiştibûn. Herdu mîna bombeyên ku pîmîen wan hatibûn kişandin, bê çawa gava dest lê bihata sistkirin, wê bigotana "gurm" û biteqiyân, weha tije bûbûn. Herkesî baş dizanîbû ku gava lêwik paşê xwe bida wan, wê hêşir wek baranê bibarandana. Wî hem ji bo tedbîrê û hem ji bo ku rewşa wan fahm kiribû, ziyareta xwe dirêj nekiribû. Xatir ji dê bavê xwe û xwişk û birayêne ku bi situxwarî û bi çavêne xemgîn, lê nihêribûn, xwestibû û dîsa bi alîkariya herdu hevalên xwe ve, di tarîtiya şevê de wenda bûbû. Gava derketibû, bi tenê dengê diya xwe bihîstibû:

- Bila çavêne mahkûmiyê birije û çavêne xeribîyê jî pê re, lawo... Lawo, xerîbo lawo....

Bi ku de diçû, wê li ku raketa? Dê û bavê qet pê nizanîbûn û ne wî, ne jî hevalên wî, di vî warî de ji wan re, tu carî tu tiş nedigotin. Ji xwe dê û bavê wî jî piştî ku çend caran pirsibûn û pirsên wan yên di vî warî de, bê bersiv mabûn, rewş fahm kiribûn û êdî qet nema pirsibûn. Wî û hevalên xwe, ewleyî di ser hertişti re digirtin. Ji ber ku ev prensîp bi kêrî paraztina lawê wan jî dihat, dê û bavê wî, nedixwestin ji dervayî vê prensîpê hereket bikin. Ji bo paraztina wî, tev zarokêne biçûk, hemû malbat bi awayekî politize bûbûn. Mahkûmiyê ew fêrî gelek tiştan kiribûn.

Serê sibehê hevalê wan ê ku wê wan teslimî rêberê wan bikira bi erebeya şiferekî

pêbawer, li ber deriyê mala ku ew lê dima, sekinîbû. Şifêr ji erebê daneketibû, bi tenê hevalê wî peya bûbû û sê caran li ser hevdû û carekê ji bi tenê, yanî çar caran li derî xistibû. Ev nîşana wan bû. Wî diviyabû li hember hemû lêdanên ji dervayî vî awayî, ji aliyê hundur ve, tedbîra xwe bistenda. Wî di wan hersê rojên dawiyê de, xwe li mala keça xalê xwe vedîşart. Hem wê û hem ji rebenê mîrê wê pîr dixwestin, lê bi xwedî derkevin, lê ji destê mîrata tîrsê de ne di tu halî de bûn. Malxwîyê malê çend caran bi qêrîn ji xew şiyar bûbû û dû re ji jina xwe re behsa xewna xwe ya xerab kiribû. Ew di wan xewnan de, gelek caran hatibû girtin û bi lêdana polisan ji xew çeng bûbû. Keça xalê wî di nava henekan re, behsa xewnên mîrê xwe kiribû. Wî rewşa wan dizanîbû û ji ber vê yekê, dilê wî ji wan nedima. Piştî ku hevalê wî bi awakî rast û li gor parola wan li derî xistibû, xwediyê malê, keça xalê wî, xar biribû derî û hevalê wî derbasî hundur kiribû. Ji xwe, ew hazır bû; ji ber heyecana rê, di taştê de qîma xwe bi qedeheke şîr bi tenê anîbû. Qatek kincê lacîwerd û krawateke reş î pitik pitikî li ser qutikekî sipî, li xwe kiribû. Pêlava diyariya diya xwe ji hîn nuh dixist pê. Hew diviyabû ji xwediyê malê, ji wan kesen ku xwe bi gelek awayan diavêtin nava talûkeyê, xatir bixwesta. Li gel alavên wî yên şexsî û nemaze teyrê baz, ji bo gelek dostêن xwe yên binya xetê ji diyarî kiribûn. Vê ji barê wî pîr giran kiribû. Piştî xatir xwestinê, berê keça xalê wî derketibû derive, alavên wî xistibûn bagaja erebeyê û li dora xwe nihêribû, gava tu talûke nedîtibû, hatibû hindurê hewşê û ji wan re gotibû "Rêya we vekirîbe". Gava ku herdu heval derketibûn, ew li pê wan derneketibû. Deriyê hewşê girtibû û hatibû hundurê xênî. Lê xanî pîr vala xuya dikir. Di hundurê xênî de, çû û hat. Rûniştin lê tunebû. Dilê wê dikir tepûrep. Ji nişka ve berê xwe da deriyê hewşê û cara talî li wan nihêri.

Herduya bi lez xwe avêtibûn erebeyê û berê xwe dabûn taxa bakur ya bajêr. Li wir ji du hevalên ku diviyabû hevaltiya wan bikira hebûn. Rêyek di navbera qereqola polisan û ya cendirmeyan re derbas dibû. Rêya herî nêzîk ev bû, lê ew rê çi qas nêzîk ba ji kesen wek wan tu carî newêribûn di wir re derbas bibana. Rêyek bi kîmanî du caran ji wê rîyê dirêjtir ku li dora bajêr pîr dizîvirî hebû. Ew rê dirêj bû, lê talûkeya wê, pîr kêm bû. Wan ew rê gelek caran bi kar anîbûn. Wê carê ji ew rê hilbijartibûn û berê xwe dabûn taxa ku hevalên wan lê bûn. Li wir teyrekî wan i baz ji hebû. Li gor agahdariya ku hatibû, teyrê baz li ba Ereban pîr pere dikir. Ji ber vê yekê, hevalan ji bo peydekirina imkanên aboriyê, temiya teyrekî baz ji li wan kiribûn. Teyrê wan ê ku du meh berê hatibû şandin, celebekî qertela derketibû û piştî mesrefeke mezin, ew li hember Ereban rûsar derxistibû. Ji ber vê yekê, ji bo îspatkirina bazbûn an nebazbûna vî teyrî, ew rê gellek kesan dabûn. Piştî ku herdu hevalên wan ji li erebeyê siwar bûbûn, ji bo ku Azad ji bi xwe re bibin, berê xwe dabûn bajarê Azad. Gava leşkeran dest danîbû ser iqtîdarê wek noka ku li ke-

vir keve, her yek ber bi deverekê ve pengizibû. Azad jî xwe ji mecbûrî, xwe dabû alî. Gotina "xwe dabû alî" aîdî Azad e. Piştî Duwanzdehê Îlonê, gava bi hevalên xwe re, xwe ji ber leşker û polîsan vedîşartin, henek dikir û digot; "Me xwe daye alî, lê yên ji dervayî me, reviyan." Azad xwe dabe alî, ya jî reviyabe, netîce nedihat guhertin; warekî terkkirî, jineke situxwar û keçeye pêncsalî li dû xwe hiştibû. Çar roj berê, ji bo dîtina pîreka xwe û keça xwe, ji ba wan dabû rê û bi şev, li deriyê malê xistibû. Jinik berê tırsiyabû û nexwestibû derî lê veke, lê piştî ku serê xwe di ser hewşê re dirêj kiribû, derî bi lez vekiribû. Bêî ku tu tiştî ji hevdû re bibêjin, çend deqîqeyan weha şaşmayî li hevdû nihêribûn û dû re kûrînî bi jinikê ketibû û xwe avêtibûn himbêza hevdû.

Wexta vegevê hatibû. Azad ji bo şûyinê li bende hevalên xwe bû. Erebe ketibû na-va bajér û berê xwe dabû taxa Azad. Lê çi tax, çi rê... De were, vêca vê erebeyê ji heriyê derxîne. Çare tunebû. Diviyabû ji dervayî şifêr, hemû daketana û erebe dahf bidana. Di dahfdanê de tekerê dawiyê badanaj kiribû û qatê kincê lacîwerd, di heriyê de hiştibû. Hevalên din pirr pê keniyabûn û gotibûn; "Mirov divê qey tê biçe dawetê." Lê piştî fahm kiribûn ku ew gelek aciz bûye, henekên xwe dirêj nekiribûn. Piştî deh deqîqeyan, erebe ji heriyê hatibû derxistin, lê problemeke wan i din xuya bûbû. Hevalê ku xwedêgiravî mala Azad nas dikir, gotibû;

- Rast e, ez mala wî nas dikim, lê ez tu carî bi erebeyê nehatime mala wî. Ji ber vê, divê ez peya bimeşim û hun jî bi erebeyê bidin pêy min.

Erebe li dû heval û heval jî kolan bi kolan, li mala Azad geriyabû. Gava wan ji Azad re rewşa xwe gotibûn, ji ken, hêşiran di çavê Azad re avêtibûn.

Herçar hevalên ku wê derbaşî aliyê din i sînor bûbûna, amade bûn. Hevalê wan ê ku karê sînorî organîze dikir, ji bo derbasbûnê, ji wan re rîberek pêye kiribû. Wan û rîberê xwe, dê li ba restoranteke li ber rê, hevdû bidîtana. Gava gîhaştin cîhê civanê, mîla saetê ya kin li ser şesan û ya dirêj jî li ser duwanzdehan bû. Şifêr û hevalê ku ew û rîber gîhandibûn hevdû, xatir ji wan xwestibûn û di cîh de vege riyanabûn. Rîber erebeyeke nas kirê kiribû. Ew û rîberê xwe, li wê erebeyê siwar bûbûn û berê xwe dabûn rojhilat. Piştî ajotina bi qasî sî-çil kilometreyan, ji erebeyê peya bûbûn û berê xwe dabûn gundekî. Gund li ser girekî hatibû avakirin. Beriya ku tarî xwe bera erdê bida, ji jêr pirr baş dihat xuyakirin. Li dorhêlê, gundên din jî hebûn, lê tu gund, bi qasî wî gundî baş xuya nedikir. Nemaze, odeya bilind ya li pêsiya gund ku der û dora pencereya wê ya sipî ku li beriyê dinîhêri, mîna golikê beş, ew gund ji hemû gundên din, vediqetand. Dinya êdî baş tarî bûbû. Rîberê wan ji bo sîlehanînê, ew li wir hiştibûn û çûbû gund. Rîberê wan gelek caran di sînor re derbas bûbû. Sînor ji xwe re kiribû kar, lê her cara ku nêzîkî li sînor dikir, dibû şexsekî din. Hertim hîseke poşmaniyê pê re peyde dibû. Pirr ditirsîya. Lê ya ecêb ev bû ku nika-

rîbû dev jê berda. Xuyabû ku ger îmkan hebuya ew dê tu carî nehata ber sînor. Ev dudiliya wî li ba gellek kesên ku hatibûn derbaskirin, bûbû sedemê bêbaweriyekê.

Bayekî sar ew ricifandibûn. Ew hem li gor talîmata rêber û hem jî ji tirsa, qet tev nedilivîyan. Saet bûbû dehê şevê, lê rêberê wan hîn ji gund nehatibû. Ew jî li wê çolê, li erdekî nenas, ketibûn nava taswasan. Şika ku belkî rêberê wan, li cîhê wan digere, lê ji ber tarîbûna şevê, wan nabîne, kiribûn. Ji ber vê yekê, ji bo işaretdayinê, dest bi livandinê kiribûn; heryekî ji wan, berê xwe bi texma gund vekiribû û bi dorê, li ser hevdû heyst çixare kişandibû. Zikê birçî, şeva reş, bayê sar, di cîhê xwe de rawestin û di ser de jî heyst çixareyên ji mecbûriyetê, serê herçar hevalan, lê ji hersêyên din bêtir jî ew gêj kiribû. Wî carekê pêlava xwe ji pê kiribû, lê ji ber werimandina lingên xwe, ançax bi alîkariya hevalen xwe, dîsa xistibû pê. Ew bi halê xwe biliyabû û nedixwest tu kes jî pê biesiya. Ji ber ku li ber sînor, gazinek, dikarîbû bihata ma'neya tirsê. Wê gavê nehata gotin jî kengî hevaltiya wan xera biba, wê bihata rojevê. Gellek numûneyên di vî warî de hebûn. Wî ev dizanîbû û tev hemû tiştî, diviyabû idare bikira. Beriya hatina rêber, yê ku carekê nemîztibû nemabû. Piştî şîlbûneke baş, rêberê wan xuya bûbû û ji bo pêşî li gazinan bigre, gotibû;

- Pirr dereng bû, ger hûn bi ya min bikin, em iro necin. Em dikarin li gund razen û sibê êvarî bênen ser sînor û derbas bibin.

Herçaran şêwra xwe kiribûn yek û bêî ku tu gazinan bikin, gotibûn;

- Em dixwazin işev biçin. Ger tu neyê jî em ê bi tena serê xwe, li sînor bixin û derbas bibin, lê divê tu bizanibe ku em ê vê kirina te bighîne deverên elaqadar.

Biryar hatibû dayin. Herçaran rahiştibûn barêñ xwe û dabûn dû rêber. Di rê re çûyin qedexe bû, mirov diviyabû bida nava erdan. Piştî baranê jî meşa li ser erdê cotkirî, gelek zehmet bû. Gava mirov gavê xwe diavêt, du-sê kîlo herî jî pê re bilind dibû. Carinan jî lingên wan di heriyê de çikiyayî diman û ji bo ji erdê rakirinê, bi destêñ xwe ve alîkariya lingên xwe kiribûn. Serma, xwêdan, betilbûn, birçîbûn û tesîra çixareyên ji bo işaretdayinê, ew ji halekî xistibû halekî din. Ew ne bes bûn, bi ser de jî barekî giran li pişte bû. Nêzîkî li sînor kiribûn. Hasasiyeta wan, di di derecaya xwe ya herî bilind de bû. Her ji sed metreyî kozikek hebû. Divê mirov ji dervayî kozikan teqwîyeyên ku bi şev dihat danîn jî bihesibanda. Rêber ew li devekerê rawestandibû û ji wan re gotibû;

- Hûn li vir rûnin, ez ê cîhê kozikên leşkeran tesbît bikim.

Divê mirov bi kêmanî cîhê du kozikan baş diyar bikira û dû re di orta herdu kozikan re li sînor bixista. Ew jî dihat wê ma'neye ku mesafeyek bi qasî pêncî metreyî diket navbera mirov û leşkeran. Mesafeyek bi qasî pêncî metreyan û devê tivinga sar... Şaşiyek bi tenê, îmkanê ku mirov dîsa bikaribe şaşiyê bike, ji ortê radikir. Mîrinê henek nas nedikir û li hêşirên çavêñ tu diyan jî nedinihêri. Mîlén saetê li ser

dudu û nîva bûn. Panzerekê bi projektorê ve, dora xwe rohnî dikir. Panzer di rê re dimeşıya û bi projektorê, li hedefê digeriya. Hêdî hêdî nêzîkî li wan ji kiribû. Rohniya çend projektoran di ser wan re ji derbas bûbû. Wê gavê tirsa wan gîhaştibû bandevê. Yek ji wan cara yekem di sînoran re derbas dibû. Gava siya rohniya projektorê di ser wî re derbas bûbû, ketibû heyecanê, xwe avêtibû erdê û gotibû:

- Haho! Em dîtin.

Lawik hingî pirr lerizibû, lerizandina wî tev tarîtiya şevê ji hatibû dîtin. Bi yekcarî ketibû tev. Tu ferqa wî û sîpiya firkandî nemabû. Rêber û Azad rewşa wî dizanîbûn, ji ber vê, ji nişka ve xar biribûnê û gotibûn;

- Hişş kuro, ma qey tu dixwazî ku ew bi me bihesin? Netirse, ew me nabînin. Bi tenê siya rohniyê di ser me re derbas bû.

Meraq û tirs ketibû nava hevdû. Şiyana konsantrasyonê hemû hêza xwe seferber kiribû. Pêvajoya bîhnstendin û bîhndayinê pirr bi lez dimeşıya. Bîhn, hingî ewqas bi lez dihat dayin û stendin, nêzîkî xeta bîhnçikînê bûbû. Kuxikeke zuha ew hemû dida ber xwe. Kuxika zuha, dixwest xwe mîna sinyala dereceya heyecan, tirs û taswasê, bide der. Lê kuxik û her awayê dengkirinê, qedexe bû. Destên xwe dabûn ser devêن xwe û di xwe de kuxiyabûn. Wan gotibû qey, di dinyayê de yên cara yekem di xwe de kuxiyabûn, ew bûn. Ancax pişti çûna panzerê, hilma wan hebekî hatibû ber wan. Lê ew bi xwe, ji ber halê ku ketibûyê, nikarîbû li panzerê ji bifikiriya.

Gelo tu teqwîyeyê din tunebûn? Wê vê carê şerr derketa? Ger şerr derketa wê ci bihata serê wan? Gelo di şerr de wê çend çîra bihata tefandin. Ew bi xwe an yekî din... Di herdu halan de ji fikirandin pê pirr dijwar hatibû. Laşê wî bi temamî ricifibû. Rewşa Ahmedê hevalê xwe yê ku du meh berê ji sînor bi zorê gîhandibûn nexweşxaneyê, bi bîr anîbû. Halê ku Ahmed ketibûyê û ew problemên fizîkî yên ji ber vê birîndariyê peyde bûbûn, wê tesîra xwe li hemû pêşeroja wî bikira. Bi vê re tirs û taswasa wî bêtir bûbû.

Baranekê ji hûrik hûrik dest pê kiribû. Ji xwe ev kêm bû. Hemû bêdeng rûniştibûn û li bende rêberê xwe bûn. Bi baranê re kêfa rêber hatibû. Şopa wan bi vî awayî wenda dibû. Gava rêberê wan vegeriyabû, cîhê herdu leşkeran ji hatibû tesbitkirin. Rêber hêdîka rûniştibû, berê xwe bi bakur ve vekiribû û mîza xwe kiribû. Dû re rêber berê tivinga xwe dabû kozika aliye rastê û Azad ji li ser kozika çepê rûniştibû. Gava leşker tev biliviyan, wê rêber û Azad bi tivingên xwe ve, li ser wan girêbida. Kêfa wan hatibû û li gor talîmatên rêber, dest bi meşê kiribûn. Halê wî her diçû, xerabtir dibû. Çavên wî hêdî hêdî dihatin girtin, lê wî dîsa ji di ber xwe de dabû. Gava di orta herdu leşkeran re derbas bûbûn, tirs û heyecan gîhaştibû dereceya xwe ya herî bilind. Herçar heval, li dû rêberekî, daketibûn qada mirinê. Mirinê hergav dikarîbû destên xwe yên qirêj daniya ser devêن wan. Nefesa mirinê, ji pirr nêzîk ve

hatibû hîs kirin. Xeta mirin û jiyanê ji hevdû vediqetand, pirr zirav bûbû. Tirs û heyecan, bi mîrxasiyeke mirovî re derketibû dereceya herî bilind. Tirs... Hîsa ku bi payina talûkeyekê re, bi mirov re peyde dibe... Ev ci hîs bû ku tesîra xwe li ser hemû tevgerên mirov dikir? Ev ci quwet bû ku laş diricifand, çav ji ber wê, li sitarekê digeriya? Wec zer dibû. Dev zuha dibû. Ma gelo di tu rewşen din de, lêdana dil ewqas bileztir dibû? Ma bîhn di tu halên din de, ewqas bi lez tê stendin û berdan? Heta wê gavê ji di pirtûkan de, ji bo kesên di rewşa wan de bûn, weha xwendibû; "yên ku tirs qet nas nedikirin". Ev ci qas rast bû? Gelo wan bi rastî, tirs nas nedikirin? Li wira rastî hatibû jiyîn. Çepera tirsê pêwîstî ji tu bersivan re nehiştibû. Hebekî fikirîbû, "teslîmî tirsê nebûn", hîn bêtir nêzîkî rastiye xuya bûbû. Gelo di rewşa ku tirsê laş dabe ber xwe de, cih ji mîrxasiyê re dima? Ma di erdê mayinkirî re derbasbûn û rîska mirinê stendin, ne mîrxasî bû? Ma mîrxasî hîn dê çawa ba? Mîrxasî; bêtirs çûyina ser talûkeyê. Ma ya wan bêtirs bû? Ya wan ne mîrxasiyeke ku ji derveyî rastiya mirovî bû. Hîseke ku bi her awayî mirovî... Hîseke ne xur û xalî, hîseke mîrxasiyê ya ku ji aliyê tirsê ve rapêçayî. Nefesa mirinê û tirsâ ji ber wê; hêviyên bi jiyanê ve girêdayî û mîrxasiya ji bo pêkanîna van hêviyan laşek dabûn ber xwe. Tirs û mîrxasî... Ger herdu bi hevdû re dikarîbûbihata jiyîn, gelo di rewşen weha de kîjan li pêş bû? Kîjan serdest bû? Belki herdu ewqas tevlihevdû bûbûn ku ji hevdûveqetandina wan, pirr zehmet bû.

Wan herdu kozik bi selametî li paş xwe hiştibûn û dû re, di ser rîyekê re derbas bûbûn. Wê gavê, rîberê wan ê ku wek pelê çilo lerizibû bi heyecan gotibû;

- Ji bo Xwedê, bilezînin, wextî panzer bi paş de bê.

Piştî derbasbûnê, rîberê wan bi paş de vege riyabû û her çiqas baranê alîkariya veşartina şopa wan kiribû ji ji bo dilê xwe di cih xe, bi destêن xwe ve, qûma hûr ya li ser rî, rast kiribû. Du kesan têl hêdî bilind kiribûn û yên din ji di bin re derbas bûbûn. Rîber li pêşiyê û ew ji li gor talîmatê, lingê xwe danibûn dewsa lingê yê pêşiya xwe û bi vî awayî di reya ku berê hatibû vekirin û ceribandin re meşiyabûn. Gava nêzîkî li têla ortê kiribûn, ji nişka ve berê bi dengê G-3-yekê û dû re bi den-gên teqînên rawestin lê tunebûn, veciniqîbûn. Dilê wan ji tirsâ wextî di devêن wan re avêtiba. Berê rîza wan bi temamî kil bûbû û xwestibûn xwe biavêjin erdê, lê ga-va li rîber neribûn, ew ji di cihê xwe de rawestiyayî mabûn û li dengê sîlehan guhdar kiribûn. Teqîn her çûbû gûrrtir bûbû. Panzêrekê berê projektoran dabû nava erd û hedef rohnî dikir. Yekî ji bi sîleha ku li ser panzêre girêdayî ve, li yên li nav erd bûn, direşand. Piştî çend deqîqeyan, projektor hatibûn vemirandin û sîleha li ser panzêre bêdeng mabû. Rîber xwe gîhandibû wan û bi dengekî gellekî nizm gotibû:

- Xema nexwin, dûrî me nin. Ew û grûpeke din şerr dikin. Baş bû ku em ji pan-

zêrê xelas bûn. Heta ew bi hevdû bilin, divê em derbas bibin, Bilezinin!

Di bin dengên çend teqînên bêhedef de, têla ortê jî hatibû bilindkirin. Pişti ku têla ortê li dû xwe hiştibûn, rewşa wî xerabtir bûbû, lê bi zorê ba jî xwe gîhandibû têla herî dawiyê. Dengê rêberê ku têla dawiyê jî li dû xwe hiştibû, hatibû guhertin. Rêber wek mirovê ku beriya bîstikekê di bîreke bêbinî de be û jî nû ve bi rûkala dinyayê ketibe, kêt kiribû. Pişti li ber têla dawiyê mîzkirinê jî tevgerên wî bi temamî normal bûbûn. Pişti meşa bîstikekê, rêberê wan gotibû;

- Em nuha di nava axa rojhilatê başûr de ne, lê em hîn jî di hedefa tivingên leşkeran de ne. Ger leşker bi me bihesin, dikarin ji cîhêن xwe jî bera me bidin. Ji ber vê yekê, divê hûn çend sed metreyen din jî idare bikin.

Wî ancax, wê gavê fahm kiribû ku êdî sînor bi temamî hatiye derbaskirin. Gelo têl hebûn? Tew mayin? Ma mayin hebû? Ger hebûn, ji xwe nedihat bîra wî, bê kengî têl û mayin derbas kiribûn. Gelo ew di bin têlan re derbas bûbûn, an wan xwe di ser têlan re çeng kiribûn? Lê difikirî, lê qet nedihat bîra wî.

Halê wî êdî nema idare dibû. Birçîbûn, xew û betilbûnê ew teslim stendibû. Çâvên wî jî dervayî irada wî, diçûn ser hevdû; çongên wî sist bûbûn, lingên wî, ew nema hildigirtin û wî bêrîkên xwe tije nok hîs kiribû. Gava destê xwe avêtibû bêrîkên xwe û vala derketibû jî pirr şas mabû. Ji nişka ve sifreyeke fireh ya li erdê raxistî hatibû ber çavên wî. Wê gavê li ber sifreye rûniştibû û jî bo xwarinê destê xwe dirêjî mesefê kiribû, lê ew jî vala derketibû. Wî kiribû nekiribû, sifreya li erdê raxistî bi dest negirtibû. Du deqîqe berê, sifre li erdê raxistî bû; mesefeko birincê ku ser tije goşt û tırışka li ber, ew ber bi xwe ve kişandibû, lê hewildana wî ya jî bo îstîfadekirina ji na'metên vê sifre, her vala derketibû. Çavên wî careke din çûbû ser hevdû, bîstikekê razayî meşiyabû. Ji nişka ve rawestiyabû û destê xwe xistibû herdu bêrîkên çakêtê xwe. Beriya ku destê xwe di bêrîkan xista, xwedêgiravî, herdu bêrîkên wî jî dîsa ji noka mişt bûn. Wî bi vî awayî tibabekî di ber xwe de dabû. Hevalên wî û rêber, bi qasî çend sed metreyan, jê bi dûr ketibûn. Ji nişka ve lê hay bûbûn û bi xar ber bi wî de baz dabûn. Gava wan rewşa wî fahm kiribûn, hem bi wî re xeyidî bûn û gotibûn;

- Em pê nizanin, bê tu dixwazî bi vê paya xwe, ci îsbat bikî,
û hem jî li ber xwe ketibûn.

Du heval ketibûn bin milên wî û yên din jî barê wî hilgirtibûn, lê wî dîsa jî xwe li sifreya li erdê raxistî radikşandibû. Heta gîhaştibûn gund û rêber li deriyê nasekî xwe xistibû, tu nemabû ji dest çûbaya. Rûyê wî zer û zuha bûbû. Gava xwediyê malê pişti xêrhatinê, ji wan re gotibû;

- Gelî mîvanan, hûn jî rê têr û nuha birçî ne. Hebekî sebir bikin, xwarina we çêdibe.

Wî xwe negirtibû û avêtibû ortê û gotibû;

- Ez nikarim li bende çêkirinê rawestim, tu bi xêra xwe, ji min re, zû nanî bîne.

Gava ev gotin ji deva derketibû, ricisibû ji. Xwediye malê bi nerînên mîna ku bibêje; "bavo, di sînor re derbasbûn, ne karê herkesî ye", lê nihêribû. Lê wî ev fahm kiribû û ji ber vê yekê gotibû;

- Bavo heyran, tu ji min re nîn bîne û dû re tu ci difikirî, tu serbest î.

Mazûbanê wan bi lez, çend nanê hilatî danibû ber wan. Wî di jiyana xwe de, tu carî nanê tisî nexwaribû, lê ew nanê hilatî yê mezin, bi tisi kiribû çend parîyan û dû re bi çavênu ku "çend nanê din ji bîne" li mazûbanê xwe nihêribû. Mêrik li gel nanin din, hinek dims ji peyde kiribû. Dims û nanê hilatî di hundurê çend deqîqeyan de, li ortê nemabû. Ew dû re, li bende xwarina li ser êgir nemabû û ji bo çend saet xewê, çavênu xwe dabûn ser hevdû. Ji xwe çavênu wî, ji xweber çûbûn ser hevdû. 

Lêborîn

Di hejmara Nûdemê ya 11'an rûpel 51 de, ji ber şâsiyeke teknîki ev rêza dawî ya çîroka Kamiran Haco "Şagirtê Jîr" nehatîye nivîsandin. Ev rêza dawî wilo ye: ...digot çîma mamosta ji ber pirseke piçûk bîna wî teng bû û bi vê dijwariyê lêxist.

Di hejmara Nûdemê ya 12'an, di nivîsa Suleiman Sulêvani ya bi navê "Întelektuelên Kurd û Politaka" rûpel 34'an de, ji berdêla "berpirsiyariya" "berpirsiyarê" hatîye nivîsandin.

Herweha di hejmara 12'an, di çîroka Firat Cewerî "Girtiyê Şeva Reş" rûpelê 99'an de, ji dawiyê ve, di rêza heştan de, ji berdêla "du keç û xortek", "keçek û du xort" hatîye nivîsandin. Em rast dikin û ji xwendevanê xwe lêborînê dixwazin

GUNNAR EKELÖF

Dûşîze! Ji Tî JI DÎWAN LI SER MÎRÊ EMGION

Li pey Avê ji destên te...
Dûşîza ji hêviyê
Tu ku Bêrikirin e
ne ji kesekî
Tu ku ji xizaniyê re ye
Tenêtiya Te hêviya me ye
û ji me pê ve tu kesekî te
yêñ din tunene, ku tu li wan binêrî,
li ser wan şînê bigîrî

* * *

Min di xewna xwe de bihîst
-Hebîb, tu vê pîvazê dixwazî
an tenê pelekî?
dudulşyeke mezin li ba min peyda bû
Pirsa vê metelê
pirsa jiyana min bû!
Gelo min ji dêlva nêvî hemî
an ji dêlva hemî nêvî dixwest?
Na, min herdu ji dixwestin
weke nêvî ji hemî û mîna hemî
û ku ê tu dijîtî di vê hilbijartinê de tuneba.

* * *

Rast, tenê
tu di avgona
Ezmanê şevê de
şipya ye
Bê mindal



qedera te bi xwe ye
Sermelekên bi şes baskan
te diparêzin
û ez, ew mîrê bargiran
yê Emgio'nê
Li vir, li ser çiyayekâ
“Dilovani” ye navê vî çiyayî

* * *

Ez serê xwe
li girtîgehekê, li ser vî kevirî diarimînim
Tu lihêfa min e
Çemê te lorîna min e
ya hespê û lihêfa zêrîn
Evaya hemî min sitand
evaya hemî min winda kir
Evaya hemî yê min e
Ez bi te re li hev dikim
ji bo ku bibînim tu ê hêj
careke din were xewna min

* * *

Mirê Emgio'nê
mîrekî kurd
li Vlachernê girtî
pêşkêşî Agirê te dike vê axaftinê:
Dûşîza ku kesek ne xwedî ye
ku ne xwedîyê tiştekî ye
Ruhê min ji min re goti bû
ku ez ê li hemberî wan serî hildim
Ger ku serê min vê gavê
li ser darekî daçikandî li ber derî be jî
fikra min li ba te ye
Dûşîza ji Agir û ne ji Tiştekî

* * *

Dilê min mindalekî ji naza keti ye

di navbêna parsuwêن min de
zarokek di qefesê de, bêguman
pariyekî nan dirêjî min dîkin
di nav deraban re

Min destê xwe li ber venekiri ye
Min bergirtiya tu tiştî ne kiriye
ji evînê
Ez birçîbûna xwe li pey te dixwum
Ez birçîbûna xwe bi birçîbûnê têr dikim
Eva ye fikra te
ê wusa be Biryara min

* * *

Ez te, li dûrayê dibînim
Ji nav Derya Dûyê bilindbûyî
bi fîstanekî pir pêlinî
Tu min nabînî

Lê tu Xerîb
Ez ber bi te ve hewl didim
Ez keleka xwe ber bi te ve diherikînim
weke yekî ku tenê bêrikeke wî hebe
Dibe ku yek xurtir dihajo
li aliyê din
Destên min di berxwedanê de helak dîbin
Çemberêن şevan û rojan
keştiyê şirove dîkin
Tucarî ez te bernadim
Tu
ê bêrika min be!

Wergera ji swêdî: **M. Ali Kut**

BEND Û METELOKÊN KURDÎ



Di dirêjahî û kurtahiya dîrokê de, rûdan û bûyer diyardarên rojane û serpêhatiyên kurdan wê ji bo egerê dahînana gotin û bendên maqûl ji zardevê mirovên dînyadîtî, rewşenbîr, aqilmend û hekiman, xwe-danê serborî û tecrubêni jîyanê.

Herçend ew metelok kurt in, lê pîr bi tam û bi raman in. Bi şarezayî û zanyariyeke hostane û pisporane wê hatin lêk anîn û têkbest kirin. Gişt nesîhet in, gişt amojgar in, rê û rîbazan li ber civak û komelê kurd rohnî û xweş dikin, herweha kartêkirin û rolek girîng digêrin di titâl, tor, adet, dest û darê civaka kurdî de. Mîna destûr û qanûnan û rêk-xistinê civakî û komelî dihênen berçav...

Van metel û bendan cîhekî berz û berketî di folklorâ kurdan ya devkî de heye. Ji lewra pêwîst e ev metelok û bendana bêne berhevkirin û ji gişt rex û rûyan ve bêne şirovekirin, mîna pirtûk bêne çapkirin û di kitêbxanan de bêne parastin.

Ger em çavekî li van metelokan bigerînin û baş bala xwe bidin naveroka wan, em ê bibînin ku her mîsalex dersek e, hikmeteke zêrîn e, ku bav û kalan li dû xwe ji me re hişti-ne. Ew riya rast nişanî mirovan didin, ji xeletiyan diparêzin û jê didin paş...

Kerem bikin, li van metelokên xwarê temaşê bikin, ka ci raman û meremên rind û berz di wan de hene... Bo nimûne metelokek ji wan dibêje:

Haviz Qazî

Reşo bi destê xwe, heke av dê te bet

Ev meteloka ha dibêje, Reşo lawo, pêdivî ye tu bi xwe melevaniyan bikî da ji robarî derbaz bibî, pişta xwe bi kesî gerim nekî, pal mede, nebêje filankes wê were min ji avê derîne û ji xeniqandinê xelas bike. Na xêr Reşo, wê hizrê meke, berevajî, divê tu bê dudilî wê bizavê bikî, xwe mandî bikî, xwêdanê birêjî, rencê bidî, zehmetiyê bikêşî, da tu bikaribî ji robarî derkevî. Reşo lawo, tu xelet î ger tu li benda xelkê bimîn ku ew werin te ji robarî xelas bikin. Ji ber ku her yek ji wan bi xwe ve mijûl e, bizavê dike ruhê xwe ji xeniqandinê rizgar bike, ji lew lawo Reşo, pêkolê bike, debara halê xwe bike û xwe azad bike. Ger Reşo tu wê nekî, ev e tu têkçûyî û binav bûyî û bûye xwarinek xweş ji bo masiyên robarî.

Ramana vê metelokê rohnî û aşkere ye. Ew ji mirov dixwaze, ku mirov karê xwe bi destê xwe bike û pişta xwe bi kesî gerim neke. Tiştekî xoriste ye eger xelkê dît mirov we yê rijde karê xwe bi destê xwe biqedîne, ew ji wê bi dilxweşî alîkariya wî bikin.

Miletê kurd ji eger bizava safîkirina kêsa xwe neke, kes destê alîkariyê bo wî dirêj nake.

Metelokeke din ji dibêje:

Kurmê darê ji darê ye

Em kurd vê gotina zêrîn çak dizanin û baş tê şareza ne. Ev nêzîkî pênc sed salan e ku em kurd di bin darê zulmê de dinalin. Bi sedan sal in, karasetên bê wêne û diltezîn bi destêñ dijminan, bi çavêñ xwe dibînin, her dem ji dijmin hinde kurdên xwefiroş bi kirê û peran digire û dike çek û alet di destêñ xwe de ji bo çewsandin û serkutkirina bizava niştimanî a kurdî û qirkirina kurdên bi şeref û şorîşgêr. Di vê metelokê de, gelê kurd ê niştimanperwer bi darê teşbihî kiriye û kurdên xayîn, namûsfiroş û nokerên dijminan bi kurmêñ wê darê teşbihî kirine. Yanâ ew kurmêñ çepel yên ji wê darê çebûne, ew bi xwe wê darê dixewinînin û hişk û pûç dikin.


Ew kurmêñ sotin û vebirandinê ne, ji ber her ew in yên Kurdistan heta iro di vî kira-sê teng de hiştine. ↗

DEMA RONAHİYÊ

Di van deh salên dawî de, hemû cure entellektû-
elên Kurdan ketine nava munaqeşeyeke piraî.
Mirovên me ji pirr aliyan de, pirr tiştan û pirsan
bi awayekî pirr tevlihev bi hevre munaqeş dikin. Carna
jê ji munaqeşa mirovên me ne bi hev re ye, lê di ber hev
re ye. Li şûna diyalogê monolog pêşketiye. Em tenê ji
xwe re dibêjin û dibilînin. Lê divê mirov ji hev re bibêje.
Heger komunikasyon di navbera me de tunebe, wê çaxê
mirov nikare bibêje ku danûstandin heye. Ji bona komu-
nikasyonek baş azadiya fikri lazim e.

Li ser rola entellektûelan û niviskaran, li ser huner û
kultur, li ser edebiyat û ilm ditinên curbecur têne pêşkêş-
kirin. Danûstandina entellektûelan û munaqeşe li ser
pirsgirêkên ramanî, erzan bûne. Gelek tiştên girîng hati-
ne qurmîcandin. Kalîta ramanî û ideoloji baş ketiye xwa-
rê. Kî ci tê ber devê wî dibêje. Peyva vala zêde bûye lê fi-
kirandin qels e. Heger di nav gotin û ramanê mirovan de,
carna gotinên nû û biyanî ji hebin, wê çaxê tê gotin ku
entellektûeliya te gihaye ezmanê heftan. Lê em baş dizan-
nin ku entellektûeliya rastî ne di van sixleta de ye. Entel-
lektûelî divê ji hemû alî de li ser zanebûna ilmî, li ser hel-
westgirtina ramanî û durustiya şexsi ava bibe. Divê kesê
entellektûel zanibin ci dibêjin. Zelaliya ramanî, yek ji six-
letê entellektûeliyê yê helî baş e.

Di warê ramanî de îro hinek gotin bûne mode. Miro-
vên me bêî fikirandin û tevgirêdana dîrokî, behsa Rone-
sansekê û Ronahiyeke Kurdi bi hev re dikin. Ev gotinan
dikarin xweş bêne guhêñ mirovan. Lê mirovên entellek-
tûel divê ji xwe bipirsin; Ma gelo civat bi hevdû re dikare
him Ronesansê û him ji Ronahiyê bijîn? Beriya hemû tiş-
tî ev her du demên dîrokî, navê du tevgerên ramanî, hu-



Serefhan Cizirî

nerî ú sosyal in. Ronesans li Ítaliyayê ú Ronahî jî li Fransayê dest pê kiriyê. Ji aliyê direkî de di navbera van her du deman de, nêzîkayî sêsed sal wext derbas bûye. Ronesansê daxwaz dikir ku klasikên Grekî ú hînek otoriteyên mezin jî nû ve bîne rojevê. Li hember vê, Ronahiyê daxwaz dikir ku li pêşberî ilmê klasik ú otoriteyên entellektû-elî, serîhildanê organîze bike. Tevgera Ronesansê li ser hîmê zanebûna klasik ava dibû ú tevgera Ronahiyê jî, bi taybetî li ser zanebûna ilmê xwezayê bilind dibû. Dema Ronesansê bi giştî ramanên idealistî rol dilistin, lê dema Ronahiyê dema materyalîzmê bû. Ronesans bi giştî di bin tesîra dîn de bû, Ronahiyê jî daxwaz dikir ku jiyana civatî ji bin tesîra dîn azad bike úhw. Bi kurtî ferqeke mezin di navbera Ronesansê ú dema Ronahiyê de heye. Ji ber vê yekê jî yên ku behsa Ronahiya Kurdî dikan, di rastiya xwe de haya wan ji tevgera Rohahiyê tuneye.

Ji bona civata Kurdistanê bikaribe behsa dema Ronahiyê bike, hîna gelek tenûrên nan ji me re lazım in. Dema Ronahiyê bi hemû awayî demeke nû ya ilmî, kultûrî, felsefi, sosyal, politîk, ekonomîk, mirovî, úhw ye. Berî hemû tiştî jî ev dem dema aqilmendiyê ye. Ma gelo di navbera Kurdan de, ji aliyê politik, entellektûelî ú sosyal de aqil iro çiqase rol dilîze? Ma civateke birakuj dikare behsa Ronahiyê bike? Ma civateke ku ji sedî 95'ê wê nikaribe bi zimanê xwe binivisîne ú bixwîne, dikare behsa Ronahiyê bike? Weke tê zanîn mirovîn ku di civata me de tiştan jiber dibêjin pirr in. Ev rastiya hanê tenê bi serê xwe bi Ronahiyê re dikeve nakokiyê. Tevgera Ronahiyê, weke tê zanîn bi zanebûna tiştan dibêje ú diparêze. Ev zanebûna zanebûneke ilmî ú

praktîk e...

Baş e, dema Ronahiyê bi rastî demeke çawa bû? Mirovan ji Ronahiyê ci fahm dikirin?

Li gora Moses Mendelsson(1729 - 1786) perwerdekirina mirovan xwedî du aliyan bû; aliyekepraktîk ú aliyekejî teorîk bû. Jî aliyê praktîk re Mendelsson digot kultur ú ji aliyê teorîk re digot Ronahî. Ronahî, ji zanebûneke ku timam bû, bêî kêmânî bû, pêwîst bû, di pîr waran de karîbû derbas bîba ú ji zanebûneke ku alîkariya mirovan dikir pêkdihat. Lî li ba filozofî mezin Emmanuel Kant, Ronahî helwestgirtinek exlaqî bû. Ronahî, li gora Kant stewardin bû, kamîlbûna mirovan ú bikanîna aqil bû.

Kultur bi taybetî li ser normen praktîk ava dibû. Di warê sineet de kalîte ú xweşîkbûn, huner ú danûstandinê sosyal, ji aliyeke de kabiliyet ú hostetî ú ji aliyeke de pîvanen jiyanê, hemûyan bi hev re naveroka kultur pêk tanîn. Li hember vê jî Ronahî, ji referense teorîk, ji zanebûna aqilmendî ú qabiliyata bikaranîna pîvanê aqilmendiyê ava dibû. Bi kurtî Ronahî dihat mana ku mirov karibe li ser pirsgirêkên mirovatîyê ú jiyanê, reaksiyonen aqilmendî nîşan bide. Di warê Ronahiyê de rola ziman pîr mezîn dihate ditîn. Mendelsson digot ku zimanek digehê Ronahiyê, bi alîkariya ilm ú kultur, bi alîkariya danûstandinê sosyal, bi riya gotinê ú bi xwendina helbestan re. dm, bikaranîna kabaliyeta mirovan ya teorîk ú kultur ji ya praktîk pêş dixîne. Ev her du bi hev re jî bingehê perwerdekirina mirovan pêk tanîn...

Tevgera Ronahiyê bingehê xwe ji şoreşa xwezayî ya ilmî digit. Ya ku di sedsala 1600'î de pêşketibû. Mana gotina Ronahî-

yê jî ji vê dîtinê pêkdihat: Mirov dikarin bi alîkariya kultur û perwerdekirinê ronak bibin û aqilê xwe bi kar bînin. Malzeme û dîtinê dema Ronahiyê, ji felsefe û ilmê xwezayê yê modern pêk dihatin. Entellektûlênu ku hevalbendê Ronahiyê bûn, hewil didan ku vî malzemî popularîze bikin û bi vî awayî jî wîna bikin malê xelkê xwe. Entellektûlê divabûn him perwerdekar bin û him jî mamoste bin.


Ronahîkirina xelkê ew e hemû zanebûna mirovayî bigirtana hundirê xwe. Di hemû warê jiyanê de ew ê zanebûna Ronahiyê, bi zanebûna kevnare re têketa têkoşinê. Ji ber vê yekê jî entellektûlênu dema Ronahiyê piralî bûn. Ji bona mînak mirov dikare xebata Voltaire nîşan bide; Ew dramatîsyen bû, helbestvan bû, dîrokvan bû û filozof bû. Helbet hemû kes ne weke Voltaire bû. Lê cehdek hebû ku mirovan teşwiqî ser fêrbûnê dikir.

Mirovê ku di sedsala 16'an de li Ewrûpa dijîyan, zanebûna xwe ji du çavkaniyên gi-ring yên kultûrî digirtin. Ev çavkanî klasîkên antik û bi taybetî jî «ncil bû. Dema Antîk weke deme zérîn ya mironvantiyê dihate pejirandin. Ji bona piraniya entellektuelênu Ewrûpayî, dema Antîk demeke îdeal bû. Tevgereke nû weke Reformasyon û Ronesansê jî ev dîtinana û helwestana xurttir kirin.

Dema Ronahiyê ji aliye ziman de hinek fenomenê nû bi xwe re anîbûn. Zimanê Fransî bûbû zimanê sereke. Pirr kesan zû dev ji zimanê Latinî an jî zimanê dayîka xwe berdidian û bi zimanê Fransî dinivîsandin. Yek ji van entellektûelan, dîrokzan Gibbon bû. Wexta ku Gibbon xwest dîroka Swisra binîvisine, ew bi Fransî nivîsand. Gibbon encamê vê yekê jî wuha îzah di-

ke.” Ji ber ku ez bi Fransî difikirim, çiqas ecêb be jî, zehmet e ku ez bi zimanê dayîka xwe binivîsinim.” Mirov bi kîjan zimanâ bifikire, ew ziman bi hêsanî dibe zimanê nivîsandinê. Her çiqas zimanê «ngilizî û Fransî, di dema Ronahiyê de du zimanê sereke bûn jî, dîsa Gibbon xebate xwe bi Fransî nivîsand. Ji ber ku Gibbon bi Fransî difikîrî. Weke ku tê zanîn piraniya xebat û tekstên Ronahiyê, ji aliye nivîskarênu Fransî dihatin asirandin. Lê pîr caran xebatê gi-ring weke pirtûka Montesquieus ku li ser qanûnan hatîye nivîsandin, hema pêre piştî çapkiranê dihate wergerandin. Pirtûka Montesquieus di hundirê 25 salan de 10 caran wergerandin İngilizî. Wergerandin û belavkirina pirtûk û ramanê bûha, ji hêla tevgera Ronahiyê de weke xebateke entellektûlê û hêja dihate pejirandin.

Di qîrnê 17. de zanebûn hemû xalênu zanyariyê digirt nav xwe. Ji ber vê helwestê jî tevgera Ronahiyê destpêkirin Ansiklopedîyan biweşînin. Ji bona tevgera Ronahiyê weşandina Ansiklopedîyan û komkirina zaniyariyê tiştekî taybetî û xas bû. Entellektûlênu bi nav û deng Denis Diderot hemû jîyana xwe dabû ser komkirina zaniyariyê. Diderot di Ansiklopedîyan de pîr zaniyarî asirand. Entellektûlê weke D'Alembert jî alîkariya wî dikir. Tenê Ansiklopediya ku Dennîs Diderot jê berpirsiyar bû, ji 17 cild tekst û ji 7 cild sûret pêkdihat. Belavkirina vê Ansiklopediyê bi xwe, li dijî cehaletê êrîşek mezin bû. Ew Ansiklopedî di warê politîka, felsefe û dîn de weke antolojiyek ramanê ronahiye bû. Her Ansiklopedî 4. hezar dihat çapkiran û bi 280 Livre Fransî dihate firotin. Di vê demê de 280 Livre bû-hayekî pîr bilind bû û ev yeka jî dibû encamekî ku Ansiklopedî di nav halxweşan



Denis Diderot (1713-84)

de ji baş belav nebe. Le dîsa ji Ansîklopedi-yen dema Ronahiyê 4. hezar dihat firotin.

Eşkere ye ku hemû pirtûk weke hevdû nedihatîn firotin. Pirtûka Montesquies "Li Ser Qanûna" û ya Buffon li ser dîroka xwezayê "Histoire naturelle" pirtûkên "bestseller" bûn. Ev pirtûkên Montesquies û Buffon pirr dihatin firotin û di hemû pirtûkxanêň baş de peyda dibûn. Di hundirê 18 mehan de pirtûka Montesquies 22 caran hate çapkiran. Ev ji tê vê manê ku ji vê pirtûkê 35 hezar hatin firotin. Di sala 1759'an de bi tenê pirtûka Voltaires "Candide" 8 caran hate çapkiran.

Li gora dîrokzan Norman Hampson, belavbûna sosyal ya ramanê Ronahiyê, berî hemû tiştî girêdayî buhayê pirtûkan bû. Pirr kes hebûn ku nikaribûn pirtûk bikiriyana. Bi taybetî tenê burjuvazî û halxweşê civata Fransî karibûn van pirtûkanan biki-rin. Me got ku belavbûna pirtûkan ya sosyal girêdayî buhayê pirtûkan bû. Di vê hevgirêdanê de mînakeke baş pirtûka Rousseau ye. Pirtûka Rousseau "Li Ser Emile" di destpêka dema çapa xwe de, di navbera 15 heta 18 Livres dihate firotin. Ev buha ji bona pirr pirtûkên vê çaxê normal bû. Lî wexta ku pirtûka Jean Jack Rousseau bi na-ve "Li Ser Emile."(pirtûk di derheqa per-werdekirin û edeba zarokan de hatiye nivî-sandin) hate qedexekirin, wê çaxê buhayê pirtûkê 4-5 caran bilindir bû! Yanî pirtûk bi tenê li bazara reş dikarîbû bihatana dî-tin.

Dîsa li gora dîrokzan Hampson, di vê demê de xelkê pirr dixwend. Li gora gerokêkî Alman ku serek dabû Parisê, her kesî tiştîk dixwend. Ew kesê ku gerokê Alman li wan rast hatibû, ji sedî sed tiştîk dixwendin. Pirekan dixwend, zarokan dixwend,

karkeran dixwend, ühw. Gerokê Alman di-bêje ku berdestkê di dikanan de, xulamên di paytonan de, siwarêni paytonê, karmen-dên postexanê, keçen Aristokratan, erê, hemûya pirtûk dixwendin. Yekî weke General Hoche Voltaire dixwend û lawikekî ga-van yê 17 salî ji dîsa Voltaire dixwend.

Di sala 1750'an de di warê edebiyatê de kovarêni demane hatin çapkiran. Rojnamê rojane hatin weşandin. Rojnama İngilizî "The Spectator" di destpêka weşana xwe de 20-30 hezar rojname difirotin. Di navbera salên 1753 heta 1775 li inglezitanê fi-rotina rojnaman duqat bû. Mirov dikare pêşketin û mezînbûneke wuha di warê roj-namevaniyê de li Fransa, Rûsyâ û li Span-yayê ji bibîne.

Mirov dikare dema Ronahiyê bi pir nav û bûyeran ve girê bide. Divê ji bona hemû kesan tiştîk pirr eşkere be; pêşketina kapitalizmê û civata Ewrûpayî zor da ser avani-ya jorî ku ideolojiya xwe li gora felsefa kapitalizmê biguherîne. Encamên maddî yê bingeha civatê guherandinê sosyal û kul-turî bi xwe re tanîn. Di îdeolojî û felsefa kapitalizmê de zaniyarî diket şûna bahweri-yê, demokrasî diket şûna aristokratizmê, danûstandînê kapitalistî diketin şûna esaletê, ühw. Yanî weke ku Marksîstan her-gav gotiye; ekonomiya kapitalistî hewceda-rê guherandina avaniya jorî bû. Çîna burjuvazî hewcedarê ideolojiyek nû bû. Norm û pîvanê vê ideolojiya hanê ji ji pirr aliya de, ji aliye tevgera Ronahiye de hatibûn formûlekirin. Lî tevgera Ronahiyê bi giştî, weke ku baş tê zanîn ne tenê ji burjuvazî re, lî belê ji hemû mirovantîyê re xizmet kir. Burjuvazî ji di kamilbûna xwe de, ji bona hemû mirovantîyê xizmeteke baş ki-ribû. Marks tu caran ev xizmeta burjuvazî

înkar nedikir, lê digot ôro burjuvazî rola xwe tije kiriye û ji hemû aliya de bûye xwe-parêz û egoist.

Tevgera Ronahiyê ji bona mirovantiyê pirr qîmetê hêja derxistine pêş. Di dema Ronahiyê de bi sedan nivîskar, ramanwer, filozof, zanyar, ekonom bi çalakî kar kirine. Tenê nivîskar û ramanwerê ku min tiştek jê xwendîye an ji min li ser tiştin xwendîne avana ne; Locke, Leibniz, Newton, Pope, Vico, Montesquieus, Voltaire, Linnaeus, Buffon, La Matrie, Hume, Rousseau, Diderot, Helvetuis, Condillac, D'Holbach, Adam Smith, Emmanuell Kant, Lessing, Condercet, Herder, Goethe. Her navek di warê xwe de otorite ye.

Tevgera Ronahiyê dikare di çend xalan de were komkirin. Yek ji vana xebata li ser ilmê xwezayê ye. Di vê hevgirêdanê de Fizika Newton ya nû, teoriya li ser elektrikê yê ku Galvanî û Voltas pêşxistibûn bi xwe re pirr guhertinên praktik anîn meydanê. Dîtinên Newton, Galvanî, Voltas û pirr ilmzanên din, kombinezonên nû pêkanîn û rê ji tevgera Ronahiyê re baş vedikirin. Ji ber ku ilmê xwezayê, di rastiya xwe de zanyariyek pirr bi rêk û pêk afîrandibû. Li şuna daxwazên subjektif zanebûna objektif derdiket pêş. Ji bona mînak; teoriya Voltas li ser elektrikê ne tenê daxwazek an ji dîtinek bû, lê belê ew zanyarî bû û rastî bû. Ji xwe civata kapitalistî ji hewcedarê zanyariyekê praktik bû. Bi keşkirina elektrikê, di civatê de kaniyên enerjiyê kûr û fireh dibûn. Bi kurtî, wexta ku pêşketina ilmê xwezayê û daxwaziyên burjuvazî yên îdeolojîk bûn yek, wê çaxê dema Ronahiyê destpêkiribû.

Di dema destpekê de Voltaire xwest ku dîtinên Newton li ser Fizikê popularîze bi-

ke. Bi zimanê ku piraniya xelkê jê fehmidikir, Voltaire pirtûka Newton weke "Principia" û "Optik" dane nasandin. Piştî popularîzekirina van pirtûkan, alaqa xelkê li himber dîtinên Newton û ilmê xwezayê pirr zêde dibû. Weke tê zanîn Newton propaganda ji bona metodên ampirik(ceribandî), azadiya politik û toleransa dînî dikir.

Tevgera Ronahiyê li dijî hegemoniya dîn û desthilata dêrê disekinî. Ronahiyê bi xurtî propaganda li dijî bahweriya bi pîraboka, sihirbaziyê, tirsê û déhnitiyê dikir. Exlaqê ku tevgera Ronahiyê derdixist pêş, exlaqekî berbiçav(konkret) û mirovî bû. Ev exlaq, ne li ser tırsa Xwedê lê belê li ser zanebûn di derheqa mirovan de ava dibû. Cewherê vî exlaqî ji ev bû; dilşakirina mirovan û feyda mirovantiyê.

Xala duduya ya tevgera Ronahiyê dikeve warê ilmê beşerî. Ji aliye huqûqî û sosyolojîk de, nivîskarîn weke Montesqueis, Thomas Jeffersonson û Jean Jack Rousseau ji bona azadiya politik û demokrasî xebatên pirr heja kirine. Li gora dîtinên Montesquies qanûn, ne li gora daxwaziya Xwedê lê li gora encamên materyalist divabû bihatina nivîsandin. Li gora Rousseau xweserbûn(egemenlik, suverenîte) bingehê xwe divabû ji xelkê bigirta. Ji aliyeke de ji Thomas Jeffersonson behsa demokratîzekirina zagona esasî (Anayasa) dikir. Hemû kesen tevgera Ronahiyê, di warê şeklê dewletê de komar diparaztin û dipesinandin. Evana ji bona heqê dengdana giştî, ji bona toleransê, ji bona daxwaziya xelkê û ji bona civateke wekhevî têkoşîn didan.

Xala sisiyan ya tevgera Ronahiyê dikeve warê ilmê ekonomî. Di warê ilmê ekonomî de teorî û praktîka merkantilistî dihate teri-

kandin. Li gora teoriya merkantîlîzmê; welatan danûstandinên xwe yên bazirganiyê li gora hinek pîvana dimeşandin. Pîvana bingehîn jî ev bû; Welatek hatta karîbaya pêwîst bû exporta(ixracata) xwe zêde bike û importa(ithalata) xwe kêm bike. Bi awayekî din mirov dikare vê yekê wuha bibêje; mal ji welatê biyanî kêm bikire û malê xwe jî zêde bifiroşe wan. Ji bona ku dewlet kari-be vê sistemê li ser lingan bihêle, gumrik dihatin bilindkirin, kontrola tixûban dihate zedekirin, normên pirr ecêb ji bona tevgera ekonomî dihatin peydekirin, ûhw. Di destpêka dema Ronahiyê de merkantîlizmê nema karibû bersiva rewşa ekonomiya kapitalistî bidaya.

Di warê ekonomî de teoriyeke din ya gi-ring hebû ku bi navê Fizyokratîzmê dihate binavkirin. Bi kurtî Fizyokratîzmê îddîa dikir ku hemû dewlemendî bingeha xwe ji xwezayê û axê digire.

Wek perçeyekî ji tevgera Ronahiyê, ilmê ekonomiyê jî dîtin û teoriyên nû pêşxistin. Di bin navê ekonomiya politik de Adam Smith û ekonomên din, ilm û teoriya ekonomî pêş de birin. Bi xebat û dîtinên xwe ekonomên modern ilmê ekonomî di bêjîngê re derbas kirin. Pirtûka Adam Smith bi navê "Wealt of Nation(1776)", yanî "Refaha Netewa" bû pirtûka bingehîn ji bona vê ekola nû. Weke tê zanîn Marks bi xwe pirr dîtinên xwe ji Adam Smith û ekola ekonomî ya «ngîlistanê girtibûn. Li gora Adam Smith û ekola wî bingehê ekonomiya cîhanê ew e bibaya bazîrganiya azad. Dîsa li gora vê ekolê bingehê dewlemendiya mirovan ne weke ku fizyokratîstan digot; yanî

tenê ax û xweza bû. Bingehê dewlemendiya mirovan di rastiya xwe de keda mirovan bi xwe bû. Marks paşê piraniya dîtinên xwe yên ekonomî li ser vê teoriya ekola «ngîlistanê ava dikir. Dewlemendiya maddî bingehê xwe ji çewsandina hêza zehmetkêş di-girt...

Weke ku li jor jî baş hate xûyanîkirin, tevgera Ronahiyê dewlemend û piralî ye. Ji ekonomî bigire heta felsefe û kulturê dîtin-nên cur be cur di bin navê vê tevgerê de hatine nivîsandin. Di vî warî de aqilê ronak ketiye navenda xebata ramanî û kultûrî. Tevgera Ronahiyê li ser bingehên maddî yê kapitalistî û li gora jiyana felsefa burjuvazî hatiye formulekirin. Ji bona hemû xebatê ramanî û kultûrî, aqilê rasyonel di dema Ronahiyê de bûbû weke moxilekê. Bê ku aqilê rasyonel wezîfa moxilê bibîne, felsefa Ronahiyê nikare baş bi cih bibe û pêş bikeve. Aqilê betal (bêkar) alîkariya tevgera Ronahiyê nake.

Vêca, rastiya ramanî û felsefî li derekê ye û em jî li dereke din in. Ji ber vê yekê jî, ez ne bahwer im ku mirov bikarebe iro behsa Ronahyeke Kurdî bike û dilê xwe pê xweş bike. Rastbûn û çewtbûna vê dîtinê bi serê xwe problemek e û dikare her gav piralî û ilmî were munaqşekirin.

Lê ji pirr aliyê din ve gotina "Ronahiya Kurdî"? ne gotineke realist e.

Dîsa jî ez bi wijdanekî rehet dibêjim; Xwezi!

Lê belê weke tê zanîn; bav û kalên me ji berê de gotine;

"Bi xwezî mirov nagire baqê kezî"!

DIVÊ TURKIYE KİNCÊN XWE YÊN GEMARÎ BIŞO

Bi batina (ya Swêd) wezîrê derve yê Turkiyeyê re, şes parlementeran (her yekî li ser navê partiya xwe) ji bo ku mafêن mirovîn dide bin lingan hikûmete Tirk protesto kirin.

Komîsyona Ewrûpa Ya Mafêن Mirovîn (EHRC), li Strazbûrgê ji bo wan bûyerên ku ji Çiriya pêşîn 1994-an ve û heta niha bûne, biryara lêhûrnérinê daye. Ev biryar di derheqa 16 bûyerên ku li Turkiyeyê qewimîne de ye. Bingeha dabaşan li ser gunehkarkirina Turkiyeyê hatîye danîn. Ev dabaş, bi Pirsa Kurdan, li başûra rojhelata Turkiyeyê ve girêdayî ye. Ev gîlî, di derheqa wan gundêن ku hatine şewitandin, bi zorê koçkirin, îskence, zulim û neheqiyê din, ku di vî şerî li dijî PKK-ê de, ji aliyê hêzên ewlehiyê ve dihêن kirin de ye. Heke lêkolîna li ser van dozan, ji bo berdewama prosedûrekê bête qebûkirin, dê tesîrên mezin li Turkiyeyê bike. Bi Pirsa Kurdan re, li Turkiyeyê dê bi awayekî fireh rewşa mafêن mirovîn jî, ji nû ve di ber çav de bihê derbas kirin.

Ev 560 dozêن ku hene di derheqa bûyerên ku li Turkiyeyê qewimîne û li gor vê Konvensyonê tawanêن îhlalkirina mafêن mirovîn tînin ziman. Ev doz niha di maweya lêkolînê de ne. Biryara di derheqa van dozan de qedera bi sedan dozêن din ji eşkere bike. Şertê EHRC-ê ji bo ku dabasekê hilde dest xwe ew e, ku ew da-bas li wî welatî di hemû rê û imkanen hiqûqî re derbas bûbe. Lâ tiştê ku niha dibe ev komîyon bêî ku ev doz li wî welatî di hemû rê û merci-yen hiqûqî re deras bûbin, digire dest xwe.

Heke vê komîyonê bi riya merciyêن xwe ev doz şandin Mahkemeya Ewrûpa dê li sistema huqûqa Turkiyeyê, ya di derheqa mafêن mirovîn de bibin bingeha rexneyên giran. Dibe ku Turkiyeyê mecbûrî terkkirina Parlamenta Ew-

rûpa ji bikin.

Dadgerê Tirk, yê Dadgeha Mafêن Mirovîn li Strasbûrgê, prof. Bakir Naglar ku niha dest ji karê xwe kişandiye, di nîvîsara xwe ya ji bo wezareta derve ya Turkiyeyê re şandiye de dibêje: "Turkiyeyê xwe li gor standartên ewrûpî hazir nekiriye. Lê biryar daye û hemû peymanên Konvensiyonê, yên di derheqa mafêن mirovîn de imze kiriye. Turkiye li ser axa xwe, mecbûrî şûştina kêncêن xwe yên bi gemar e, ne li Stasbûrgê".

Tewrê muhakemekirina Dewleta Tirk û dan cezayên giran yên zîndanê jo bo wan şes parlementerên Kurd li çaralîyê cihanê acizî û nerihetiye çêkiriye. Gelek niwênerên biyanî, her weha çend kesen ji swêdî ji beşdarî Muhamemeya Çileya pêşîn ya 1994-an bûn.

RAPORÊN ŞINÊ

Parlementerên Kurd bi rê û biryaren demokratik hatibûn helbijartîn. Ew endamên wê partiya ku niha hatîye qedexekirin, DEP-ê bûn û di parlamenta tîrkan de jêhatî bûn. Paşê ew bi tawanê "xiyanet kîrinê" û bi yê li "dijî yekîtiya Dewleta Tirk" hatin îtham kîrin. Sipartekên serokdadgirê dadgeha Ewlehiya Dewletê (li Ankarayê) Nusret Demîrel, ji bo îtham kîrina van kesan bi vî cureyî, qels bûn. Yek ji wan xalêñ îthamkîrinê ev e, dibêjin ku van camêran "sonda parlamenteriye bi kurdî xwarine!". Kurdî zimanê rayavêjên (helbijêren) wan e.

Muhakemekirina parlamenterên Kurd bû sebeba ku Komîsyona Meclisa Ewrûpa ya karên derve, hîn di meha ilonê de biryarek derxist, ku hemû peywendiyêni bi parlamenterên Tirk re, heta demeka nekîf bihêne sînor kîrin.

Weqfa Mafêن Mirovîn li Turkiyeyê, ne rêxistinik dewletî ye. Civandina belgeyên di derhe-

qa îhlal kirina mafêñ mirovîn ji xebatên wê ye. Alîkariya kesên îşkencedîtî ji dike. Rapora HRFT (Weqfa Mafêñ Mirovîn li Turkiyeyê) ya sala 1993-an raporeka gelek bi tirajedî ye.

Di vê şideta ku roj bi roj zêdetir dibe de 3 492 mirov ji jiyana xwe bûne. 29 kes ji bi îşkencyê hatine kuştin. Rojnamevan, kesên ku van rojnemeyan difiroşin û belav dikin hatine kuştin. Weşan di bin zordestiyek giran de ne. Di 2-yê meha Sibatê de rojnameyek dîsan hate girtin.

Dadgehekê ji li heşt kesên ku bi derxistin û belavkirina muzîka kurdî ve mijûl in, bi tevî ku li gor qanûnê muzîka kurdî ne qedexe ye ji, dîsan dawe vekir.

Xuya ye, ku kapasîteya Dewleta Tîrk ji bo bi riyên siyâsi çareserkirina vê rewşê, têr nake. HRFT di meha ilona çûyi de namîlkeyek (biroşûr) derxist: "File of Torture. Deaths in detention places or prisons (12 september 1980-12 september 1994)". Bi alîkariya qanûna antîterorê dest danîn ser vê namîlkeyê. Ji nivîskarêن vê raporê du kes, serokê HRFT-ê Yavuz Önen û endamê komîteya birêvebirinê Fevzî Argun bi ceza kirinê hatin tehdîtkirin. Bi saya rexneyê ji derive ev dabaş hatiye sekinandin.

HRFT alîkariya aborî ji Y.M. (Yekîtiya Miletan), ji Y.E. (Yekîtiya Ewrûpa), ji SIDA (Rêxîstina Pêşvebirina Navnetewî Ya Swêd) û ji Amnesty digire. Bi alîkariya HRFT pirr kesên îşkencedîtî rehabilîte bûne. Ji xeynî vî karî di derheqa îhlala mafêñ mirovîn de ji gelek dokument hatine civandin. HRFT, bi SSKT (Komîteya Alîkariya Mafêñ Mirovîn li Turkiyeyê) re hevkariyê dike.

CAHILÎ BARÊ MIROV GIRAN DIKE

Pirr girîng e, ku hikûmeta niha alîkariû piştgiriya wan hêzên ku niha li Turkiyeyê bêwestan ji bo mafêñ mirovîn kar dikin, bike û di nav welêt de ji peywendiyê re riyekê vebike. (Ji bo peywendiyê) HRFT ya pêş e.

Li gor biryarnemeyen firoştina çekan, divê

çekêñ cengê nefiroşin Turkiyeyê. Zor girîng e, ku mirov li ser girêdana di navbera pêşveçûnê, xebata ji bo mafêñ mirovîn û demokrasiyê raweste.


Mirov pê kêfîxwêş dibe, ku niha li Afrîkaya başûr, li Felestîn, li Baskê û li Bakura Îrländayê prosedûra aştiyê di rojevê de ye. Lê li Turkiyeyê hîn ji rewşeka wisan tune. Kuştin, îşkencékirin û teselyîn çareserkirina bi riyên leşkerî her berdewam in. Hikûmet di her firsetê de, bêwestan dibêje: "her dewlet, li hember terorîzmî, xwendiyê mafê xweparastinê ye. PKK rêxistinêka terorîst e û ji aliyê hêzén dereke ve hatiye damezi-randin!". Dibêjin "rexneyêñ ewrûpiyan û yên ji Amnesty çalakîyên terorê bi pêş ve dibin". Heta ku Dewleta Swêd bi xwe ji, ji vê cahiliya wan para xwe girtiye. Ew, Dewleta Swêd ji gunehkar dikin, ku di warî aborî de alîkariya rêxistina terorîst dike.

Girîng e ku berpîrsiyarên Swêd, yên OSSE (Komîsyona Ewrûpa) û niha ji yên Y.E. (Yekîtiya Ewrûpa) vê siyaseta xwe, ya rûbarîhevirkirinê (konfrontation) berdewam bikin, da şidet cîhê xwe ji peywendî û guftûgoyan re berde. Weke ku niha li gelek deverên cîhanê dibe.

Bengt HURTIG:	(v)
MEP, ordf. SSKT	
Karl-Goran BIORMARK:	(fp)
Ulf BJORKLUND:	(kds)
Kristina SVENSSON:	(s)
Anders SVERD:	(c)
Ragnhild FOHANKA:	(mp)

DAGENS NYHETER
(Rojnameya swêdî)
17.2.1995

Wergera ji swêdî: **Şefik Kaya**



Sebri Botanî

Romana The Diplomat

Romana The Diplomat ya nivîskarê Îngilîzî, James Aldridge dirêjtirîn û girîngtirîn roman e ku bi zimanê kurdî û ji zimanekî biyanî hatibe wergerandin û gihîstibe pirtûkxaneya kurdî. Cîhana vê romanê cîhaneke berfireh û pirralî ye, xwendevan hez dike her bixwîne. Herweha romana ku bêtir babet jî li ser kurdan û welatê kurdan tê de hebin, her dîsan ev roman bi xwe ye.

Nivîskar Selah Sadulla ew ji îngilîzî wergerandiye kurdî. Ev karê Selah nîşana dewlemendî û şiyana zimanê kurdî ye û dihêle xwendevan hîzir bike ku kekê me Selah gencîneyeke peyvîn kurdî heye. Wî gelek peyv ji zaravayê zimanê kurdî di wergernadina vê romanê de bi kar anîne. Selah ev romana hêja bi alfabeşa kurdî ya latînî nivîsi bû, lê mixabin paşê neçar bû di sala 1984'an bi tîpên erebî çap kir, hêvidar im bibînim ku kurebavek dîsan bi tîpên latînî bide çapkîrin. Romana bi kurdî 735 rûpel in û 49 pişk in.

Kêmasiya mezintir di kurdîya vê romanê de ew e ku Selah peyv bi peyv wergerandiye. Xwezî wî çavek pê ve bixîşanda û zimanê wê jî xweştir û rasttir bikira...

Roman wisa dest pê dike:

Lord Esêkis di balafira "duklaş" de rûnişt û qalûna xwe kêşa û li hêviya guhastinê ma. Balafirê bi kotekî di tariyê

de daynebû xwarê, piştî ketî nav barovek befrê de, makîna wê qerisî. Noke ew li ser tenîştê bû, li nav zeviyek rosî, rût û spî de. Êdî bi befr û bayê hatibû şuştun. Lord Esêkis ji pencereya biçûk berê xwe dida tariya befirbarî û ketibû di keseran de çunkî ne gencit bû da ku bişêt digel Makgirîgor û balafirvanê rosî biçit gundekî da veguhêzekî jê bînin. Li pêncî û heştê Esêkis bo her tiştî pîr bû...

.... Ez nizanim bo çi te hind divêt biçî xwarê bo Bijarê, Makgirîgor got. Ew ne Azerbeycan e. Bijar li parêzgeha Erdelanê ye, ew kurd e. Ma em ne ji xwe ve her xemdarên Azerbeycanê ne.

- Hema tu bizavê dikî da min ji rê bibî der, Esêkis bi xweşî got.

- Egerek gelek xumalî heye bo çûna min, ez dizanim Bijar kurd e. Hêvî dikim dûrtir biçim Kurdistanê, ta bajarê Sine.

Makgirîgor dît Esêkis hêj noke erdnîgarîya welatî ji ber kiribû. Eşkere bû ku wî gelek xwe berdabû di nav vê perçeya taybetiya rîkê de.

- Ma ew hind girîng e? Makgirîgor dîsan got. Ma em neşen wê perçeya cîhanê bihelin û bizîvirin bakur?

- Carna tu min diguhişînî, Makgirîgor.

Esêkis alîkariya Katrînê kir da ji teqnê derbas bibe û guh neda cotyarên gumanadar, yên ku zêrevanî li wan dikirin.

- Me gelek caran ev berhevda, diyar e tu girîngiya vê parçeya cîhanê bo împaratoriye tênagehî.

- Ma tu li ser Azerbeycanê an Kurdistanê diaxivî?

- Li ser herduwan. Vê gavê ez hizra Kurdistanê dikim. Bijar û Sine herdu li Erdelanê ne, ya ku rast li ber sînorê Iraqê ye, ne we ye?

- Erê.

- Ü me gelek kurd li Iraqê hene, me nîn in? Makgirîgor got, wî ew dizanî.

- Rastî kurd li hemî deverên der û berên Mûsilê dijîn, Esêkis pê ve çû. Dera ku me hindek ji zeviyê mezintirêneftê li Iraqê hene û ciyên dî yên vejîyanî û pêgehînan.


- Ez wê dizanim, Makgirîgor dîsan got. Tu çend xeman ji wê neftê dixwî!

- Qenc e, nexus vêca ecêbgirî dimînî ku min wec bi Erdelanê an Kurdistanê an te çi bivêt tu bêjî, hebit? Ev kurd çi bikin li vê parçeya cîhanê dê vînek êkserî li ser kurdên me li Iraqê hebit. Wek dî ji rast e, bawer e. Me sînorek dost divêt li vî rexê Kurdistanâ me, sînorê wî xelkê ku rosan ew negirtine. Bo ku em hemiyê bizanin, ma çiye rosan bizavek Kurdistanî, serbixoyî dest pê kiri-bin, ku ji kurdên me yên Iraqê bigrit.

- Her gav bizav bo Kurdistanêke serbixe we hebû...

* * *

Her wisa ev diyaloga Esêkis û Makgirîgor ya li ser kurd û Kurdistanê dom dike.



BILA ZULMA TE ZÊDE BIBE

Yaşar Kemal

“... Di gel vê yekê, di ciyê ku ewê Kurdîtiyek bi serê xwe bê fikirîn, li gor Qanûna me ya Bingehîn, ji xwe ewê muxtarîyetên herêmî bêن avakirin. Wê gavê gelê kîjan herêmê Kurd be ewê xwe bi xwe bi muxtarî idare bikin. Ji bilî vê yekê gava ku gelê Tirkîyê bibe mijar, divê mirov wan jî pê re bîne ziman. Gava ku bi vê yekîtiyê re nehatin ziman, ji viya meselên ku wan girê didin anîna holê hergav mumkun e.”

GAZÎ MUSTEFA KEMAL

(Ji civîna çapemeniyê ya ku di 1923'an de li Îzmitê kirye)

‘Bila zulma te zêde bibe ku zû dawiya te bê.’ Li Enedolê ji bo zaliman weha dibêjin. Di dîrokê de belkî cara yekemîn navê sedsalekê beriya ku dest pê

bike hat danîn. Navê sedsala bîst û yeke-mîn, ‘Sedsala Mafêni Mirovi’ ye. Ev tê wê manê ku ewê şerên mafêni mirovi yêne mezin di vê sedsalê de bênen dayin. Çimkî sedsala me di pirsa mafêni mirovi de riya ku pêwist bû nesitand... Di dema ku emê bi-kevin sedsala bîst û yekemîn de ji, di mer-hela ku em bi mafêni mirovi gihîştinê de, ji bo ku em li paş ve vegeerin gelek elamet hene. Medya û ragihandina îroyîn, mirov-bûna mirovatiyê bêhed û bêhejmar qels dike. Berevajiyê tiştê ku tê gotin û xwestin, kesan ji kesîtiyê derdixin û dîkin kerî. Di dawiya vê sedsalê de, dê mirovati beşike mezin ji hêza xwe ya afirenêr hunda bike. Çimkî ferdê ku her roj ji kesîtiya wî tê kuştin û ji afirenêriyê tê dûrketin, bûye we-kî kerî û ew ev mirov e ku hemû mafêni mirovi jê hatine sitandin. Ji ber vê yekê di dema ku em dikevin sedsala bîst û yekemîn de, ji bo ku kurê mirov li ser lingên xwe raweste, divê şerên mezin bike. Ji ber vê ye-kê ye ku ji niha ve ji sedsala bîst û yekemîn re sedsala mafêni mirovi hatiye gotin.


Bi vî awayî xelq diçe aş em diçin kaş. Sê-sed sal e me hergav weha kiriye û em keti-ne vê rewşê. İro ji em dîkin li pêş mirovatiyê rûmet û xîreta xwe bînin ser sifirê.

Komara Tirkîyê ji roja ku ava bûye heta iro, bûye sazûmana zîlim û tadahiyênerî giran. Van kîrinêni xwe ji bi durûtiya rojhîlatiyê ji çavêni mirovatiyê veşartîye. Komara Tirkîyê, li hember gelên Enedolê hezar carî ji Osmaniyan zalîmtir bûye. Dibe ku hûn van gotinêni min mezinkirî bibînin. Heta sala 1946'an, ya rast heta sala ku Partiya Demokrat hat ser hukum, tu gundiyeckî; ji

heftan heta hefteyan, ji keçan bigire jinan, tu kesî ku lêxistina cendirman nexwaribe ûzîlim nedîtibe; dixwazî bila Kurd, Tirk an Laz be kes tune. Karbidestîya Komarê we-kî bagerekî jehrîkir di ser Enedolê re derbas bûye. Ew kesen ku ewê ji bo van gotinêni min bibêjin ne rast in, an tiştêni ku Enedolê kişandine nizanîn an ji li nav çavêni mirovatiyê dînihîrin û derew dîkin.

Heftê sal e çawa gelên Tirkîyê li ber ev-qas zîlim, şikence, tunehî û birçîtiyê di ber xwe dan? Ha ev mûcîzeyek e. Dîsa gotinek Enedolê heye: ‘Tiştêni ku mirov xwe didin ber, çiya nikarin xwe bidin ber.’ Li welatekî ku li kîleka Ewrûpa ye karbidestîyeke weha tadakar domandin qet ji karekî wusa hêsan nîne. Ev ji mûcîzeyek mirovatiyê ye! Ha vê mûcîza mirovatiyê ji hukumdariyê me û hem ji dewleta me afirandiye. Lê em buha-yê vê yekê giran didin. Ji mirovatiyê dûr xistin ûbi xîreta xwe ya mirovatiyê hunda-kîrinê. Gelo qet tu sûcek gelên me di vê ye-kê de tune? Ma çawa tune! Gelên ku kesîti ûmîrovatiya wan ji wan hatine sitandin; hezar sal e tada dîtine, di bin lingan de hatine pelçiqandin, hezar sal e di bin zilmê de jiyane, birçî mane, hezar sal e ew ji vî şerî şandine wî şerî, ma dikaribûn hêza hilms-tandinê di bin tada nemirovi ya Komarê de bi xwe re bidîtana? Divê em ji bîr nekin ku bi sedan Kuyucu Murat Paşa di ser van erdan re derbas bûne. Her Kuyucu Murat Paşayek bûne deh Cengizhan.

Di sala 1946'an de jiyana pirrpartîti dest pê kiriye; di sala 1950'an de Partiya Demokrat karibdestiyê ji destê Partiya Gel a zordar sitandiye. Van gelên ku evqas tada



dîtine, evqas mirovatiya wan ji destê wan hatiye sitandin, ha mûcîza rastîn a ku afîrandine û divê mirov jê re hurmet nîşan bide ev e. Hê tu kesî heta niha aqil negihan-diye vê yekê. Damezrenêrên Partiya Demokrat, karbidestêن herî jorîn ên Partiya gel bûn. Peyva demokrasiyê ji bo wan, perdeyek reş a ku divê mirov xwe di pişt de veşêre ye. Tirkîye bi vê virr ûderewa demokrasiyê karibiye bikeve Nato û Konseya Ewrûpayê. Ewrûpa, ango dinya bi vê dere-wê dixape, ma qet tê xapandin! Lê belê demokrasiya rojava jî ne demokrasiyek li gor çaxê ye; divê ku ew jî li hember Yekîtiya Sovyetê hêzekê çêbike, ji ber vê yekê jî bi dîtin û bi hay bi Tirkîye xapiya ye.

Di pey re çi bûye? Piştî vê yekê jî berjewendiyêñ hukumdariyêñ weletêñ rojava ser sazûmana tadakar a Tirkîye nixamtine.

Tam di vê demê de bûyerek ku qet nehatiye fikirîn çêbûye: Di wexta ku gelê Tirk di bin vê zilma heftê salî de di xew re çûye, gelê Kurd, bi tirs û bi fikare be jî dest bi berxwedanê kiriye. Çimkî di vê pêvajoya tadayê ya heftê salan de, yê ku herî pirr tada dîtine, birçî mane, di nav belengazîyê de pelçiqîne, qirkiranın jiyane, yên ku zi-manê wan jî bi qanûnan hatiye qedexekirin, heftê sal nasnameya wan hatiye redkirin û bi Tirkêن Çiyayîtî hatine binavkirin, yên ku li ber jî zilmân ji bo xwe zilmê bi ecibîne hatine hêştin, yên ku ji her pênc, deh salan carekê bêrawest li çar aliyêñ Ene-dolê dihatin surgûnkirin, di gel vê yekê, ji xwe hindiktir be jî bi gelê Tirkê ku zilmê didit re, dîsa jî yê ku bû yet gelê Kurd bû.

Berxwedana Kurdan a dawî ya ku piştî sala 1975'an dest pêkir, çiqas çû bi xwe ve hat. Bêtir pêş ve çû û zivirî şerê çekdarî. Ha karê esasî piştî vê yekê dest pê kir. Çerxa zilmê ya heftê salan, wî ruyê xwe yê cirnexwêş bi tevahî nîşan da. Berê lê xebitî ku gelê Tirk bê xapandin. Propagandayek bi ecêv dan destpêkirin. Heta ku gelê Tirk nehata xapandin berxwedana gelê Kurd ni-karibû bihata şikandin. Piştî wê yekê makîna derewan xebitî. Ev Kurd hene! Ji bo parvekitina welat dixebeitîn. Dê Tirkîye parve bikirana û ji xwe re welatekî azad ava bikirana. Ev yek wusa bi şewat anîn ziman ku, zilma Kurdan a li ser Tirkân, merasîmîn mirinê yêñ leşkerêñ Tirk ên ku bi gerîla re şer dikirin wusa mezin kirin ku, he-ma hema Tirkê ku li kuderê Kurdekî bibî-ne, bike ku wî li wê derê bikuje. Bereket be ku, Kurd û Tirkân bi sedan salî bû ewqas

baş hevdû nasdikirin ku, hemû hewldanê dewletê çawa be ew nekirin dijmin. Biratiya van herdû gelan, ev biratî, biratiya ku karbidestan digot nîne; biratiya rastîn a du gelên ku keda wan hatiye xwarin, hatine pelçiqandin û zilim dîtine ye. Li Tirkiyê ji şerê nav xwe re ev yek bû asteng.

Ji du peyvên serokkomar Demirel û karbidesten din yek jê, "Em ji axa xwe xîçikek kevir, çenek xwelî nadin tu kesî" bû. Xîçikek kevir, xîçikek kevir, xîçikek kevir...Peyva wan bû xîçikek kevir. Çenek xwelî...Peyva wan bû çenek xwelî.

Kê xîçikek kevir dixwest? Kê çenek xwelî dixwest, tu kesî li viya nedipirsî. Tiştê ku ez dizanim yê ku xîçikê kevir dixwaze, yê ku çenek xwelî dixwaze an jî yên ku dewletek Kurdî ya serbixwe dixwazin gelek hindik Kurd in li Tirkiyê. Ku bixwestana dê çi bibûya, ma ne mafê wan bû? Çimkî di hemû danezanêner gerdûnî yên mafê mirovî de, her neteweya ku biwxaze xwedî mafê pêşeroja xwe bi destê xwe beyankirinê bû. Bi qasî ku ez dizanim Kurdan nedixwestin ku vî mafê xwe bi kar bînin. Di dema ku Yekîtiya Ewrûpayê damezirî bû de, di dema ku Ewrûpa bi xwe jî ramana di binê alekê de jiyanê dianî holê, dê çima Kurdan welatê xwe yê bi hezaran salî parve bikirana, dê ev bi kérî kêbihata?

Niha li Tirkiyê şerê herî adî yê dinyayê tê kirin. Hûnê bibêjin, "Ma şerên ne adî ji hene." Li gor min nabe ya, van rojan şerê dewleta Tirk a bi gelê Kurd re şerê herî adî, herî qirêjî û herî pîs ê dinyayê ye. Ezê izaha adîbûna vî şerî bikim, eger hêza min têr bike. Hêza romannivîs û sînemakarên

herî mezin ên dinyayê têr nake ku şerekî bi vî awayî izah bikin. Ezê wusa di ser de dest biavêjim vî şerî. Gerîla úordiya Tirk dest bi şer kirin. Ev tiştek gelek xerab bû. Ci dibû bila bibûya, divîyabû ku pirsa Kurdî bi aştiyê bihata çareserkirin. Zimanê Kurdî heftê sal bû qedexe bû ya, di van salên davî de azadiyek hindik ji vî zimanî re hatibû dayin. Sitranên xwe dikirin plak ya, çawa derdiketin pê re dicivandin. Bi Kurdî çûna dibistanê, nivîs nivîsin, kitêb derxistin, rojname derxistin, radyo û televizyon avakirin qedexe bû. Kurdên ku li Tirkiyê di ser panzdeh milyonî de bûn ji hemû mafê xwe bêpar bûn. Lê Kurd li Tirkiyê dibûn serokkomar, serokwezîr û qumanadarên rutbebilind; lê bi şertekî ku Kurdbûna xwe red bikin. Tevahiya Kurdên ku ji dewleta Tirk re bûbûn karbidest Kurdîtiya xwe red dikirin. Li tu derekê nikaribûn bigotana ku em Tirkên Çiyayî ne jî. Yên ku Tirkên Çiyayî bûn ew bûn. Ew bi zimanekî xerîb ê ji Tirkî xerabûyi yê ji sêsed gotinî pêkhatî dipeyivîn. Zimanê wan zimanê çivîkek xerab, ango tiştekî wekî zimanê qijikê bû. Di pey de vî zimanê ku ji zimanê qijikê xerabtir bû jî ji Kurdan re qedexe kirin. Ez bawer im viya sînorêne sebrê derbas kir. Ühinek xortên xwenda û çûbûn unîversetê jî derketin şerî çiya. Deh sal e li serê çiyan in. Yên li serê çiya û ordiya Tirk şerekî dijwar dikin. Tiştê herî pîs ê kar, Komara Tirkiyê ji bo ku şerê xwe yê bi gerîla re zû bibe şerî "Sazûmana Gundparêziyê" ava kir. Ordoya Amerîka ya li Viet-namê gundparêziyê icat kiribû. Dewleta Tirk Ji gundparêzan ji 50 000 kesî zêdetir

ordiyek, angó komek mîlîsan ava kir. Bi ser de jî tîmek taybetî yê ji 12 000 kesî pêkhatî ava kir. Bi ser de jî li gor ku rojname dînivîsin, Tirkîyê ordiyek xwe ya ji 300 000 kesî pêkhatî şand ser Kurdan. Hê gelek tiş-tên ku nayêن zanîn hene ya, tişê herî xerab qontrgerîlayê ku di bin emrê ordiya Tirkan de ye. Li gor ku dibêjin ev qontrgerîla jî icada Amerîka an jî Natoyê ye.

Gerîlayê li serê çiya dest pê kirin gundparêzan kuştin, gundparêzan jî gerîla kuştin. Li gor ku dibêjin û dînivîsin gerîla digirin ser gund û malen gundparêzan, nedigotin jin an zarûk e gundparêzan gulebaran diki-rin. Gundparêz, ordû ûqontrgerîlayê Tirk jî digitin ser malen Kurden ku bi 'Welat-parêzi' dihatin naskirin û malbaten gerîlayan dikuştin. Gerîla dikuje davêje ser dewletê, dewlet dikuje davêje ser gerîla. Piş re generalek derket û peyvîn bi vî awayî got," Bila destûr bidin min, ezê li Rojhîlatê Ene-dolê kevir li ser kevirî, serî li ser laşî nehêlim." Ez tişten weha pîs jiber nakim, lê ji bîra min jî dernakevin. An jî " Ezê nehêlim ku li vî çiyayê Cudî giya şîn bibin. Ango ezê bikim ku li van çiya, kevir, berrî û newelan giya şîn nebin." Di pey re jî Serokê Serperiştiya Giştî yê Leşkerî Dogan Gureş got; " Ji bo ku mirov masiyan bigire divê mirov avê zûwa bike." Piş re jî Serok-wezîra jin Tansû Çiller di parlementoyê de weha qîriya," An wê biqedê û an jî wê biqedê" Di pey re ev peyv di devê xwe de kir benîst; li her bajêr û navçeya ku çûyê û di her civîna çapameniyê de got. Lê li dînyayê tu kesî ku bi yê ku ev pey gotibû nizanibû nemabû. Belkî jî bi têgiha " An wê biqedê

û an jî wê biqedê" herî baş netewa Alman dizanibû. Di gel ku dizanibû jî qet deng ji xwe dernexist.

Di pey re şerê bi tevahî bi hemû dijwariya xwe dest pê kir. Di serî de ordiya Tirk bi masûmî dilebitî, bi tenê bi hemwelati-yêh xwe yên hêja, bi birayêن xwe yên Kurd, bi şkence gû dida xwarin û ew biçûk dikirin. Konseya Ewrûpa jî ji bo vê şkence-ya gû Tirkîyê bi çar milyonî mehkûm kir. Mehkûmiyetek xerab nîne. şest milyon dolar deynê Tirkîyê heye. Dê şest milyon dolarê din deyn bike, eger canê wê bixwaze ewê bi hemû gelê Kurd û Tirk şkence gû bike.

Piş re Komara Tirkîyê rabû ku ji heftan heta hefteyan hemû Kurdan bike gundparêz. Bi yên ku gundparêziyê nexwestin iş-kence kir, bi yên ku bi wan re derneket serî jî girt bin çavan û da kuştin. Di pey re jî cînayetên qontrgerîlayen qisasnediyar(ya rast qisasdiyar) dest pê kirin. Hinek 1800 kes, hinek jî 1200 kes dibêjin, mirovîn Kurdan ên bijare ûhatine bijartin kuştin. Piş re jî, hinek 2000, hinek jî 1500 dibêjin, gundêñ Kurdan şewitandin. Ji hundirê hin malan mirovîn şewitandî, heywanêñ şewitandî derxistin. Di şerê bi tevahî de, bi usûla Kuyucu Murat Paşa, sûcêñ qirkirin ûşkenceyêñ ku kurê mirov heta niha kêm caran dîtibû hatin kirin. General gotibû çî? Gotibû:" Ji bo ku mirov masî bigire divê mirov avê zûwa bike." Komara Tirkîyê hemû tiştî dabû ber çavê xwe, avê zûwa dikir lê nikaribû masî bigirta. Çawa ku li Vietnamê Amerîka nikaribû masî bigirta. Lê li Vietnamê Amerîka avê zûwa kiribû, erdê


Vietnamê kiribû ku giya li serê şîn nebe.

Komara Tirkiyê, di vî şerê bi tevahî de kar anî wê rewşê ku, Ji Başûrê Rojhilatê Enedolê, li gor hin gotinan du milyon û nîv(2.5), li gor hin gotinan jî sê milyon(3) kes surgûnî hundirê Enedolê kir. Surgûnên dewletê dikarin jî sê milyonî jî derbas bibin. Çimkî nifûsa bajarê Diyarbekir ji 450 hezarî derket milyon û nîv(1.5 milyonî). Ev rastiyek e. Hûn bi xwe rabin hejmarâ surgûnên ku xwe avêtine bajarên din bihesibînin... Ev tî, birçî û bêkar in û li ciyêن ku diçinê bêwar û bêmal in. Èêêêh, ji xwe ev bi kevneşopa Komara Tirkiyê ya Kuyucu Murat Paşa dikeve. Lê belê Kuyucu Murat Paşayan, hemû zalimên din û xwînxwaran, her tiştî kirin, lê tiştîkî nekirin, an jî nikaribûn bikin: Ew jî, negotin ku em gerîla, mirovên ku xwe veşartine, eşqiya, firar, firarêñ leşkeriyê; yên ku xwe di daristanê de veşartine bi daristanê re biş-

witînin û daristanêñ welat neşewitandin. Lê Komara Tirkiyê ev sûc, ango ev sûcê mezin ê mirovatiyê yê ku nayê efûkirin kir.

Kurê mirov, eger ku bi tevahî bêbav(de-jenere) nebûbe, li van tiştên ku min nivîsîne bikolin, ku çend çaran girantirê vana jî nebînin, ez ji her cezayî re, ji kişandina cezayê herî giran ê ku Komara Tirkiyê jî ji bo min layiq bibîne re razî me.

Di van deh salêñ dawî de, gava ku ev tiştî dianîn serê gelê herî mezin ê duwemîn ê welatê me me nivîskaran çi kir? Emê çi bikin, me çavêñ xwe girt û li ser derd û kulan vexwar. Ji derd û kulan vexwarin jî tiştîkî e, em bi rihetî razan... Ka dê me çi bikira. Ji xwe ve em nivîskarêñ Tirk ji nijadek nivîskarêñ mîrxas dihatin. Em jî nifşê Nazim Hikmet dihatin. Ew Nazim Hikmet ku ji bo azadiya gelê xwe 17 sal di girtîgehê de mabû. Pişt re çûbû li Moskovayê miribû.



Karbîdestêñ demkoratîk ên Tirkîyê yên xoşewîsta Konseya Ewrûpa ya îroyîn, heta destûr nadin ku hestiyê vî helbestvanê dinê yên ku Tirkîyê gihandîye jî bînin wela. Em ji nifşê Sebahettin Ali dihatin. Romançnivîsê mezîn ê ku dewletê dabû kuştin û meytê wî jî avêtibû sînorê Bulgarîstanê. Em ji nifşê Orhan Kemal û Ahmet Arif dihatin. Ew yên ku bi salan di girtîgehan de mabûn... Ji nifşê Hasan Îzettin Dînamo û Abidîn Dînolan... Ji nifşê beriya me nivîskarêñ ku neketibûn girtîgehê pîrr hindik bûn. şkence û zilman em kerixan-dibûn, çavê me tîrsandibûn.

Lê çapamenî? Ketiye bin emrê deweletê, ji Rojhîlatê Enedolê, ji hejmara gerîlayen ku dihatin kuştin zêdetir tu nûçeyekê nedidan. Ketina bin emrê deweletê ya çapameniyê jî ji alî hemû kesî ve hat dîtin ya. Sultanê Misirê yên kerr jî ev bîhîst ya.

Wekı ku min hergav nivîsi ya, bi qasî ku zimanê min geriya min li her derê got ya, vê demê, neteweke ku li ciyê ku Tirkîye gîhîştiyê ye û hatiye ber pêpelûka medeni-yetê, bi demokrasiyê idarekîrin, bîxîreti-ya karbîdestêñ wê netew ûwela. Rojekê ew kesên bîxîret, ewê nav bi nav li rûpelên bêxîretiyê yên dîroka vî wela bîn nivîsin. Ü gelên Tirkîyê ew gel in ku li biratî û demokrasiyê tî bûne. Tirkîyê bi demokrasi-ye rastîn idarekîrin ne karek ewqas dijwar e.

Diviyabû ku ji bo sekinandina vî şerê bêkeys, qirêjî üpîs, berê me nivîskaran alî-kariya gelên xwe bikira. Pişt re çapameniya me ya ku ziman, çav û gohê gelan e, di pey re televizyonêñ me, di pey re jî kesên me

yên ku ketine politîkayê. Tu kesî ji me ji welatê xwe re alîkarî nekir. Ü em li hember vê sazûman zilmê ya bêûdan derneketin. Me nekir ku mirovatî, dinya û gelên dinya-yê ji vê yekê re bibin alîkar. Me kir ku weletê me wek wela teki neletlêkirî bikeve sed-sala bîst û yekemîn. Me kir ku mirovîn welatê me nikaribin li rûyê mirovatiyê bî-nihîrin. Ji niha ve mirovatiyê dest bi mu-naqşê kir, kuştina bi sedan mirovîn bijare yên gelekî jenosid e an ne jenosid e.

Qampêñ civandinê jî hatin avakirin. Ci-yê wan û çend kes tê de hatin civandin jî eşkera ye. Piştî van qampêñ civandinê jî kî dizane ewê ci bê. Gava ku min vê nivîseñ di-nivîsi, di rojnameyêñ me de nûçeyek der-ke, ez nizanim çawa bû ku ev nûçe nivîsin, li Wanê işaretên sor datînin ser hinek ma-lan.

Nêzikî du hezarî gund şewitandin. Di dora sê milyonî de mirov ji cih û warêñ wan kirin û ew mehkûmî birçîbûn, xizanî ûmirinê kirin. 1800 cînayetên qisasdiyar hene. Daristan hatin şewitandin. Ewê hê ci û ci bibin. Bi sedan hunda hene.

Heta ku pirsa Kurdi bi riyên aştiyane neyê çareserkîrin Tirkîye nikare bigîhiye demokrasiyê. Em vê yekê bi tevê dinyayê re bi vî awayâ bizanibin. Li wela teki ku ji 15 milyonî zêdetir xelqek ji hemû mafêñ mirovî bêpar bin, li wela teki weha herfa demokrasiyê ya D'yê bilêvkîrin, mirovatiyê adî dîtin nîne ci ye.

Yek jî bûyera şewitandina gundêñ Dêrsimê ye. Mirov lê şas dimîne. Çawa bû ku rojnameyêñ me vê bûyera dilgêş nivîsin. Li kîjan ciyayî gur miriye ku haya me jê çêne-

bûye. Pişt re serokwezîr, di destekî wê de al, di destekî wê de ji Quran ûecêbmayî "Ma qet hêzên dewletê gund û daristanan dişewitînin" got. Haaa we got ew helîqopter, ew, PKK'ê ew ji Ermenîstan, Afganîstan û Pakîstanê sitandine. Yênu ku gund û bajaran dişewitînin ew in. Dêrsim dişewite, daristanêni Kutuderesi dişewitin, PPK ji xwe kerixiye xwe bi xwe dişewitîne. Ji Kurdan kerixiye Kurdan bi tevayî dişewitîne. Ma di Newrozê de ji heştê kesî zêdetir Kurdi jinezarû PKK'ê neşewitand? Ma bajarê şinexê, Licê, bajarêni din û navçeyan PKK'ê neşewitandin? Ma li Sêwasê 37 hûnermendî PKK'ê neşewitand?

Êdî bes e, li vê dinyayê jiyan karekî bi xîret e. Mirov bibêje qey ku ewê derewkariya derewkeran heta bi hetayê veşertî bimîne, tê wê manê ku haya mirov qet ji vê dinyayê tune.

Heta ku ez vê çiroka waliyê Entabê ji nenivîsim ezê nikaribim rawestim. Wali nûçeya şewitandina deristanêni İslahiyê distîne, ji Entabê lê dixe û diçe navçeya İslahiyê. Diçe û rastî çi bê baş e, dinihêre ku daristan ji serî heta binî hatiye şewitandin. Hatiye şewitandin lê bûyerek dilges jî çûbûye. Bi daristanê re 11 gerîla ji şewitîne. Dudo ji kermêşan, yek ji me. Beyana waliyê berêz tam bi vî awayî ye. Yanê çi bûye, daristan şewitî be çi bûye, 11 gerîla şewitîn ya... Dîsa ji wekî ku rojnamevanekî nivîsiye di nav deh salan de li tevahiyê Tirkîyê du milyon hektar daristan şewitîne. Li Rojhîlatê Enedolê ji deh milyon hektar. Xêr û guneh di sitûyê yê ku nivîsiye de be. Ev tiştek wusa ye ku jê nayê bawerkirin ya, ma

dewletek, ji bo ku gerîla xwe tê de veneşêrin daristanan, yanê qet welatê xwe dişewitîne? Ev yê ku tê şewitandin ne bi tenê erd û welatê Tirkîyê yê, erdê mirovatiyê ye ji. Neteweyêni Yekbûyi, ku bi rastî ji Neteweyêni Yekbûyi be bila lêkolînekê bide çêkirin. Ka ev bûyera ecêb, ka ev súcê mirovatiyê rast e an derew e? Ew Konseya Ewrûpa ya piir demokrat ji, Yekîtiya Ewrûpa ji... Ma Civata Ewrûpa dikare xwe bide ber lêkolîneke weha, ma dikare heyetek lêkolînê ya weha damezirîne? Ma heyetek lêkolînê ya weha, bi behana hûn têkilî nav karêne yên hundir dibin, dê ji ber derê Enquerê neyê zivirandin, Konseya Ewrûpa bi gelek ceribandinê xwe bi vê yekê nizane? Ma mûyên Konseya Ewrûpa li ber tiştên weha dilivin, ji bo erdêne xwe, ji bo daristanêni xwe yên ku diqedin, ji bo avêni xwe yên ku wekî jehrê diherikin ci dike ku, ji bo Tirkîye ya ku bi mirovên xwe re tê şewitandin ci bike?

Yênu ku her roj daristanêni wekî sitargeha gerîla dibînin dişewitînin, ew gerîlayê ku her roj di rojnameyan de nûçeha kuştina bi dehan kesî ji wan derdikeve, wan gerîlayan şerrawestandinek çend mehî ilan kirin. Komara Tirkîyê bersîv neda vê yekê. Di rojekê de, di navbera riya du bajarî de 33 leşkeren bêçek hatin kuştin. Hinekan got, yên ku leşkeran kuşt PKK'ye. Hinekan ji got na. Vê bûyera ecêb jî hêjayî lêkolînê ye. Li ser vê yekê ji şerrawestandina yekalî xerabû. Niha şerê dijwar dom dike. Lê ne bi tenê di nav gerîla, ordû, gundaparêz û tîmêne taybetî de. Dewleta Tirk, li hember gelê Kurd ê tî û birçî, ji xizaniyê

nivmirî, surgûn bûyî, çadirekî ku serê xwe têxê, ber sîvînekekê ku lê bise tune, mecbûrê koçeriyê hatiye kirin, bêçek, destvala û kêrikek di dest de tune re şer ûlan kiriye. Li vê Tirkiyê koçkirin heye û encama bi milyonan mirovî ne melûm e.

Yek jî, yên ku ji Rojhilatê Enedolê bûn partiyekê ava kirin. Nêzikî bîst mebûsî kirin parlementoyê. Ev partî hat girtin. Wan partiyek din ava kirin. Partiya nû jî hat girtin. Pênc mebûsên vê partiyê kirin gîrtîgehê û bi cezayê idamê dest bi mehkûmkirina wan kirin. Pênc mebûsên meznûn jî re-viyan Ewrûpa. Pişti vê yekê bû ku Ewrûpaya pirr demokrat piçekî şiyar bû. Konseya Ewrûpa dest avêt kar. Hinek tiştên Tirkiyê da sekinandin. Tirkîye gelek li vê yekê acis bû. Lê ji xwe Tirkîye bi çekên ku hevparê Konseya Ewrûpa dane, Rojhilatê Enedolê dişewitîne, gundan bi erdê re dike yek, mirovan ji erdê wan dide koçkirin, di ciyên ku derbas dibe re giya şîn nabin, hemû avan dibire, lê dîsa jî nikare ewqas pirr masî bigire. Masî direviyan kaniyên Çiya-yê Cûdî, Çiyayê Agîrî, Çiyayê Nemrûd, ciyayên din û avên Dîcle û Firatê.

Divê êdî ku ev şerê dijwar neajo. Tirkîye bi aboriya xwe dipelişe. Gelên Tirkiyê di nav xizaniyê de ne. Ji şerê li Rojhilatê Enedolê re bi tenê îsal ewê 425(çarsed û bîstê pênc) tiroylon lîrayê Tirk bê zihêkirin. Wezîrekî ku di hukûmatê de berpirsiyar e ev yek got. Tirkîye li ber hilweşînê ye. Deynîn derve û hundir çiqas diçe zêdetir dibin. Ku hê jî ev şer biajo dê ji belayan bella bênen serê me. Ewê felaketa dîrokê ya herî mezin were serê Tirkiyê.

Ez dikim nakim tu sedemekî domandina vî şerî nabînim. Hûn çiqas dibêjin bibêjin ewê tu kesekî xwedî aqil ûhişliser ê vê dînyayê fêm neke. Ci heye li holê? Nete-wek mafêni mirovî dixwaze. Hûn dixwazin grûbek etník bibêjin, ji bo ku ev mirov ma-fêni xwe bistînin, derdi Kevin serê ciyê jî. Üşerekî xwîndar dom dike. Ü ronakbîrên Tirkiyê û dînyayê, piraniya rojnamevanan û nivîskaran, ango újdana mirovatiyê te-maşevanê vî şerî ye. Ji tu derekê deng û sewtek dernakeve. Tu dibêjî qey xweliya miriyan avêtine ser mirovatiyê. Ger ku ev şer bi vî awayî here, ewê Tirkîye û mirovatî birînên mezin bistîne. Çimkî újdana mirov ji zilmên weha re, di dîroka xwe de çiqas îş-kence û zilim dîtibe jî, ji niha pê ve êdî di ber xwe nade. Her şer(Dixwazî bila li Rû-andayê, dixwazî bila li Bosna-Hersekê, dixwazî bila li Vietnamê û dixwazî jî bila li Afganîstanê be) mirovatiyê qels û dejenerê dike. Her şer, her qirkirin; birçitî û xizanî mirovan ji mirovatiya xwe dûr dixin.


Komara Tirkiyê, gava ku ava bû diviya-bû hemû mafêni Kurdan bida. Hûnê bibê-jin, ka da gelê Tirk, rast e; lê qe nebe ziman-nê gelê Tirk ji destê wan nehat sitandin. Çimkî van herdû gelan şerê Rizgariyê bi hev re qezanc kirin. Gelê Kurd ku di wan rojan de bixwesta, an jî alî gelê Tirk neki-ra, bi hêsanî dikaribû mafê pêşeroja(qede-ra) xwe tayinkirnê bi xwe bi dest bixista. Di van rojîn ku em gîhîstinê de, bêyî ku gelê Kurd mafêni xwe bixwesta, hinek ma-fêni bingehîn, qe nebe bi qasî ku dane gelê Tirk, diviyabû ku ji ber xwe jî bo gelê Kurd jî bihatana dayin. Çimkî di dema ku

em dikevin sedsala bîst ûyekemîn, Sed sala Mafêni Mirovî de, tu netewek, tu grûbek etnîk nikare ji mafêni mirovî bêpar bê hêştin. Ji vê yekê re jî ne hêza Komara Tirkîyê, hêza tu welatekî têr nake. Tu car em vê yekê ji bîr nekin, yê ku Amerîka ji Vietnamê ajot derve, yê ku Sovyetê ji Afganîstanê kir û bi pey ket, yê ku mûcîza Afrîqa Başûr asirandin hêza mirovatiyê ya ku bi gelên wan welatan re şer dikir bû.

Komara Tirkîyê bi domandina vî şerî, nikare wek welatekî naletlêkirî bikeve sedsala bîst û yekemîn. Ez wusa texmîn dikim ku dê Tirkîye destûr nede wan karbidestênen nexwêş, yên ku bi qasî ku ava welatê xwe zûwa bikin mirovatiyê ji bîr kirine, daristanênen xwe jî şewitandine, welat kirine ciyê agir û welat kirine gola xwînê. Ji bo rawestina vî şerê nemirovî jî, dê ûjdana mirovatiyê ji gelên Tirkîyê re bibe alîkar; wusa kerr û lal nemîne. Dê ji hemû kesî bêtir ji gelên welatênen ku çek difiroşin Tirkîyê ji me re bibin alîkar.

Em Tirkîyeyî, qet lê hema qet vê yekê ji bîr nekin, gihîştina demokrasiyek rastîn, bi riya aştiyane, di çareserkirina pirsa Kurdî re derbas dibe.

Bi riya aştiyane çareserkirina pirsa Kurdî, dê derfetênen bêhejmar ji bo welatê me pêk bîne. Wekî ku ez hergav dinivîsim û dibêjîm, dinya baçeyek kulturê ya bi hezar kulîlkî ye. Heta dema emperyalîzmê hemû kulturênen dinyayê tesîr li ser hevdû nîşan dane û hev xwedî kirine. Ev tiştê ku ez dibêjîm iro ji alî hemû dinyayê ve tê peji randin. Tu zanyarek ku berevajiyê vî tiştî bibêje dernakeve. Ji vî hezar kulîlkî yek



hunda bibe, mirovatî rengekî xwe hunda dike. Sed rengên xwe hunda bike sed kûlîk...Hundakirina sed, pênsed rengên xwe dê ji bo mirovatiyê hundayek mezin be ya, ji wî mezintir jî netamandin û hevdû xwendînekirina kulturan, dê hinek jî bibe hilwesîna kultura mirovatiyê. Ev, iro di şîûra mirovatiya îroyîn tûrastiya zanistî de ye. Jî roja ku Komar ava bûye heta iro, xebata karbdestiya Tirkiyê ya kuştina ziman û kultura Kurdi súcekî mirovatiyê ye. Ewê di sedsala bîst û yekemîn de súcén mirovatiyê yek bi yek bêñ derxistin û mehkûmkirin. Ev ne derketina pêş hakim(qazî) û mehkûmbûn e. Ewê xîret û mirovatiya wenatekî bê mehkûmkirin. Îcar yê herî giran jî ji bo mirovatiyê dê ev ceza be.

Kulturek Kurdan a dewlemend heye. Warisê Kulturên Enedola Mezin in. Hels-bestvanên mezin, destanbêjên mezin gi-handine. Ji Ehmedê Xanî bigire heta Melayê Cizîrî û Evdalê Zeynikê. Niha êdî di nav du netewyan de destanên mezin dijîn. Ji bilî viya sitran û çînokên Qirgiz Û Kurdan, ji alî destanbêjên mezin ve ji nû ve têñ afirandin û gotin...Bi ya min ev, di vê demê de berhemên herî dewlemend ên gelên dinyayê ne ... Lê tejên wan.. Kulturek mezin a bi şexsiyet, ihtişama zimanekî ku pirr dewlemend bûye bi gotinê nayê salixdan. Îcar ku kultura Kurdi rastî ji holê rakirinê nehata, qenciya ku Mustefa Kemal Paşa bi kultura Tirkî re kir bi kultura Kurdi re jî bikira, niha rengê Enedolê bi awa-yek gelek cihê bû. Dê Nazim Hikmetek, Sait Faik, Orhan Veli, Orhan Kemal, ûyw(

û yên weha)... ji nav wan jî derketa. Nijadperestiya karbdestan, tênegîhîstina wan a kultura mirovatiyê, beşek ji dewlemendiya kultura Enedolê ya bi şexsiyet ji destê me sitand. Bêtir tiştên vî welatî, bêtirin tiştên vî welatî ji destê me sitandin. Eger em hesabê tiştê ku me hunda kirine em derxin, wê gavê emê fêm bikin tiştê ku me hunda kirine çiqas mezinin. Qene be ji vê demê bi şûn de em hişê xwe bidin serê xwe, hemû masfîn mirovî yên gerdûnî bidin Kurdan. Ku em nedin ewê parî bi derengî bîkeve, lê bi piştgiriya mirovatiyê jî ewê ma-fen xwe bi zorê bistînin. Di nêz de quman-derekî Başûrê Endolê weha digot," Sala pêşıya me, muhaqeq emê gerîla biqedî-nin."Ev pey deh sal e têñ gotin. Hemû avan zûwa kirin, lê masî çûbe kuderê, revî be kîjan avê nikaribû bihata girtin. Bi ser de jî dexmeyek mirovatiyê, hem jî dexme-yek reş di eniya wela-tê me dan. Em bibê-jin ku bi gotina general bû, gerîla qediya. Ma ewê di vê demê de panzdeh milyon gel, ewê dest û milên xwe girê bidin û bi awa-yê,"Bijî nijadperesti" biqîrin û ewê kurê mirov jî ji vê çepiklêxistinê re temâsevan bimîne! De herin ji wê derê hûn jî! Ez ji we re tiştekî bibêjim? Em baş hişê xwe bigirin serê xwe, ji iro pê ve ji bo wenatekî, hela wenatekî ku di rewşa Tirkiyê de ye an demokrasî, an jî... Devê min nagere ku ez bi-bêjim.

Wergera ji tirkî: **Felat Dilges**

BÊJINGA GÛMANAN

Ji bin simêñ rojê derket
Ket nav diranêñ şevê.
Tarî şikand,
Dûyê kuştaran lê der bû.
Xwe ji mirinê dizî,
Xwest carekê,
Li xemêñ xwe siwar be,
Bihna gûmanan ew gez kir.
Gûman yek bi yek,
Girtin,
Kom kirin,
Di xwe de bêtin,
Ji nişka ve,
Kaniyên jan û kovanan,
Tê de bişkivîn
û bi hêrs
Marêñ sor jê herikîn,
Herikîn.
Her û her diherikin...
Û canê wî,
Min,
Te,
Li pey xwe dixuşînin.

Rûxwes

MIROV ÇAWA HELBESTAN DINIVISÎNE



Mayakovskî

Mayakovskî ev nivîs piştî xwekuştina Sergey Yesenîn nivîsiye û cara yekem di sala 1926-27-an de di kovarêن Novy Mir û Ogonyok de hatiye çapkirin. Min cara yekem bi Swèdî dît û bala min kîşand. Min dûre wergera bi Tirkî jî bi dest xist. Dema min wergerand Kurdî, min çapa Swèdî bin geh girt û da ber a Tirkî.

Bêguman nivîseke kevn e û gelek tiştên tê de ji bo iro derbas nabin. Hinek tişt jî hew ji bo taybetiyên Rûsyâ ne. Lê bi baweriya min dema mirov tevaya nivîsê bigire ber çavan, berhemeke dîroki ya giranbuha ye. Helbestikarî, bi taybetî li welatên derengkeytî hîna jî hêleka nivîsandinê ya xurt e. Welatê me jî di nav wan welatên derengketî de ye. Bi hêviya ku karê helbestkariya me hêsanter bike min ev nivîs wegerand Kurdi. Wek ku Mayakovskî bi xwe jî dibêje, tu kes bi vê nivîsê nabe helbestvan, lê dikare di derheqa nivîsandina helbestan de fikrekê bide kesê ku dixwaze bibe helbestvan.

Süleyman Demir

Gelek sedemên ku ez di vê derheqê de dînîvîşînim hene. Di gelek mu-naqaşeyê di vê derheqê de, ku ez ji tê de besdar bû me û dema bi zimanza-nen ciwan re di derheqa afirandina berhe-mên wilo de diaxivîm, dema min di vê der-heqê de bi rexnegiran re munaqaşe dikirin, pîrre caran min li ser xwe wek vatinî dîtiyê, ger ku ez nikaribim helbestvaniya kevnar hilweşînim ji, pêwîst e ez bi kêmâsî bêba-weriyekê di wê derheqê de pêda bikim. Helbestvaniya kevnar hîna baş nehatiye per-itandin. Bi belengaziya xwe veşartî maye. Hew dema parêzgerên bi xîret xwe ji ber hunermendiya nûjen, li pişt peykerên kevn veđişartin êrîş dicû ser.

Bi baweriya min, ger ku em wan peykrêن kevnar hilweşînin, ji holê rakin û biguhe-rin, em ê karibin rûmeteke mezin ji hêleke nedîtû û nenas de bidin xwendevanan.

Zarokan (û dibistanên ciwanan yên çandeyî bi xwe ji) her dem pîrre mereq kirine bê ci di hundurê vî hespê ji kaxetan de he-ye. Piştî xebata formalîstan dil û gurçikêن hesp û filên ji kaxetan hatiye eşkerekirin. Ger hesp bi vî karî hinekî hatibin xeraki-rin, em lêborînê dixwazin. Mirov nikare bi helbestvaniya kevnare re pevçûnên çandeyî bike. Ji ber ku ew bingeha xwendegehiya me ya neteweyî ye.

Ew kîna me ya ji zûde û ku wê her dem ji hebe, êrîşan dibe ser wê xwe ecibandina romantîk-rexnegirî. Em êrîşan dîbin ser wan ên ku mezinayıyekê di helbestvaniya kevnar de, bi sedemên ku ew bi xwe ji dil-dar bûne dibînin, wek ku Onegîn ji Tatîana hez dikir (harmoniyekê dide can), ku

xwedêgiravî dikarin helbestvanan fam bi-kin (ev kesên xwe diecibînin li lîse fêri van tiştan bûne) û ku ahengêñ bendan xwes têñ guhêñ wan ji.

Ji ber ku ev kevnepereşti di semta giran-buhayî û cidiyeta helbestvaniyê de atmosfe-ra kîlkirina şehweta mirovan û xeyalperesti-yê ava dike, em ji vê `sabata` nalet nefret dîkin. Li gor baweriya vê kevnepereştiyê tu diyalektîk di helbestvaniya nemir de tune ye. Mirov berê xwe dide jor û radiweste, ger ruhekî helbestvaniya îlahî wek kevoke-kê, wek teyrê tawuz ya ji yê heştirme bê tê-keve serê yekî ser perritî, hew wê demê di-kare helbestan binivîse.

Ji bo ku mirov kirinêñ van camêran der-xe rastê, pîr kar navê.

Wê bes be ku mirov "evîndariya Tatîana" û "ew zaniyariya ku Naso" di derheqa pêşniyariya qanûna zewacê de dixwend, bi-de ber hev. Xwedêgravî em "fîza bêhêvîti-ya" Pûşkîn ji karkerêñ maden re li Donet dixwînin ya ji li pêsiya meşen yekê gulanê bazdidin û bi dengê bilind dîkin qîrîn: "Kalikê min her dem xwedî prensîbêñ bi rûmetirîñ bû".

Ez bawer nakim ku wê piştî vê, ciwanekî bi agirê xwestina ku kêrhatina xwe ji bo şo-reşê bixebeitîne be, dîsa li helbestvaniya kevnar vegere.

Di vê derheqê de pîrre hat nivîsandin û qisekirin. Temaşevan û guhdaran her dem piştgiriya me kirine. Lî piştî vê piştgiriyyê dengen gazinan der têñ.

"Hûn hew hildiweşînin, lê hûn bi xwe tiştekî naafîrînin. Pirtûkêñ xwendehiya kevn ne baş in, lê ma ka yên baştir? Qaîde-

yên helbestên xwe bidin me! Pirtûkên xwendeghehiyê bidin me!"

Divê ji bîr nekin ku helbestvaniya kevnar ji berî hezar û pêncsed salan de heye, lê emrê helbestvaniya me hew ev 30 sal e; lê dîsa ji pêwîst e ez bêjim ku eva ez dibêjim, ne bersiveke baş e.

Dipirsin. Hûn dixwazin binivîsin lê hûn nizanîn bê mirov çawa dinivîsîne! Ji me dipirsin bê çîma tiştekî ku li gor hemû qâideyên Şengellî bi aheng, bend û besavenda çepràst hatiyê nivîsîn di helbestvaniyê de nayê qebûlkirin? Hûn mafedar in ku ji helbestvanan bixwazin ku helbestvan pêwîst e zaniyariya di derheqa karê xwe de bi xwe re nebin tîrbê.

Ez dixwazin di derheqa karê xwe de ne wek kesekî dogmatîk binivîsim, lê wek ku di rastîyê de heye binivîsim. Buhayeke zanistî di vê nivîsa min de tune ye. Lê ez bawer im karê ku ez dikim, di bingeha xwe de ji karê ku helbestvanen navdar dikin ne cuda ye.

Divê ez rastîyeyeke din ji bînim ziman. Ji bo ku hinek bibin helbestvan ez qâideyan pêşkêş nakim. Ji xwe tu qâideyên wilo ji, tune ne. Ji wî kesê ku qâideyên helî helbestvan diafirîne re helbestvan tê gotin. Ez ê cara sedan ji gotina xwe ya ku min pê serê xelkê bir bêjim:

Matematîkçî- mirovek wilo ye ku, diafîne, qâideyên matematîkê seraza dike û pêşdetir dixe. Tiştekî nû li zanistîya matematîkê zêde dike. Ew mirovê ku cara yekem "du cara dudu çar e" formule kiriye, matematîkzanekî mezin bû. Li gora ku ev rastiya ji bo wî eşkere, bi rîyeke hêsan, wek ku du qûnikên cixaran deyne ber du qûnikên cixarê din bû ji. Lê tu mirovên din ku dû re ev rastî dîtine, heger tiştên pir me-

zin ji li hevdû anîbin, ne matematîkzanen mezin in, ji bo numûne yê ku tirêna bidûkelê avakiriye. Ev rastî, karê hesabê ji bo li-hevanîna tirêneke bidûkelê biçûk naake. Karê ku wî ji bo transportê kiriye, di dema xwe de sed caran ji rastiya wî hesabê arimetîkî yê bê şik giranbuhatir e. Lê mirov nikare ji yekîtiya matematîkzanen bixwaze ku di ber geometriya Lobaçevskî re hesabênen xerciyênen nûjenkirina tirênen bidûkelê ji derxin. Wê xwestineke wilo komîsyona plankirinê dîn bike, matematîkzanen ecêb-mayî bihêle û kuçek bê dawî derxe pêşıya kesen ku buhayêن cuda hesab dikan.

Anîha ji ji bo min dibêjin ku ez ketime dû vekirina deriyen ku li min hatine girtin. Dibên ev eşkere ye û filan bêvan. Lê ev ne rast e.

Redaktoreñ me ji sedî 80 kerşa bi aheng çap dikin. Dema vêna dikin ya hew ji ber ku hayê redaktoran ji helbestvaniya kevnar tune ye, ya ji ji ber ku pê ne hesiyane bê helbestvanî dikare ji bo ci were bikaranîn.

Tiştê ku redaktor dizanin hew "min ji vê hez kir" û "min ji vê hez nekir" e. Ji bîr dikin ku ew tama di helbestan de dikare û pêwîst e bê pêşvexistin. Piraniya redaktoran ji ber ku nizanîbûn bê wê ci bêjin, nikaribûn destnivîsîn min yên helbestan teslim bikin û ji min lêborîn xwestin e.

Redaktorekî bi rastî zana pêwîst e karibe ji helbestvanekî re wilo bêje:

"Helbestên cenabê te pir rast in. Li gora qâideyên nivîsîna helbestan ya M. Brodovskî çapa sisîyan hatina çekirin. Ahenga ku cenabê te bikar aniye hemû kevn û ceribandî ne û ji zû de ye ku di ferhenga mezin a ahengê ya N. Abramov de hene. Lê ji ber ku anîha tu helbestên baştir di desten min de tune ne, ez ê yên cenabê te çap bikim."

Lê hew bi qasî heqê ku ez didim daqtîloni-vîsekî jîr, ez ê bidim te jî, 3 ruble ji bo rûplekî, bi bazara ku tu ê ji min re sê kopiyan bîni”.

Tıştekî ku helbestvanek di rewşeye wilo de bike tune ye. Ya wê dev ji nivîsandina helbestan berde, ya jî wê wek serêşa ku ji karekî giran re pêwîst e, serê xwe bi helbesten xwe biêşîne. Helbestvan kîjan rîyê ji xwe re bi ecibîne jî li hember redaktorekî niçîrvanê nûçeyan ji rewşeye xerab xelas di be û redaktor jî qet nebe wê bi sê rubleyan ji bo her hejmara rojnameya xwe karibe tiştekî baştır pêda bike. Ew di nav skandal û rivînên êgir de jî rûniştinê dawiya şalê xwe kevn dike û helbestvanekî wilo kérnehatî jî dema rûpelan li hev diqlupîne hew ji bo ku tilîkên xwe şil bike hinek tif xerc dike.

Ji bo ku kalîteya helbestan bê bilindkirin û ji bo ku mirov bike ku helbest di pêşerojê de xurttir bibe, divê mirov ji niha û pê de nivîsandina tişten bêxêr û kerşê, ji her babet taba mirovayetiye cuda bike.

Ez dixwazim rastiyeye din jî bînim ziman: Armanca helbestvaniyê, ne afirandina qaîdeyan bi xwe ye. Heger ku rewş wilo bûya, wê helbestvan di dibistanên skolastik de bigjhana û antremana îdarekirina qaîdeyên bûyerên ku nabin û rewşen bê xêr bikiran. Ji bo numûne wê tu kesan ne xwesta serê xwe bi pêdakirina qaîdeyên dema mirov seyrana bi duçerx dike, bê çawa stêrik têñ hejmartin biêşîne.

Jiyan rewşen ku formulasyon û qaîdeyan dixwaze pêş de dixe. Çîna me û xwestina me ya serhildanê, naverokê didin armanca qaîdeyan û her babet metodênu ku formule dikan.

Ji bo nunûne, şoreşê zimanekî hişk ku bi milyonan mirov pê diaxivin xistiye nav xel-

kê. Şiklê axavtina li qeraxêñ bajaran diherike nava bajaran. Ev, bi gotinê xesandî wek “îdeal”, “prensîbêñ wekhevîyê”, “bîn geha tişten îlahî”, “rûyê Mesîhiyê û dij-Mesîhiyê yê erşan”, zimanê entelektuelan zeftir dike. Ev gotin hemû bûne şorba ku li hemû restaurantan tê kelandin. Ev, ew tişten nû ne ku ketine nav zimanê me. Mirov dê vî zimanî çawa bike zimanê helbestvaniyê? Qaîdeyên kevn bi “fantaziyan” û “gulan” û helbestvaniya aleksandrî nema dibe. Em ê van gotinan çawa têxin nav helbestan û em ê çawa helbestan ji vî zimanî çebikin?

Ma gelo ji bo xatirê helbestan em dikarin tif şoreşê bikin?

Em bûne rezîl û xerab.

Ji bo me tu rê nemane.

Wê xeta tirênen bi çepilêñ reş

Me hemûyan daqurtîne.

(Zinaida Hippius)

Na!

*Texlîtkirina alarma şoreşê bi amfibrachên
beşavenda zengîn ku ji bo fîkandinê hatine
çekirin, bê fede ye.*

Eğit, mîhdiyên li ser deryan, albatross in.

*Mîvanan ser masê ne li wê dera xurîn û
vizîn e.*

*Xelkê baz hûn matros in, matros bi xwe
ne,*

*Ez kilama xwe diyarî we dikim, ji agir û
rûbîn e.*

(Kirillov)

*Qêrin ciyê kilaman digire, gurmîna deffê
jî, ciyê lorandinêñ ber dergûşan digire, lê dîsa
jî pêwîst e em heqêñ hemwelatiyê bidin vî zi-
manî.*

“Gavêñ şoreşeri bigirin” (Blok)

“Meşînan li darxin” (Mayakovskî)

Ne bes e ku mirov numûnan ji helbesten

nû bide û bi vî awayî diyar bike bê gotin bi qâideyan çawa tesîrê li ser koma gelê şoresh-ger dike. Ji bo ku mirov karibe vê tesîrê bike, divê mirov helbestê ji bo pişgiriya mak-sîmûm ya çîna xwe ava bike.

Ne bes e ku Blok dibê, "ew dijminê şiyar qet ranazê". Divê Blok bê şik diyar bike ya jî bi kêmâsi salixdana şexsiyeta wî dijminî baş bide.

Ne bes e ku mirov di meşînan de beşdar bibe. Divê mirov li gora hemû qâideyan di şerê kuçan de jî beşdar bibe û gurtir bike û bike ku telgiraf, banqe û embar tê-kevin destêñ karkirêñ ku serî hildan e.

Ananasan, kubaban

buxê heta tu dikarî di kêfê de!

Burjuva, ji aniha û ne dûr dema te diqede.

(Mayakovskî)

Zahmet e ku mirov helbestek wilo wek helbestek klasîk eşkere bike. Greçê ku di salêñ 1820 an de jiya bû, tiştekî wilo nas-nake, lê heger ku nasbikira, bê guman wê li gor zaniyariya asasê avakirina helbestan, wilo di derheqa wan de binivîsanda: "di van rêzan de ne bingeha avakirina helbest-vaniyê heye û ne jî aheng."

Lê ev malik, ji bo serhildenê li kolanêñ Petrograd, di devê karkeran de bibûn gotin û malikên serek. Lê di demêñ ku rexnegir valane de, dikarin tê bigihijin ku ev eşkere bêqaïdetî ye.

Di nivîsandina helbestvaniyê de afirandina berhemên biserketîtir, bêguman miso-gerî ye. Peyv û maneya peyvan, ji bo rewşa ku divê bê eşkere kirin, dema derdikevin pêsiya yekî helbestvan, divê xebatek baş li ser bibe û bêne helbijartin. Heger ku mirov dê cawê kevn di afirandina helbestan de bi-

kar bîne, divê caw li bejna materyalê nû bê. Heger ku li hevanînek wilo nû pêwîst be, di pirbûnê de kalîte dibe tiştekî bingehîn.

Serketina di vê derheqê de, şıklê xwe ji rastiyeye bê hempa ya jiyaneye bê dawî na-gire. Bend, helbesta azad, alliteration û as-sonans her roj nayêñ çekirin. Divê mirov di pêşerojê de jî li ser domandinê, ji nû de avakirinê û firehkirinê bixebite.


Formula "du caran dudo çar e" ji ber xwe ve najî û nikare bijî. Divê mirov karibe vê rastiyê tatbîq bike (qâideyên tedbîqkirinê). Divê mirov bike ku xelk vê rastiyê bîr-bînin (qâideyek din), divê mirov misogeri-ya ku tu caran nayê guhertin bi hinek mî-nakan diyar bike (ji bo numûne, naverok û pêwîstiya di rastiyê de).

Her wilo diyar dibe ku danasîn û dîsa bi paşde danasîna rastiyê, ne armanca helbestê ye. Bêguman karekî wilo jî pêwîst e, lê divê ev, wek karê ku sekreterek di civîneke me-zin de dike, bê nerx kirin. Ev hêsanîyeke wek "me bihîst - me biryar li ser girt" e. Heger mirov pênc salan her bihîstibe û de-reng biryar girtibe, her tiştê ku heye ji xwe hatiye tedbîqkirin. Trajediya hew gotin û eşkerekirnê jî, di wir de ye.

(Wê bidome)

Wergera ji Swêdî: Süleyman Demir

ÇAR MİST XWELÎ



Jiyan xewnek e, lê ew xewna ji yeke kurtedemekê ye. Merov weqa li ber xwe dide, weqa ji bo jiyanê têdikoş; geh digirî, geh dikene û hin caran heye ku rojek li ber çavên wî bibe salekê, lê li dû derbasbûna salên jiyana merovekî, jiyan bi tevahiya xwe dibê bîranîneke nîvçê û ew ji hêdî hêdî di nav salan û bûyeran de dihele û diçê. Ez yek ji wan kesan im ku pirraniya xelkê cîhana merovan ji wan pêk tê. Ez ne serokê welatekî bûm, ne rêzankî bi nav û deng, ne ji min berhemeke bi nivîs li dû xwe hîştiye, da têkeve pirtûkxaneyan. Tenê du qîzên min li dû min man. Heger rojekê diya wan bimire, ew zaroyêwan û çend heval û cîranê salan ê navê min di quncikekî bîranînê de bihêlin, heta ku rojekê ew ji dimirin û bi çûna wan re kurtexewna jiyana min ji dê bi ber bê bikeve û biçê. Heye ku ji bo çend salan navê min di kutûkên dewletê de bimîne. Ew ji ji bona berjewendiya dewletê û pirsên qanûnî.

Min di rojeke dawiya sala 1920'an de çavên xwe li jiyanê vekirin, li bajarekekî bakurê Îngliztanê. Sê salan li dû wê rojê bavê min ji ber xizantiyê reviya, mal û gorêñ xwe li dû xwe hîştin û berê me di paporeke mezin de da Australya ya dûr. Brayê min wê demê şes mehîn bû. Ji welatê kevin tiştek di bîra min de nema, ne ji ez çi caran lê vege riym. Ez li gundekî rohilatê Australyayê, ku dû re bû bajarokekî, mezin bûm û di panzdeh saliya xwe de min dest bi kar kir. Ez du salan wek şagirtê meywefroşekî xe-

S. Bekirê Sorekî

bitûm û ji sala 1937'an û şûn ve wek karkirekî binzemîn, mîna bavê xwe. Çar salên leşgeriya li gel hêzên firokîn ne tê de, ez ta roja teqawîta xwe wekî karkirekî derxistina komirê di kar de bûm. Erê, sîh û neh salên jiyana xwe. Ji panzdeh saliya xwe ta şest saliya xwe, dema ez di sala 1980'i de derketim teqawîtê, ez bêkar nemam. Di salên destpêkê de pereyên me di hefteyekê de bi dest dixistinî çar dolarên îroj dikirin. Çiqa dunya me di navbera wê demê û îroj de hat guhertin!

Min jina xwe Sylvia ji rojên zarokiyê de dinasî. Em cîranên hev bûn, bi hev re diçûn xwendegehê û bi hev re mezin bûn. Di nîvê sala 1942'an de em zewicîn. Me herdu qîzên xwe xwedî kirin, ew bi ser lingan xistin, ta ku rojekê, me hew dît, ew ji bûn bûk û dîsa ez û diya wan bi tenê di mal de man. Jina min di warê birêvebirina malê de ji min jîrtir bû. Ev yeka li hesabê min hat û min hemî tevdîrên malê di dest wê de berdan. Heger ne ji wê bûya heye ku jiyana min, wek jiyana hinek hevalên min, ne yeke wisa bextewer bûya. Ew di ciwaniya xwe de gellekî spehî bû. Xweziya pîrbûn û kalbûn nebûyana. Merov wan napecîriñe, lê reva ji wan pêkannîn e, û rojekê merov hew dinihêre ku giyan westiyaye. Dil her ciwan dimîne, lê çi heyf e, ew ji rojekê dest bi gazincan dike û nema dikare xwûnê wek berê li endamên bedenê belav bike. Di salên dawîn yên jiyana min de nedizanim çiqa derman bi min xwarin û vexwarin dan. Li dawiyê hemî babetên dermanan û teknolojiya nû ji nema dikaribûn eş û jana endamên bedenê bi dûr xin. Tirsa min ya

mezin ew bû ku min bi alîkariya makîneyan saxbihêlin. Min tenbeya xwe kir ku ez jiyanekî bi alîkariya makîneyan, wekî merovekî bi zorê nefesê jê derînin, naxwazim. Ma jiyan ji kê re maye ku ji min re bimîne. Pênceh û yek salan ez û Sylvia li gel hev man. Ev ne demeke kurt e. Çiqa veqeta du merovên ji hev hej bikin dijwar be jî mirin kesekî bernade. Di odayeke nexweşxaneyeke mezin de min berî sersala nod û sisîyan xatir ji wê xwazt, ez çûm û ew li dû min ma. Ez dizanim ew ji min bi hêztir e û baş bû ku ez berî wê çûm. Ew dikare li dû min xwe îdare bike, lê min ê nikaribûya. Dîsa ji hiştina wê li dû xwe dijwar bû. Min bi dilekî tiş xem ew li dû xwe hîst. Tenêmâyîn li cîhanê ne hêsan e, bi taybetî tenêmâyînike li dû zewaceke pênceh û yek salan.

Ha wa ye Sylvia, li gel herdu keçen xwe, mîrên wan û çar torinêne me di rê de ne. Berê wan hemîyan li goleke avê ye. Gol yekê biçûk e û ji mala me ne weqa dûr e. Di destekî wê de qutiyek heye, di qutiyê de tûrekî naylon û di tûr de xweliya giyanê min. Min tenbeya xwe ji mêj ve li Sylvia kiribû. "Ez naxwazim termê min têkeve çi goran," min gotibûyê, "ne jî dixwazim navê min li ser çi keviran were nivîsandin." Min ji vê golê gellekî hej dikir. Dengê hevalên zarokiya min li wir e. Me li wir dest bi kişandina cixareyê, vexwarina bîrayê û ramûsandina keçan kir. Rojên havînê me di ava wê de avjinî dikir, em di siya darêni li dorhêlên wê de rûdiniştin û heta di rojên kalbûna xwe de jî riya golê şûna seyrana min bû. "Xweliya min têxin beşekî golê," min gotibû diya zarokên xwe. Ha wa ye,

wekî min gotibû, wisa jî dibe. Min nexwast weqa pere ji bo tabût û gora min biçin. Bi wan pereyan Sylviya dê bikaribe jiyana xwe piçekî hêsanter bike. Ma ji bo çi erdê gorekê ji min re bikire, kiriya gorê sal bi sal bide; û kî dikare ji min re misoger bike ku li dû pênceh salî, yan kêmtir, yan bêtir, bol-dozerek ê hestiyên min raneke û navêje sandıqa kamyonekê, da şûna gora min bibe esasê xaniyekî nû, yan beşekî ji rêteyeke dirêj?! Na, na, min gor navêt.

Çel û pênc salan ji jiyana xwe ez ji bo vî welatî xebitîm û heste bi heste beşekî ji pereyên min ji bo roja teqawîte dan aliyekî, û gotin min, dolarek ji te de, yek ji şirketê de. Heftê hezar dolar di roja teqawîte de bûn para min. Me got, em ê salên mayî bi xweşî û hêsanî derbas bikin. Tew heye ku em çend dolaran ji neviyên xwe re jî li dû xwebihîlin; bila serên wan bi me bilind bibin û me bi kêfxweşî bi bîr bînin. Lî dewlet nahêle. Dewlet baca xwe ji hertiştî digire. Di rojêniroj de tenê zexel û xasûk bi ser dikevin, û min jî nexwast li dû van salan xwe ji bo pereyan bikim zexel. Me rabû pereyên xwe xistin nav pereyên şirketekê. Me got bila du-sê salan li wir bimînin; hele em binihêrin dû re çi dibe, lî hew me dît rojename di rûpelên xwe de behsa şirketa pereyên me tê de bûn dikan: Şirketê top avêt. Ü xwedê rehma xwe li pereyên teqawîte bike. Çûn û çûn! Me xwe bi pereyên dewlet dide hemwelatiyên kal û pîr idare kir. Ne hêsan bû, lî weqa xirab jî nebû.

De nuha ciyê min û pirsa pereyan! Çar mist xwelî bûn û wa ye zavayekî min wê bi ser ava kêleka beşekî golê de direşîne. Jina

min hêstirêne xwe vedisêre û qîzeke min di ber xwe de digirî. Ez jî hêstiran naxwazm. Bawer nakim min bi xwe jî weqa hêstir bi ser kesekî de barandibin. Hêstir ji bo çi?! Merov îroj heye, sibe tuneye û hew! A nuha xweliya min xwe di nav ava golê ya honik de ber bi jêr berdide. Bila bibe beşekî ji xuristê.

Bawer nakim hestê nefret û hejnekirinê li nik min ta radeyeke mezîn hebû. Di rojê serê cîhanî de alman û japonî neyarêne me bûn. Em wisa têgihîstin. Ez di firrokeke leşgerî de reşavan bûm. Ez ji mirinê ditirsiyam, lî amade bûm ji bo welatê xwe, Australia, bikujim û bimirim, lî leşgeriya min bi serî bû, bêyî ku ez tiliya xwe bigihînim ser titikê, û ne jî japoniyekî gulleyek avête min. Dû re, me komira xwe firote wan û wan jî otomobilên xwe frotin me; welatê me û yê wan bûn dost. Li gel wê jî nifşê min her navê "Japs" li wan dikir, lî bêyî çi hestêne nefretê. Nifşê min ji vî halî de ji qerf û henekan hej dikir. Heta bi îngilizan be, me bi navê "Pommies" behsa wan dikir. Li bajarokê me jî min çi neyar nebûn, ne jî kesekî ez çi caran ji xwe re kirim neyar.

Rojekê li dû mirina min keşîş çû mala me. Rebenê keşîş divabû çend gotinêne baş li ser cinazeyê min bibêje. Kî bawer bike? Keşîş merovekî reş bû, ji Tonga hatibû û bûbû keşîşê kiliseya me. Ji ber ku ez çi caran neçûbûm kiliseyê, rebeno ez nedinasim. Divabû çend pirsan li ser min û jiyana min ji Sylviya û herdu keçen me bipirse. Keşîş got, "ha, Sylviya! Hele ji min re bibêje, John di jiyana xwe de ji çi hej dikir?"

Sylviya hema di cih de gotê, "John ji hene-kan hej dikir." Kêşîş ji keça me ya duyem pirsî, "bavê te xwedan çi wesfên taybetî bû?" Wê ji gotê, "na." Qîza min ya mezin ji bersîva pirsa wî wisa da: erê, ew bavê min bû. Li ser cinazeyê min dora heftê jin û mîr û ciwan di kîlîseyâ biçûk de besdar bûn. Ev ji hejmareke baş e. Gellek hevalên min mirin, û li ser cenazeyê hinan tenê çar, yan pênc merov digihîstîn hev. Keşîş li pêş tabûta bi gulan hatî nixamtin bi van gotinan dest bi axistina xwe kir: "Em îroj li vir civiyane, da xêtir ji John Hyde bixwazin. John peyakî wisa bû ku ji jiyanê hej dikir û berî her tiştî ji endamên malbata xwe. Min ji qîzêñ wî pirsî, çi taybetiya bavê we hebû. Yekê got, ne tiştek; ya din got, ew bavê min bû. Ma ji van gotinan çêtir tiştek heye?! Endamên malbata wî ji wî hej dikirin ji ber ku ew ne xwedan taybetiyeke mezin bû. Ew bavê keçen xwe bû û wan wekî bavekî rind ji wî hej dikirin, bêyî çi sedemên taybetî hebin. John Hyde ji nav me bar kir û çû teniştä Xudayê xwe, çû jiyana ebedî,..." Ez kenyam û min spasiya herdu keçen xwe û Sylvia kir, ku wan gotina rast kirin. Di kîlîseyê de ew bi dizî û di ber xwe de digiriyan. Herdu zavayêñ min, hevalekî wan û hevalekî neviyeke min tabûta min rakirin û xistin paşıya otomobileke reş. Dema yêñ di kîlîseyê de civiyanî derketin oto-

mobîl bi rê ketibû.


Gelo ez li tiştekî poşman bim? Na, ez li tiştekî ne poşman im. Dema merov dimire nema êdî rojêñ jiyana wî ji bo wî grîng in. Hemî jiyana wî êdî xwebêja xwe ji bo wî bi xwe wenda dike. Heger wî wisa kiribûya, yan wisa nekiribûya encam ê ji bo yêñ li dû wî manî cuda bûya, lê ji bo wî bi xwe nema êdî tiştek dikare were guhertin.

Min tiştek li ser birayê xwe negot. Ew ji di kîlîseyê de besdar bû. Em ji hev dûr di-jîn, bi her hawayî ji hev dûr. Berî mirina min bi çend hefteyan ew hat mala me. Dora bîst salan me merheba ji li hev nekiribû. Em ji hev xeyidî bûn. Benê biratiya me di navbera me de qetiya bû. Bawer nakim benê di navbera du merovan de biqete bikaribe careke din wek berê bi hev keve, lê çawa be ji, em berî mirina min car din ber bi hev hatin û me dest dirêj hev kirin. Ew ji xirab nîn e.

Heger kesek ji min bi xwe a nuha bipirse, "gelo John Hyde kî bû?" Bersîva min wê ev be: "John merovekî bextiyar bû û ji jiyana xwe razî bû. Wî tiştekî mezin ji jiyanê hêvî nedikir, ne ji dixwast bibe kesekî bi rûmet. Ew bêtir ji pênceh û yek salan li gel şûya xwe Sylvia dilşa ma û bavê du keçen şîrhalal û çar neviyêñ delal bû. Li dawiya dawiyê ew çar mist xwelî bû." ↗

(Sydney, 4/94)

ŞİRETÊN EHMEDÊ XANÎ



Wêne: Novîn Harsan

Nûredîn Zaza

Ojekê Ehmedê Xanî şest zaroyên kurd -keç û kur- birin mala xwe û ji wan re dawetekê mezin da. Piştre di nav wan de rûnişt û ji wan re pirsên jêrîn gotin. Divê hon wan di dilê xwe de veşerin, ji ber ko, rêber û zanayê me ê mezin ew ne ji wan şest zarokan bi tenê re gotine, lê ji bo hemî zaroyên kurd. Gotinên rehmetî ev in: Hon piçûk in, hon ges in, bê derd û xem dileyizin û dikevin; ev dema dilxweşiyê ye.

Eger hon dixwazin hergav bextiyar bibin û tucaran pir bedbext nebin li du tiştan bigerin; hejkirin û xebat.

Kî hejî we dike hejî wan bikin: îro hejî merivên xwe bikin; hejî diya xwe, hejî bavê xwe bikin, hejî hevalên xwe bikin, piştre honê hînî hejkirina diya me gişan Kurdistanê bibin.


Ê didoyan; bixebitin; îro ji bo hînbûnê, ji bozanîn bixebitin; da ko halê dinê bizanin, bi pêş ve herin, bibin meriv, bibin hêja, bibin serdest, bibin însan!

Gava hon dersên xwe baş dizanin, dilén mamosteyên xwe xweş dikin. Hon dibînin ko hon ji ges dibin, ji bin barekî giran xelas dibin, sivik dibin. Ev hergav holê ye. Bixebitin da ko wijdana we hergav ji we razî be! Û gava wijdana însan rehet e û dilê wî bi kêf e, ew însan tucaran ne bedbext e.

Zaroyên min ên delal! Niha ji bo xatirê min têr bixwin! Vexwin û bikenin! Ez bi xwe bextiyar im, ez dixwazim hon ji bi min dilxweş bin, da ko welat ji bi hejkirina me hev û du hergav şâ be!

Hawar, hej. 32, İlôn 1941

SÊ JINÊN KURD



Zeynelabidin Zinar

Dema çilkên baranê û çilkokên xunavê bi hêsanîye-ke rewan serberjêri ruyê erdê dibin û ku di binê nigan de gava radiwestin, pêre pêre bi hevûdu di-hisin û destêن biratiyê didine hev, êkdu hevbeste dikin û radi-bin govenda serhildanê. Hingê ew, ji ber evîna dilê dagirtî serxwêş dibin û dest bi colan û cirîdê dikin, serî hildidin û di-bezin, ber bi riya xwe ve diçin. Îcar navê wê rewantiya wan ger lehî be, yan şape û laser be, yan jî bila şoreş û serhildan be, ci hebe jî, ew her li pey amac û daxwaza xwe diçin. Lê rojekê de-reng an zûtir, dê ew her silava xwe bigehînin deryayekê. Bêgu-man kînedoziya netewî û daxwazên nijadî jî eynî wisan in û dê wisan jî bibin, ta ku xwe bingehînin hedefê.

Îcar tiştê herî hêsanîr ev e ku gava mîr û jin, keç û xort, pî-rejin û kalemîr digel zarûkan ku mil dane hevûdu û ber bi fe-latê ve beziyan, ewçax karên giran hêsan dibin û gelşen bê piş-kaftin jî jî holê radibin.

Îro êdî em Kurd nema dibêjin ku kar tenê li ser milêñ zila-man e, yan tenê li ser milêñ xwenedan e û tenê li ser milêñ si-yasetmedaran e. Fermo, em berê xwe bidin sê şerejinêñ Kurd û binerin ka ew ci ne, ci kirine û ci dikin.



DIYA CIWAN

Nivîskar û helbestvana hêja Zeyneb xanîm, bi nasnavê Diya Ciwan tê naskirin. Bêguman eßkere ye ku celebê bikaranîna nasnavên bi vî hawayî, ku bi bavê filankes an bi diya filankes e, ji Ereban gîhayê van rewşenbîrên li Rojavayê Başûrê Kurdistanê. Lê madem vê xanima hêja xwe bi navê kurê xwe yê mezin (Ciwan) daye nasandin, em ê jî her wî navî jê re bi kar bînin.

Diya Ciwan di 1952-an de li herêma Botan, li gundekî bi navê Gundêş hatiye dînayê. Navê bavê wê Mele Osman e û kurê Evdirehman Axayê Şûzî ye. Evdirehman Axa ji, kurê Şahîn Axa ye û ji eşîra Birdawan in. Navê diya wê jî, Fexriya ye.

Evdirehman Axa di dema Serhildana Kurd a bi serokatiya Şêx Evdirehmanê Garrisî de, nivîsendeyê Serhildanê bû.

Destpêka xwendina Diya Ciwan a pêşî,

mîna ya zarûkên piraniya meleyan, her Quran búye. Piştre ji klasikên kurdî weke Nûbihara Ehmedê Xanî, Mewlûda Kurmancî ya Melê Bateyî û hinekên din ji xwendine.

Diya Ciwan di 1966-an, meha Gulanê de ji Bakûrê Kurdistanê çûye Rojavayê Başûr û li wir bi kurmamê xwe re zewiciye. Hetanî 26 salan ji çavêن wê bi gundê wê neketine. Ji 1975-an ve jî li Şamê rûdine. Niha çar keç û du lawêن wê hene.

Diya Ciwan ji 1977-an ve ye ku dest bi nivîsandina kurdî kiriye. Lê heta 1982-an, wê bi tîpêن erebî nivîsandiye. Piştre bi alikariya Mele Bahrî dest bi tîpên latêni kiriye û her lê domandiye û didomîne.

Sedemê bingehîn ku Diya Ciwan dest bi nivîsandina zimanê kurdî kiriye; bindesiya Kurdan û jiyana wê ya li biyanistanê

bû. Wê di 1992-an de pirtûkeke helbestan daye çapkırın û niha çend pirtûkên wê yên din jî weke tiştên folklorî, "Mamik" û "Çirok" û "Kurteçirok" ku berhev kiriye bê çap hene. Lê ew pirtûka xwe ya helbestan, bi navê "helbest" an navdar nake. Tenê ew nav, jî aliyê xelkê ve li pirtûka wê hatiye danîn. Di gelek kovar û rojnameyan de jî meqale û helbestên wê hatine weşandin, gelekan li serê nivîsandine û behsa zirektiya wê kirine.

Karê nivîskariya Diya Ciwan pir zehmet e. Ji ber ku ew jîna malan e û diya şes zarûkan e jî. Lê bi hewqas zehmetî jî, ew jî karê nivîsandina bi kurdî li paş namîne û her lê berdewam e.

Li gorî gotina Diya Ciwan: "Divê ku mîrov du gotinan jî ferhenga jiyana xwe derxîne. Yek, nezanîn e û ya din nekarîn e." Ew, gotina xwe weha didomîne: "Eger min (karê nivîsandinê) %20 pêk anî, baş e. Eger min %40 pêk anî, baş e û zêdetir jî ku min bi kar anî baştir e. Lê mesela ku ez bêjîm wele ez nikarim an nizanim, divê ku ew gotin bi temamî bêne avêtin. Îcar min destênen xwe avêtine ci karî, ez tê de bi ser ketime. Ha yek jî wan jî karê xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî ye."

Diya Ciwan zemanê xwe tev li karê mîlê, xwedîkirina zarûkan û nivîsandina kurdî behr dike. Zemanê xwe wisan xerc dike ku ji bo bihngirtina wê tu behr namîne. Îcar ew wisan bawer dike, çaxê kela toreya helbestan lê radibe, ne çaxê şevê dinase û ne jî rojê; ne kar dinase û ne jî qezencê...

Dema zarûkên Diya Ciwan piçûk bûne û di şevan de giriyanе, ew bi dengê wan şî-

yar dibû. Lê niha ew bi hatine pêjna tîpeke kurdî, bi ya bêjeyeke kurdî ji xew şiyar dibe û dest davêje qelemê bi zimanê neteweyê xwe dîniyîse.

Serê pêşî Diya Ciwan di hin kovar û rojnameyên erebî de gotar û meqale nivîsîne. Lê piştre wê dest jî nivîsandina bi zimanê erebî berdaye û sedem jî weha dianî zîmîn: "Pêwîstiya rojnameyên erebî zêde bi nivîskaran tune." û berê xwe daye rojname û kovarênen kurdî, wek Medya Gunesî, Rojnama Azadî, Berbang, Gurzek Gul, Xebat, Zanîn, Kulîlk, Metûn, Serhildan, Rêka Sosyalîzmî, Bihar û hwd.

Diya Ciwan pir ji malxweyê xwe razî ye û dibêje ku bîrûbaweriyêner herduyan riyek in. Ji ber hindê jî ew tu carî jê re nabe asteng. Bi tersê wê, jê re dibe alîkar jî. Heta hin caran gava ku kirina hin pêşniyarên ji bo suxreya nijadî ji Diya Ciwan re têñ û ku ew sistî dike, malxweyê wê bevvê wê dişidîne û wê ji bo kîrinê didehfîne. Diya Ciwan li xwe mikur tê û xwe ji vê rastiya han jî bi şûnde nade, dibêje: "Rexnevanê min ê herî rast û dirust, malxweyê min e."

Diya Ciwan ne tenê suxreya nijadî dike, herweha ji bo çareserkirina gelşen di navbera mîr û jinan de jî pir xwe dişîne. Ew, tu carê destûr nade ku jineke nezan rabe û ji ber sedemîn bêmane serê malxweyê xwe serberjîr bike û wî di nava xelkê de tawanbar bidêfîne. Ü dibêje: "Îro jinek eger bi niheqî dengê xwe li ser mîrê xwe bilind bike û wî ji xwe kêmîtir bibîne û lê serdestî bike, tu ferq di navbera wê jînê û jineka berî 100 salî de namîne. Herweha ev tişt ji bo mîran jî eynî wisan e." û li axaftina xwe

weha didomîne: "Di baweriya min de îro mîr ne serdest in û jin ji ne bindest in. Lî eger li hin deveran serdestiya mîr û bindes-tiya jinan bêne dîtin ji, tawan ne yê jinan e ji û ne yê mîran e ji. Lewra amana jiyanê gelek bermayêن kevn ji mîran re hiştine. Mîr pêmayêن bavêن xwe ne û jin ji pêma-yêن diya xwe ne. Îcar divê ew tişt hinohino bêne guhartin. Guhartin ji, girêdayê bi me-jî û zanînê ve ye. Eger jina îro bixwaze ku zilmê ji ser xwe rake û ger bixwaze rengê ji-yana xwe ji ya dê û dapêra xwe biguherîne, ewçax ne bi çavlêkirin û serhişkiyê dibe, belê bi zanîn û milahîmtiyê çêdibe. Ji ber ku mîr û jin, herdu ji zikekî derketine û gava çêbûne ji, nezan û xam bûne. Ew hem di qencyî de û hem ji di xirabiyê de hev-pişk in. Îcar rewşa jiyanê wan guhartiye û her yekê xistiye qalibekî cuda."

Diya Ciwan gava diçe şeveke şahiyê yan pîrozkirina newrozan, her tim malxweyê xwe ji dide kêleka xwe û hêj diçe. Li ser vê yekê, ew rexne li jinêن Kurd ji dibarîne û dibêje: "Gava ew dixwazin suxreyaka nijadî bikin, her dixwazin ku bi tena serê xwe bilipikin û çaxê bi deveran ve diçin ji naxwazin ku malxweyê wan bi wan re be. Ha ev yek ji dibe sedemê zûketina wan û nikarin fikra xwe bi xelkê bidin bawerkirin." Ji ber van sedeman e ku Diya Ciwan çaxê diçe deverekê, her tim malxweyê xwe ji bi xwe re dibe.

Diya Ciwan ji bo xebata Kurdên li Ewrûpayê ji pir kêfxweş dibe û pê dipesine. Dibe ji: "Gava, xasma ku li Ewrûpayê, ji-nêن Kurd bigehin sawiyeke wisan ku kari-bin komele û sazgehan ava bikin, cihê ser-

bilindî û şanaziyê ye. Ew yek ji bo zilaman ji her wisan e. Lî ci mîr û ci ji jin, ji bo mafê neteweyê xwe ci bikin, her bila ji bo mirovatî û demokratiyê bikin, lê bi şertê ku bimînin Kurd."

Diya Ciwan zêde zêde dixwaze ku suxra gelê xwe bike û li pawukê ye ku zarûkên wê bi firrê bikevin, da karibe bi hêsanî bişixule. Herweha dibêje ku, zêdetir pêwîstiya wê bi xwedina kurdî heye û bi hêvî ye ji ku wê di demepêşê de karibe hîn zêdetir bini-vise û zêdetir bini-vise.

Niha çend rûpel nivîs û helbestên Diya Ciwan ku wê bi xwe dane min, hene. Ew, yek ji yekê xweştir in. Lî nivîsa ku zêdetir bala min kişand, eva bi sernavê "Gelo Xewn el?" e, ku tê de bi hostatiyeke zîrek-dar navêن piraniya kovarêن herêma xwe anîne zimên û amaca hemûyan tenê gulîstanek nîşandaye:

GELO XEWN E!?

STÊR da xwe û rabû, çû şevbihêrka xwişka xwe GLAWÊJê... Herdukan milên xwe dane hev, ber bi ASOYê ve çûn... Li wir hersê bi hev re şêwirîn û berê xwe dane PIRSeke nû... Ji wir ji her çar qesta ZANÎ-Nê kirin... Wê çaxê rahiştin GURZEK GUL û berê xwe dane wê qada şérîn... Li wir XUNAVeke dilovan bi ser wan ve hat... Hingê bûn GULÎSTANEke mezin!..

Diya Ciwan
Şam-3/5/1993



KEÇA KURD

Navê vê rewşenbîra Kurd ê rastîn, Emîna ye û di 1948-an de li Xerbê Cihuyan hatîye dinê. Ew gund, niha li Rojavayê Başûrê Kurdistanê dimîne. Navê bavê wê Emerê Evdilayê kurê Mehmûd e. Bavê wê ji eşîra Elikan e û bi koka xwe ji gundê Gurîza ye ku niha dikeve herêma Torê, li rex Hevêriyân. Bavê wê berî 1940'ı, ji ber zordariya Tîrkan ji Bakûr dakteyi Binxetê û li wir bi cih bûye.

Nasnavê xanima hêja Emînayê jî, her mîna yê "Diya Ciwan" e ku şûfandina weke ya Ereban e.

Bavê Keça Kurd, ji berê ve mirovekî welatperwer bûye û di Civata Xortan de cihê xwe girtiye. Ji ber hindê, wî zarûkên xwe jî li wê gorê perwerde kirine.

Keça Kurd hêj di neh-deh saliya xwe de bi alîkariya kurxalê xwe Derwêş, fêrî nivîsandina kurdî ya bi tîpêñ latêñî bûye. Zêdetir jî çîroka Mem û Zînê ya Dr. Nûredîn Zaza tîn lê kiriye û ew dehfandiye bi bal nivîsandinê ve. Keça Kurd dibêje ku, piştî 1958-an gava li Îraqê Şoreşa Evdilkerîm Qasim çêbûye, wê zimanê kurdî rind bi latêñî dinivîsi. Û wê li gundê Ebrê bavê xwe û çend hevalên wî jî fêrî nivîsandina bi tîpêñ latêñî kirine.

Di 1961-ê de, gava dibistan li gundê ku Keça Kurd lê dima vebûye, wê bi temenekî mezin dest bi dibistanê kiriye û rasterats li sinifa çaran domandiye. Û li Qamîşloyê jî xwendina xwe ya orte û ya liseyê kuta kiriye.

Xebata Keça Kurd a welatperwerî, zêdetir di nava keç û jinan de çêbûye û hertim li malan geriyaye, doza kurdî bi wan dayezanîn û ew pê serwext kirine. Ji wê hingê ve, ji ber ku navê wê yê rastî nedihate eşkerikirin, îcar nasnavê "Keça Kurd" ji aliyê keç û jinan ve lê hatiye danîn.

Di havîna 1970 yî de, gava li Başûrê Kurdistanê Civîna Welatî çêbûye, Keça Kurd li ser navê Kurdên Rojavayê Başûr wek nûner çûye civînê. Di wê civînê de, ji jinan tenê ew beşdar bûye. Piştî civînê, îcar hiskirin û evîna zimanê kurdî Keça Kurd

dehfandiye qadî, heta ku di 1971-ê de çûye Başûrê Kurdistanê û di Xwendegeha Silê-maniyê de dest bi xwendina bilind kiriye. Sê salan li Xwendegehê xwendiye û ders ji mamestê kurdî Dr. Kemal Fuad girtine. Lê di Yazdehê Adara 1974-an de êrişen dijmin gava ku hatine ser bajêr, ew jî mîna her keşî ber bi çiyayênil bilind ve reviyaye. Piştre jî çûye Îranê û di 11/1974-an de bi riya li ser Tirkiyê ve derbasî Binxetê bûye.

Keça Kurd di 1975-an de bi Mihemedê kurê Mele Ehmed re zewiciye û niha diya pênc zaruyan e.

Cara pêşî, nivîsên Keça Kurd di çend hejmarên kovara Pêşeng de, li ser jiyana pî-rekan hatine weşandin. Lê nivîsandina wê ya helbestan, piştî ku cenazê mameste Cegerxwîn birine Qamîşloyê û ku bi xwendina helbestên kurdî lehiya mirovan rabûye, di hinavê wê de Kurdistanê azad ava bûye û her di eynî wê şevê de dest bi nivîsandina helbestekê kiriye. Piştre jî gava ku 13 xorôtan ciwan çûne Başûr da şerê rejûma Sêdam bikin û ku hatine girtin, bi derbekê jî ew li darbestan xistine, gelekî ponijiye û li ser wan jî helbesteke din ristiye.

Nivîsên Keça Kurd jî kovara Pêşeng zê-detir di kovara Gelawêj, Zanîn, Roj û Pirsê de hatine weşandin. Wê heta niha çar pirtûk nivîsandine û sê pirtûk jî çîrokên Ezîz Nesîn ji zimanê erebî wergerandine zimanê Kurdi. Û destnivîseka malxweyê xwe jî ji zimanê erebî wergerandiye zimanê kurdî.

Keça Kurd heta niha li dora 70 helbestî nivîsandine. Lê piraniya wan hêj nehatine çapkirin. Pirtûka wê ya herî balkêş; li ser bêjeyênen zaravayê kurmancî yên ku zayen-

deya wan mî û nîr in hatiye nivîsandin.

Keça Kurd, jîna Kurd bi dibistanê şûfan-diye û dibêje ku "Gava dê bi axaftineke rast bipeyîve, wê zarûkên wê jî her wisan bipeyîvin. Lê eger dê pûç be, wê zarûkên wê jî pûç mezin bibin."

Xanima hêja dixwaze ku jîna Kurd her-tim xwe binase û karê li ser milêne xwe jî rind bizanibe. Herweha di wê baweriye de ye jî ku jin û mîr hevîdu temam dikin. Lê ew dibêje ku, çaxê jîneke bêperwerdekirî derkeve holê, serberdayî dibe û riya xwe jî şas dike. Îcar berî her tiştî ew şîreta xwen-din û zanînê li hemû jinan dike.

BIXWÎNE JINÊ

Tu hînê ziman be, bixwîne jinê
Nemîne nezan û li jorê tenê

Bixwîne, bibîne tu wan gewhera
Ji xeml û ji xêzan, ji bejna te ra

Bibîne li nexşê welat û gela
Bi xame bihûne li nav rûpela

Bi xame birêse li ser wan kesa
Çeleng û leheng û li ser fêrisa

Bixwîne li cîhan, li Vêtnam binêr
Keça xwendevan û çeleng û dilêr

Bi ceng û bi lêdan li rêça welat
Bi xwendin, bi zanîn ci rengê xebat

Bi rengê xebatê nego: Ez keç im
Li pêşya kura go divê ez biçim

Li şar û li gunda, li şax û şikeft
Li piştê girêda tiveng û du rest

Li pêş top û tangan diçûn lek bi lek
Di sînga xwe çandin gule pir gelek

Keça xwenadevan wê li gel gundiya
Dikêla, dikola, genim çandiya

Bi qîr û bi hêrza 1i pêş dabezî
Li ser mîza dijmin civandin kezî

Didan xwîn û can, wê nego ev çi ye!
Bi saz û bi awaz digo partî ye!


Bi kêşa xwe anî ewê bawerî
Bi nîşan wê danî welatperwerî

Keça Kurd mebe hemdemê paşverû
Jiyan her li goran diçê pêşverû

Li gerdûn binêre 1i dê û keçê
Ligel pêşveçûn, gav bi gav ew diçê

Ji oda tenê, reştarî derkeve
Li jêr sêbera naskirin rakeve

Bi nasîn û zanîn dibî çavşiyar
Ji bo her kesî tu dibî şençeyar.



REWŞEN

Hunermenda hêja Rewşen xanim, bi nasnavê Diya Êva tê naskirin. Ew, di 1956-an de li Qamîşloyê çêbûye. Lê bi koka xwe ji gundê Şûzê ye ku niha li herêma Botan dimîne. Bavê wê Mele Ehmed, kurê Evdirehman Axayê kurê Şahîn Axa ye. Navê diya wê ji, Rehîmeya keça Slêman e. Bapîrê wê Evdirehman Axa, nivîsendeyê Selhilda-na Kurd a bi serokatiya Şêx Evdirehmanê Garîş bû.

Rewşen xanim ji eynî dê pênc xwişk û heşt birayên xwe, ji jînbavê ji sê xwişk û sê bira hene, li ser hevûdu 19 xwişk û biran in. Bavê Rewşen xanim, Mele Ehmedê Şûzî di 1938-an de ji Bakûr çûye Binxetê û li

Qamîsloyê bi cih bûye.

Rewşen xanim di 1980 yî de zewiciye û niha jî diya sê keç û du kuran e.

Hunermenda hêja di zaroktiya xwe de li Qamîsloyê dest bi dibistanê kiriye, xwendina orte û ya lîseyê li Helebê kuta kirine û di 1983-an de jî li Şamê Akademiya Wêne qedandiye. Di 1984-an de wê dest bi kar kiriye û bûye mamosteyê Xwendegeha Bilind a Mamosteyan, ta niha jî li karê xwe didomîne.

Rewşen xanim gava hêj zarûk bûye, ji kekkê xwe Seîd (Bavê Ciwan) fêrî çêkirina wêneyan bûye. Îcar çaxê ew mezin jî bûye, her wênevantî hilbijartiye û ji xwe re kiriye pîşeya sereke.


Xanima hêja ji aliyeckî ve rojê heşt saetan şixuliye, ji aliyeckî ve zarûk xwedî kirine û ji aliyeckî ve jî bi firçê tablo çêkirine. Îcar di rewşekê wilo de, gelo zeman jê re dimîne kubihna xwe berde û hinek rihetî bide ca-

nê xwe? Lê eger ew fedakarî û rika li pîşeti-yê ku para rihetiyê jê re nehiştibin jî, ne giringiyeke zêde ye ku mirov hewqasî li serê birame.

Gava ez çav bi tabloyên wê yên rengîn ketim ku ew cergê Kurdistanê di nava xwe de hênik dikan, bi şanazî ez serbilind bûm ku jinêna wisa hunermend jî li nêv me peyda dîbin. Ew her 15 tablo gelekî rind û pir jî balkêş bûn. Lê bi zehmetekî wisan giran çêbûne ku mirov bi çavên xwe nebîne, bawer nave. Jixwe gava min cihê tabloyan, ew qulika teng a tarî dît û tev li ser êk radiketin, ji aliyeckî ve ez li belengaziya wê ramiyam û ji aliyeckî ve jî li fedakariya wê sêwirîm. Di nava wan zehmetiyêen giran de, di wê rewşa xirab de û bi wan desthilatiyêن kêm ve derketina ji heqê kar, ne tiştekî hêsan e. Lê fedakariya zêde û cefadarî, li tu tişti nanîherin û kirina her karê zehmet jî bi mirov gelekî hêsan didine kirin.☞



Hunermenda kurd Rewşenê di nava tabloyên xwe de



Mustafa Düzgün

EMPEDOKLES

Empedokles (492-432) ji xelkê Girava Sîcîlya ye û di malbatek arîstokrat de hatiye dînyayê. Malbatâ wî di idara dewletê de xwedî hukum û berpirsiyariyek gelek mezin bûye. Heta carekê ew bi xwe jî di kar û barê dewletê de bêşdar bûye. Ewçend ku cimaet gelek pê qayîl bûye û xwestine ku wî bikin hukumdar jî. Lê wî ev pêşniyara xelkê nepejirandiye û neaniye cîh.

Her wiha ew mîna kesekî demokrat an mîna alîgirekî demokrasiyê hatiye naşîn. Wek hekîm, fîzîknas, gotarbêj û ewliyayekî xwedî sir û hêkmetan, di bajarên İtafla Başûr de geriyaye û maye. Ji ber vê çende gelek filosof û tarîxanê felsefê, li gel zanebûna wî, her wî mîna kesek qîr û virr (şarlatan) jî didin naşîn. Bo ku carna di sayıya ilimzaniya xwe de û carna jî di sayıya bikaranîna sîhirê de tiştên wesa kirine ku di çavê xelkê de mîna kesekî xwedî hêkmet hatiye naşîn.

Dî derheqa mirina wî de jî gelek tiştên bêçine têngotin. Hinek dibêjin; bo ku ew bikaribe xwe di çavê xelkê de mîna Xwedeyekî nemir û xwedî hêkmet bide nasandin, xwe avêtiye nav agirê Etnayê û bêşik şewitiye bûye xwelî. Li gor hinekan jî ev gotinê hanê ne rast in. Ew dema ku wek sirgûnekî siyasi di Peleponnesê de maye, her di wir de jîna xwe teva kiriye û çûye ser heqîya xwe. Anglo xwe neavêtiye nava agirê Etnayê. Qasî ku tê zanîn, di jiyyîna xwe de du kitêbên hêja nivisîne: Yek Di Derheqa Xwezayê de (Perî physeos) û ya din jî Paqîjbûn (Kart-

harmoî) e.

Empedokles di warê zanist, felsefe û dîn de gelek dîtinên balkêş û xwedî nirxek giranbiha pêşkêş kirine. Ew, di aliyekî de ser bi felsefa Parmenîdes e. Ew jî mîna wî, peydabûn û ji navderabûnê napejîrîne. Li gor dîtina wî tiştekî wesa nîne û nabe. Li aliyê din ve jî rûda û bûyerên ku em di sahiya hişen xwe de bi heyiya wan dihesin, wan; çawa xuyaniya rûdaya peydabûnê û ya ji navderabûnê dixwaze berpêş bike. Li gor dîtina wî, mefhûma nûzayînê an ya pêydarabûnê, di bingeh de, hebûna tevîhev-bûn a madeyên hîmdar tîne zimên. Ji navderabûn jî her daxuyana belawela bûna vê tevîhev-bûnê ye. Madeyên hîmdar ji çîvîn (partîkel) pir pir piçûk pêk hatine, bi wê çendê ku ev çîvîn evçend piçûktir êdî carêk din nayîn perçekirin û winda jî nabin. Empedokles wan wek Rîzomata panton, ango mîna kok û binyat a her tiştî binav dike. Ew çîvîn han, ango madeyên hîmdar an zayîndar ne ji tiştekî za ne, ne hê nûh peydabûne, ne ji nav de radibin û ne jî têr guhartin.

Ev madeyên hîmdar, ku di mekanekî de bi awakî serbest diherikin, li gor pîvanên matematîkî tevîhev dibin, tiştîn din û nûh pêk tînin. Giştîtî û guherana tiştan ji ber vê sedemê derdikeve tête pêş û mîna bûyerek berbiçav xwe dide xuyan.

Peyva element (unsur) mîna gotinek se-reke ne ya Parmenîdes e, wî bi awakî tay-betî ev bi kar neaniye. Lê wî jî av, hewa û agir wek sê elementên hîmdar an wek sê

madeyên zayîndar pêşkeş kirine; ku ev hê gelek pêş wî yet bi yet bi vê rola xwe ya di-yarkirî, ji aliyê filosofen Îoniayê ve hatibûn diyar bi nav kirin. Lê Empedokles tenê axê lê zêde dike. Lewma ew jî ji ber vê çendê mîna filosofekî sazkar ê Têoriya Çar Unsûrî tête zanîn.

Ev Teoriya Çar Unsûrî, paşê, di wan sedsalên dawiyê de, giraniya xwe di Felsefa İslâm de jî dide xwûyan. Li gor dîtinên Empedokles, ev çar madeyên bingehîn, mîna mefhûma hebûnê (Being) ya Parmenîdes, cewherên wesan in ku tucar nayîn guhirîn. Her weha di naveroka wan de jî ji bo tu tiştek an emareyek berbiçav nîne ku mirov wê an wan mîna qane û işareta herikîn a wan bide xuyan. Anglo ev elementên hîmdar, xwe bi xwe an bê têkiliya derve nikarin tevîhev bibin, bigihîn hevûdu, an ji hev veqetin?

Jî ber vê yekê divê prensîbek an hêz û imkanek din hebe ku bikaribe van çar elementan bîne ba hev, bi nav hev xîne an ji hev de bike. Li gor dîtina Empedokles ev, hez û nefret in.

Bi vî awayî Empedokles, ev madeyên hêzîn ku ji madeyan an ji madeyên bingehîn tiştîn din û nûjen pêyda dikin, cara pêşin e ku ji hev cihê dike. Lê belê Empedokles bi vê dîtina xwe ve, dîtinên beriya xwe an ya filosofen Îoniayê dide alîkî û rêçek nûh vedike. Ji ber ku li gor dîtina filosofen Îoniayê û her li gor hylozoîzma wan ev tiş jî hev cihê nedibûn, tim bi hevre bûn, ango ji hev qete nebîbûn.

Wek Prof. M. Gökberk di kitêba xwe ya Felsefe Tarihi (Tarîxa Felsefeyê, r.45) de kurteyek ji dinyabîniya Empedokles dide xwûyan:

“Giş bûn û bûyerên kaînatê, berhemên şerê navbera ev herdu hêz ên palpêdan in. Evhez û nefret in; him ji aliyê heqdariyê ve him jî ji aliyê bîhéziyê ve her mîna hev û du ne. Lî çi heye ku di vî şerê navbera wan de carna hez û carna jî nefret bi ser dikeve. Ku di kaînatê de hukum dikeve destê nefretê, unsûrên bingehîn ji hev dûr dikevin û serdema belawelabûnê dest pêdike. Di vê serdemê de hez dipeke dikeve navbenda (merkez) kaînatê. Di pişt re serdemek hatîye ku hez bi ser ketiye, vêga her tiş di nava yekitiyekê de kom bûye û nefret jî xwe kişandiye qeraxek kaînatê. Ji ber vê dor bi dor biserketina hez û nefretê, kaînatê çar qirne derbas kirine. Tiştên yek û yek di qirna duhemîn û çaremîn de derketine holê, ku di wê demê de nefret bi ser ketibû. Ji ber vê çendê ev serdem, bûn serdemên jî hev belavbûn a hebûnên tevlihev.”

Empedokles di derheqa mirov de jî serê xwe diêşîne û sîbera dinyabîniya wî dikeve ser vê meseleyê jî. Her di vî warî de jî xwedî dîtinek balkêş e. Dibêje xwîn, ji bo jîna mirov tiştekî bingehîn e. Her wesa di sayiya wê de dikare bifikre û xwîn navbenda fikirkirin a mirov e. Ev çar elementên ku her tişt jî wan sadir bûye, ew di xwînê bi xwe de bi awakî çê û têkuztir gîhane hev û du. Jixwe mustava aqlmendiya mirov girêdayî bi vê têkuztiriya pêkhatina xwînê ye. Bo ku

di xwînê de ev giş element civiyane, lewma jî mirov dikare bi her tiştî bizanibe.

Rast e, Empedokles bi vê gotina xwe ve tu sînorekî diyar daneniye pêsiya zaniyarî ya mirov. Ango pêşî li fikirkirina mirov negirtiye, nagire. Lî çi heye ku li ba hev hatin an bi hev gîhan û tevlihevbûna unsiran (element, madeyên bingehîn) di her kesî de ne wek hev in, cihê cihê ye.

Li gor Empedokles, dar û ber, giya û şînahî organîzmayen pêşin nin û mîna heywanan her ew jî bi can in. Ew fêkiyên dar û beran bo ku bikaribin mîna heywanan neslê xwe bidomînin û biparêzin, belgên wan dews û rola tukên lawiran (heywanan) temsîl dikan. Empedokles wesa fikir dike. Her weha dibêje, hebûnên bican di serdemên şerê navbera hez û nefretê de, bêrêz û ne rêk û pêk derketine holê. Di nav wan formên xwedî can de, yên ku kêtî tiştekî hatine, kanîne heya vê serdema me heyiya xwe biparêzin û bimînin.

Li gel dîtinên wî yên felsefi, ew di derheqa xweza û pizîşkî (tib) de jî xwedî fikir û dîtinên zanistî ye. Bo mînakî, cara pêşin Empedokles, hewa mîna cewherék taybetî pêşkêş kiriye. Di vî babetî de wesa dibêje:

“Em fikir bikin ku keçikek, saeta avê ya bafûn û biriqî girtiye destê xwe û bi wê dileyîze. Ku bi destên xwe yên xweşik dev li tûpê bigire û wê saeta avê di avê de ber de; tê dîtin ku hewaya ku di nava tûpê de ye, erişê kunikên tupê dike. Lî keçik pêşî li hewayê digire, rê nade ku av bikeve hindûrê tûpê. Ku keçik rê bide tazîika hewayê (an-

rand Russell, Batı Felsefesi Tarihi-Antik Çağ, 1969, İstanbul, s.131).

Empedokles vê mînakiya xwe, ji bo ûzahkirina bêhnvedan û bêhngirtinê (nefes dâyîn û nefes girtin) bi kar tîne.

Li gel vê yekê Empedokles, di derheqa hêza merkez-çend de ji hinek zaniyariyên hewce derdixe rû û ji bo qanekirina téoriya xwe ya merkez-çendê gelek mînakiyên bal-kêş pêşkeş dike.

Empedokles di warê ezmannaşî (Astronomî) de ji gelek tiştên calib pêşkeş kirine; ku ev dîtinên wî, piştî mirina wî, di serdemên paşiyê de, pêşdebirina zanistê astronomî de dibin xwedî rol û girîngiyek mezin.

Li gor dîtina wî, heyy bi xwe şewle nade û bê ronî ye. Ew, roniya xwe ji derek din distîne. Ro bi xwe ji her wesa ye, ango ew ji roniya xwe ji derek din distîne. Dîsa Empedokles dibêje, bo ku tîrêj an şewle bikaribe ji cîhekî derbasê cîhekî din bibe, divêwext jê re hebe. Lê ev wext, evçend kurt e ku em nikarin wî bihejmîrin. Heyv ku ke te navbera dinya û tavê roj têgirtin.

Empedokles di warê bîr û baweriyên dînî de wek Pythagoras difikire an pêyrevê wî ye. Ew di birek nivîsa xwe de -ku dibêjin bi êtimal di derheqa Pythagoras de ye-wesa dibêje:

“Di nav wan de zanayek herî bilind hebû Xwedî xezîna fîkrî ya herî mezintir, pir çêtir jê fêm dikir, ji hemû cûrên karê zanatiyê.

Bi qewet û qudraeta aqlê xwe ve, ku derdiket jor (ango ezman-MD) dibû

Hebûnên heyî bi hêsanî yek bi yek didîtin

Ta berê dehemîn û bîstemîn (neslê) mirovan.” (Walther Kranz, Antik Felsefe, s.43)

Empedokles hinek tişt û kirinan wek gunehêن pir giran dihesibîne. Dibêje:

“Xwelî li serê min be! Xwezi, ew roja mirinê ya bêrehm, hê ku min bi van lêvên xwe tiştên xerab negotibin, bila bataba!”

“Ji belgên defneyê dûr bisekinin.”

“Hemû lobiya, heyiyêن pir qirêj û pîs in û divê mirov tim xwe ji wan biparêzin.”

Platon vê dinyayê mîna şikeftekê dide xwûyan. Merema wî ne ew e ku bi vê mînakiya xwe, her vê dinya berbiçav a ku em tê de ne, wê mîna dinyayek rasteqîne pêşkeş bike. Bo ku ev dinya ku em têde dijin, ev ne ya rasteqîne ye. Di rastî de ev, wek siya dinya rasteqîne ye. Ev bîr û bawerî, ta pêş Platon, cara pêşin ji aliyê Empedokles ve hatîbî eşkerakirin. Her ev bi xwe ji derdixe rû ku Empedokles bi xwe ser bi bîr û baweriya Orphîzmê ye.

Empedokles alîgirê giştîtiyê ye, piştgiriya wê dike, wê diparêze; li gel vê yekê ew diji yekhebûniyê disekine û wê napejîrîne. Ji ber vê çendê siyasetzanên hevdem wî wek zanayekî demokrat pêşkêş dikin.

Li gor Empedokles herika xwezayê ber bi mebest û armancek taybetî nîne; ew ser bi şans û hewcetiyyê ye. Wek Bertrand Russell

dibêje, "Ji ber vê yekê felsefa Empedokles ji ya Platon û Arîstoteles bêtir zanistû ye..." (Batı Felsefesi Tarihi-Antik Çağ, s..135)

Ji Manzûmeya Paqîjbûnan:

Di qeraxa Akragasê de ev bajarê mezin ê ku ber bi kelehê bilind dibe

Lawo hûn dostên ku di wî de dijîn, bo ku ji bo kirina tiştên çêtir fikir kirine

Di cîhêن pîroz ên ku biyanâ tê de sitar dibin ku di wan deran de xirabî nayê kirin.

Silav ji we re! Ne di nav we de mîna Xwedêyek nemir, wek însanek

Digerim û giştî ji min re hûrmet dikin, xwe wesa nûşê wan didim.

Bi tixbendan(1) û bi qevd qevd (gulîlkên teze ve) çelengan ve hatine xemilandin.

Ku linga xwe davêjim bajaran, qedra min radigirin

Çi jîn ci mîr. Hezaran kes li dû min di-bezin

Ku ji min bipirsin ka çiye riya selametê, hinek ji wan daxwaz dikin kahîniyê, yên din ji dipirsin

Bo ku ji derd û kulên xwe yên cihê cihê re çare peyda bikin.

Ji ber ku demek dûr û dirêj sebir kirine xencera derdan ya tûj re.

(B 112)

Gelo çîma ez bi wan re mijûl dibim, mîna kesekî karêñ mezin mezin kirî

Ku ji van kesen wê bimirî û ji felaketek derbazê ya din bûyî, bilinditirim. (B 113)

Dostino, dizanim rastî heye

Di van gotinêñ min de; lê belê gelek zehmet e

Ji bo însanan, pêbawerbûnê bi zorê dixin rihan.

(B 114)

Gotinek Qederê heye, ku hukmek kev-nare ya xwedêyan e,

Ebedî û sondxwarinêñ bi mohir kirî ve,

Ku kesek şaş kir desten xwe xistin xwîna mirovê kuşti

Got çawa nebe pevçûn e, sondek dere-wîn xwar

Mîna daîmonan(2) ku jînek dirêj ketiye para wan

Ango sê car deh hezar sal (3), ew ê ji bex-tiyaran dûr bigerin

Di vê demê de ji donek (qilixek) dikevin donek din ê mirînan dibin

Û di rîyêñ cihê cihê yên jiyanê yên bi meşeget de dimeşin.

Ku wesa nebe zorê hewayê dide dû wan û wan dipekîne davêje behrê,

Behr ji wan tifê binê erdê dike, erd ji wan ber bi şewleyêñ biriqî yên Ro

Û ew ji wan davêje nava bagerêñ hewayê;

Axir ev davêje wî û ew davêje yê din, lê belê giştî ji jê nefret dikin.

Ez ji niha yekek ji wan im, serseriyek ku xwedê ji dergehê xwe avêti,

Ta ji dema ku min êminatiya xe bi kînê anîbû pêde.(B 115)

(Ku rihê Empedokles pekiya hat kete er-dê, vêga xwedêyêñ mî ji wî re bûn heval. Ev wesa dibêjin:)

Em hatin gîhan vê kûn a sergirtî... (B

Ku min ev cihê biyanî dît kuriyam qîriyam. (B 118)

Çi serbilindiyek ezîm, ci bextiyariyek mezin bû

Ku mixabin me cîhişt, em hatin ketin ser rûyê zemîn! (B 119)

Di wextekî de ez bûm lawik, keçik û sîcîkek,

Bûm teyrek, bûm masiyek bê ziman ku ji behrê xwe hilavêt hewayê. (B 117)

(Eh divê demek dûr û dirêj ez ê li vir bîmînim) di vî cîhê nexweş de,

Ku kuştarî, kîn û gelek keriyên din ên cînan,

Nexwesiyên hişk, genî bûn û êşen bi rîm

Digerin di tariyên merga felaketê ya vî welatû de. (B 121)

.....

Ji Manzûmeye Xweza yê:

(Hez û nefret hêzên bê serî û bê dawî ne û ev elementan tiz dikin.)

Wesa dizanim; berê çawa bû, ew ê her wesa bibe,

Ev zemana bê serî û bê bin nikare bê wan bibe. (B 16)

Ez ê tiştekî bibêjim: Carna tiştek tevîn peyda dibe

Ji gelek tiştan, carna jî pir tiş diqedin ku ji «yek» cihê bûn.

Du qolî ye zayîna tiştên mirînî û her du qolî ye jî nav de rabûna wan.

Ya yekê jî kombûna giş nesneyan peyda

dibe û jî nav de radibe

Ya din jî, ku ew belawela bûn, kemîlî be jî winda dibe diçe(3).

Ü ev diguhurin û disekekin bê fasile.

Carna di sayiya hez de kom dibin dibin yek hemû tiş

Carna jî ji hev diqetin yek bi yek ji ber kîna nefretê.

.....

(1) Di zimanê Hellenî de dibêjin taînîa, ku mîna sembola rûmet nîşandanê li serê yekî ve girêdidin, şerîtekî ye (tixbend). Gel, hekîm Empedokles wek Xwedê dizane. Lê çawa ku di bira duwemîn de jî tê xûyan, ew, guhnade vê dîtina xelkê.


(2) Daîmon: Ne mirov û ne jî Xwedê ne, riheñ navbera mirov û xwedêyan de mayî ne.

(3) Di vir de mebest ev e ku «Yek» perçê dibe û gelek tiş jê sadir dibin, her weha ev parçê têna ba hev û bi vî awayî dîsa diçin digihîn «Yek». Her ev gotin, du serdemên pêkhatina kaînatê jî tînin bîra mirov.

Nivîsên Mustafa Düzgün yêni li ser fel-sefê di nêzîk de mîna pirtûk derdikeve

HEVPEYVÎN BI CAN YÜCEL RE

Firat Cewerî



Can Yücel

Di meha Çiriya Paşin ya 1994'an de bi navê Projeya Derya Reş ji sî welatên cihê çarsed nivîskar beşdarî gereke Derya Reş bûn. Ev gera ku bi giranî ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Swêdê ve hatibû amadekirin,

mîna yek ji projeyê nivîskaran ya herî mezîn hate dîtin. Cihê hevduđitina nivîskaran Atîna bû û ji wir jî bi keştiyê tûreke sê-çar welatân; Ukrayna, Bûlgarîstan, Romanya û Tirkîye çêbû. Di nava vê rîwîtiya dehrojane de zêdeyî deh nivîskarên tirk ji beşdar bûbûn. Me ji hemâ ku fîrsend didît, bi nivîskarên tîrkan re li ser pîrsa kurdan û pêşeroja Tirkîyeyê sohbet dikir. Di van sohbet û gotûbêjan de min ferq kir ku guhertineke ecêb di nivîskar û rewşenbîrêñ tîrkan de çêbûye. Mîna ku wan hebekî xwe ji îdeolojiya Kemalîzmê şuştine û êdî li dû azadî û masfîn mirovan in. Herweha ew amade ne ku bi nivîskar û rewşenbîrêñ kurdan re têkevin diyalogê. Di danûstandinêñ deh-donzdeh rojan de ci Can Yücel, ci Orhan Pamuk, ci Vedat Türkali, ci Arif Damar, ci Feridun Andaç li hember pîrsa kurdan pir ji dil xuya dikirin.

Em ê beşa yekê ya vê rîzehevpeyvînê ji Can Yücel dest pê bikin. Di hejmarêñ pêş de ji hûn ê hevpeyvînêñ bi Vedat Türkali, Arif Damar, Orhan Pamuk û hwd. re bixwînin.

F. Cewerî: Ez pêşî dixwazim nêrîna te ya di derheqa vê rîwîtiyê de bipirsim. Bi ya te ev rîwîtiyeye çawa ye? Ma tu bi serketî dibini?

Can Yücel: Tu ya rastî bixwazî ez bawer nakim ku tu rêuwîtiyên wilo qerebalix bi serketî bin. Lê belê bi sînor be jî mirov dikare bibêje hebekî bi serketî ye. Qet nebe ji bo min. Ji ber ku min gelek kesên nû naskirin. Min hin ji Swêdê nas kirin ku niha şîfrên min werdigerînin. Lê gava mirov bi tevayî lê dinihêre, hinek ji wan polîtikvanên hunerê, an jî teknokratên hunerê ne, hinek jî ji welatên kevne sosyalist in, ku ew jî tradisyonike wan ya li dijî komunîzmê heye. Li vir jî li ser wê polîtikayê dîkin.

- *Gelo te firsenda muneqeşeyê bi nivîskarên ku ji welatên kevne sosyalist; mîna bulgariyan, rûsan, ukraniyan û hwd. re dît? Di derheqa wan de te çi fikir bi dest xist?*

- Ez nizanim bê rûs jî hene?

- *Erê, delegasiyonek ji Rûsyayê jî hatiye.*

- Min nizanîbû. Lê ew jî tê de, ev di hundurê kirîzeke weha de ne ku hemû peyvên wan di derheqa antî komunîzmê de ne. Ew ji derveyî wê jî tiştekî din nafikirin. Hemû ewqas şoven bûne, jê pê ve tiştekî nabînin. Em çûn Odessa'yê. Odessa bajarekî Ukrayniyayê tê hesab. Ya rastî Odessa bajarekî tataran e. Ü ger li mafê mirovan û yê etnîk were pirsîn, ev der Kirim e û bajarê tataran e. Du dêrêن yunaniyan hene, te dît me bi hev re çû ziyaret kir. Erê, dêrêن yunaniyan hene, lê min tatarek jî nedît. Madem ew ji Stalîn hêrs dibin, bi heq nebiheq Stalîn tatar maliştin, ew jî ji ber ku tataran di dema şerê cîhanê yê yekemîn de piştgiriya Nazîstan kiri-bû, Stalîn jî hêrs bûbû, ew bi zar û zêçen wan ve paqîj kiribûn. Ev jî rast e, ne rast e, mirov

dikare li ser vê jî munaqeşe bike. Lê ger iro em li rastiye bigerin, divê Odessa ya tataran be. Ez û tu bi hev re li Odessayê geriyan, ma me tatarek jî dît? Yanî ger li mafê her kesî yên milî were pirsîn, divê Odessa bibe bajarekî tataran.

- *Hîn ku gotin hatiye ser mafênet neteweyan û problemên etnîk, ez dixwazîm vê bi pirsa kurdan ve girê bidim. Mîna tu dizanî ji si welatên cihê, nêzîkî çarsed nivîskar besdari vê gerra Derya Reş bûne. Di nava van çarsed nivîskaran de sê nivîskarên kurd jî hene. Gelo tu vê çawan dibinî.*

- Ez vê yekê baş dibînim. Di nava vê qerbalixa nivîskarên dînyayê de hebûna nivîskarên kurd jî tu bêjî nebêjî baş e. Ez ji mêj ve nêzîkî pirsa kurdî me. Ez mafê kurdan ne mafekî etnîkî, lê ez "self determinationê" diparêzim. Lê ev bi hevdudîtin û peyy û munaqeşeyê çêdibe. Ger li ser vê pirsê neyê peyivandin, ez bawer nakim ku ev pirs were çareserkirin. Ez bawer im ku kurd li Tirkîyeyê mafê biryara xwe bistînin, azadiya fîkr û peyivandina xwe bi dest bixin, wê nexwazin ji Tirkîyeyê veqetin. Lê ger ev neyê ceribandin û qedera kurdan tirk biryar bîdin, şas e. Li Lozanê biryarek hatiye dayin, ew ne emrekî Xwedê ye ku neyê guhertin, ger qanûna ku Xazî Mustefa Kemal derxistibû, hatibe guhertin, ev wê nişan dide, ku ne emrê Xwedê be dikare were guhertin. Biryara Lozanê, tenê ber bi parastina mafê hindikahiyêne musulman ve çerîxi, bi min ev biryareke şas e. Ev cihêyiya biryara konferansa Lozanê ne ku nayê guhertin, ev dikare were guhertin.

- *Baş e, wê çawan were guhertin? Ji bo guhertina wê divê çi were kirin?*

- Mesele, berî niha bi demekê konferanseke navneteweyî di derheqa hindikahiyan de çêbûbû. Ji Tirkiyeyê ji wezirê dervekarî Mümtaz Soysal ji besdar bûbû. Wî di wê konferansê de gotibû ku li Tirkiyeyê mafê etník di dema Lozanê de hatine çareserkirin û li welatê me problemeke wilo tuneye. Di vê konferansê de, ew welatênu ku besdarî konferansa Lozanê bûbûn, îtiraza xwe anîne ziman. Ez bawer nakim, ew welatênu ku îmzeyên xwe avêtine binê peymana Lozanê, li dijî bidestxistina mafê kurdan derkevin.

- *Lê xuyaye bi tenê Tirkîye, ku wê ji imze avêtiye binê peymanê, li dij derdikeve.*

- Erê.

- *Li Tirkiyeyê hem partiyên di iktîdarê de, hem ji yên muxalefetê di pirsa kurdan de di eynî nêri-nê de ne. Gelo ev ji ber ci wilo ye?*

- Ger tu bala xwe de bidiyê, hemû ne di eynî nêri-nê de ne. Peyayê ku îro serok cumhûr e, gava ku serokwezîr bû, digot, ez realita kurdî nas dikim, lê niha hatiye guhertin.

- *Ma bi rastî ew realîta kurdî qebûl dikan, nas dikan?*


- Yanî wê çaxê nas kir. Turgut Özalê ku li dû hin hesaban bû, wî ji nas kir. Ew mir, yên ku pişti wî hatin ji eynî ne.

- *Gelo bi naskirina nasnav an ji realiteya kurdî ci tete fehmkirin?*

- Wele tu dikanî vê pirsê ji Süleyman Demirel bikî. (Em herdu ji dikenin.)

- *Lê belê li navê rastiyek heye, problemek heye, pirseke kurdan heye, her ku diçê ji ev pirsa han germir dibe, êdî ji pirsa dewlet û xelkê kurd derdikeve, berberiya herdu gelan; gelê kurd û tirk dest pê dike. Em îro dîbinin ku li gelek deverên Tirkiyeyê organîzasyonên ekstrem yên rast xurt dibin, ev yeka han dikare bibe sebeba rijandina gelek xwîn. Gelo ji bo ku mirov pêşî li vê yeka han bigire û vê problemê bi riyen aştî çareser bike, bi ya te divê ci were kîrin?*

- Ji bo pêşî li vê yeka han bête girtin, di gava pêşî de divê hebûna miletékî bi navê miletê kurd were qebûlkirin û naskirin. Û bi destxistina mafê kurdan ji dikare li ser vê naskirinê were avakirin. Lê destpêka vê dikare qet nebe bi bidestxistina mafê kultûrî dest pê bike. Mafê perwerdeya bi zimanê kurdî, avakirina enstitû û sazgehêن kurdan... Digel vê, di rojêن pêş de dozeke gelê kurd ya mezin heye. Ev ji di hundurê projeya GAP'ê de tayina qedera tirkan e. Ev tayin, tu dixwaze bibêje etník, tu dixwazi bibêje millet, lê ev çareserkirina problema mirovîn ku xwe cihê dibînin, xwe bi serê xwe dibînin e. Divê mirov li rêne hevgîhîstinê bigere. Ger mirov li van riyen hevgîhîstinê negere wê ci bibe? Wê dewlet bixwaze ji bo ku xelk alîkariya lojistîk nede gerîla gundan vala bike, gundan bişewitîne, wê gundî bi ku de herin, ew ê ji werin li bajaran bi cih bibin. Gava ew werin bajaran, ew bê mal in, bê kar in, û ji aliyê din ve rastêن tirkan tijî dibin, wê berberî û şerekî vekirî li her derê Tirkiyeyê, di nava kurd û tirkan de dest pê bike û gava ku li bajaran şerekî



wilo dest pê bibe, gelo wê çaxê dê Tirkîye têkeve ci rewşê? Ev tê wê manê ku wê Tirkîye winda bibe. Ê li vir pirs ci ye? Divê riyekê aştiyê peyda bibe. Ew riya aştiyê ji naskirin û qebûlkirina kurdan e û herweha li ser vê naskirinê azadbûna kurdan e. Mîna ku tu jî dizanî, Tirkîye pereyekî ecêb li vî şerê hundur xerc dike. Ji xwe piştâ Tirkîyeyê di bin deynên hundur û derve de wilo tewiyaye ku ew dike têk here. Berdewamiya şerekî wilo, dawîhatina ekonomiya Tirkîyeyê ye.

- *Ê baş e, digel ku pirs evqas cidî ye, hîna jî li Tirkîyeyê hînek siyasetvan, hînek rewşenbir, hînek alim û zimanzan hebûna kurdan qebûl nakan, wan tirk dibînin, zimanê kurdî zaravayekî zimanê tirkî dibînin, gelê kurd ji tîrkan dibînin. Gelo ev ji ber ci tê? Ma bi rastî ew nîzanin ku kurd hene, zimanê kurdî cihê ye; kurd xwedîyê kultureke cihê ne?*

- Ev ji fikra Mustefa Kemal ya ku hema em ji

dewleta Osmanî ci xelas bikin, û em ê vê bi dewleteke neteweyî ve girê bidin, tê. Lê ew fîkir bi ser neket. Niha, pirsa dewleta neteweyî bi cidi di çerçeweya eyaleta federatîf de divê dîsan li ser bête fikirandin ku ew sînorêni mîsakî-mîlî yên ku Xazî Mustefa Kemal kişandibû, xerab nebe. Li vir, bi perspektîveke fireh, bi seriyeğî vekirî, bi tolerans divê em vê di çav re derbas bikin, û di vê çerçewê de kurd bigihîjin hemû mafêñ xwe. Ger karbidest destêñ xwe bi lez negirin û vê yekê nekin, xerabiyêñ mezin li pêşîya Tirkîyeyê ne.

- *Kî ê bîra vê bibin? Kî ê bixwazin xwe bidin ber çareserkirina vê pîrsê? Rewşenbirêñ welêt, partiyêñ siyasi, iktîdar, muxalefet; kî?*

- Niha, hê li Tirkîyeyê nasnava kurdî nayê qebûlkirin, tu ji min re behsa çareserkirina pirsa kurdî dikî. Divê li Tirkîyeyê pêşî ronakbîr gavan biavêjin. Ronakbîrêñ ku dikarin bifikirin, bi rûmet in, ji welatê xwe hez dikin. Seyr

e, li Tirkiyeya ku di her warî de Emerîkanîzm lê hakim e, bi navê li dij Emerîkayê derketin, vê pirsê bincil dikan. Ger ev wilo here û em li ser vê pirsa ku li Tirkiyeyê pirsa herî girîng e, nepe-yivin, siyasetvan nexwazibin vê pirsê bi riyeke aştî çareser bikin, wê di pêş de şerekî hê dijwar-tir dest pê bike, wê xwîn biherike û wê ev ne li fêda Tirkiyeyê, lê wê zerareke gelek mezin bigi-hîne gelê wê. Herweha wê gelê kurd jî vê zerara mezin bijî û wê hingî bi hev re jiyanâ herdu gelan zehmet bibe. Lê ger îro nivîskar, tenê ji bo ku behsa vê pirsê dikan werin girtin, li nava ku-çe û kolanan werin kuştin, wê çawa ev pirs çareser bibe? Ev ne bi tenê ji bo we kurdan wilo ye. Ev ji bo me nivîskarên tirk jî eynî ye. A niha, ez di rojnameyekê de nivîseke ku piştgiriya xwe ji gelê kurd re nîşan bidim, binivîsnim, ez di çavên dewletê de terorîst im. Yanî ferqa min û ferqa gerîlayekî ku sîlah di dest de ye, namîne. Berî herî tiştî divê demokrasiyeke rastîn were Tirkiyeyê. Divê azadiya gotinê were Tirkiyeyê, qanûnên hilbijartînê werin guhertin, qanûn were guhertin, divê ev qanûna bi terorî re tê-koşîn rabe ku, îmkanîn kesen ku ji piraniyê ci-hê difikirin û gotinê were holê.

- *Tîşît xuyaye, dî rewşa îro de, gava ku sîleh bipeyîvin, destpêkirina diyalogê ne hêsan e. Gelo bi nêrîna te, ji bo ku ev sîleh rawestin û rojekê berî rojekê diyalog dest pê bike, dîvê ci were kirin? Yanî ji bo ku diyalogek dî navbera gelên kurd û tirk de dest pê bike, dî navbera rewşenbirê kurd û tirk de dest pê bike û dî navbera siyasetvanîn kurd û tirk de dest pê bike, dîvê mirov ci bike?*

- Wele, îro zehmetiyeke mezin heye. Berî her tiştî, divê biryareke agirbirrê were dayin,

baş e, lê gorî ku dewleta tirk, yê ku li dijî xwe şer dike, mîna eşqiya ilan kiriye, tê vê maneyê ku dewletek wê nikanibe bi eşqiyan re rûne. Yanî wê çaxê, wê ev agirbirr ne duhêl be, lê wê agirbirreke yekhêl be. Ev jî tê wê maneyê ku ri-ya agirbirrê girtî ye. E ji xwe agirbirr bi vî awayî çenâbe. Piştî ku agirbirra berî niha bi çend salan xera bû û bi vir ve, rewş xerabtir bûye, hemû riyên diyalogê hatine girtin.

- *Di eslê xwe de mijara hevpeyîna me wê zi-man û edebiyat bûya. Lê ez dînihêrim ku ji edebiyatê wêdetir, sohbata me ber bi siyasetê ve diçê. Ez bawer im ev jî ji ber ku em hê jî, di vê sedsala bîstan de bêt ziman in. Hê jî mîna ku tu jî pê di-zanû, li Tirkiyeyê zimanê kurdî qedexe ye, kurd nikanin bi riyên fermî zimanê xwe bi kar bînin, kovar û rojnameyên xwe bi azadî û bêtirs derxin, kanalên xwe yên radyo û televizyonan li dar bi-xin. Ji ber van sedeman e, ku em hema derbasî si-yasetê dibin.*

Îro, gelek rewşenbirê tirkân, gelek serok û bî-rêvebirê partîyen siyasi; hem yên li iktidarê, hem ji yên muxalefet, dibêjin, bila li Tirkiyeyê terorîzm raweste, em ê hingî dest bi munaqşeya vê pirsê bikin, em ê hin maşen kurdan yên demokratik û mirovî bidine wan. Bi ya te ev fikreke ga-wan e?

- Heq ji jor ve, tenê bi biryaran nayêن dayin. Ger heq muşterek bin, wê çaxê heq par ve di-bin. Gava hukûmeta tirk dibêje bila teror raweste û ez ê paşê heq bidim, qet baweriyê nade min, hişê min nagihîje vê mantiqê.

- *Îro, gelek partî û rêkxistinîn kurdan û herve-ha gelek şexsiyet û rewşenbirê kurdan jî dibêjin,*

em niha Kurdistanike serbixwe naxwazin, lê di bündurê sînorê Tirkîyeyê de, gelê kurd were qebûl kirin û mafê xwe yê bikaranîna zimên, vejandina çanda xwe û her celeb mafen xwe yên mirovî bi dest bixin. Bi gotineke din, li Tirkîyê tirk xwediyê ci bin, kurd jî mîna kurd bibe xwediyê wê. Weki din jî hin pêşniyazên otonomi, federasyon û hwd. ji cepheya kurdan tê. Lê belê, ji cepheya tirkan jî, dibêjin, ger em iro zimanê wan bidin wan, ew kultura xwe bi pêş bixin, wê sibe jî doza Kurdistanike serbixwe bikin. Gelo tu dî vê derheqê de ci difikirî?

- Ez bawer im, ger iro kurd Kurdistanike serbixwe bixwazin, divê xwe gelekî organîze bikin, lê belê ev şerekî dûr û dirêj dixwaze û ez pêşeroja vê fikra han jî rohnî nabînim. Ji ber ku belavbûna kurdan ya li seranseri Tirkîyeyê vê nîşan dide. Yanî li gor hesabênu ku iro têne kirin, kêm-zêde ançax li Kurdistanê çar milyon kurd mabin. Yen din jî li hemû Tirkîyeyê belav bûne. Niha, di rewseke weha de xwestina otonomiyê, çawa ku mîna li İsrailê bû û ji her derê dînyayê cihûdan berê xwe dane İsrailê, divê hemû kurdên ku li nava Tirkîyeyê belav bûne jî, vegerin Kurdistanê. Yanî ev otonomiya ku ji kurdan re were dayin, bi qasî ku wê sînorêne wê teng bin, wê ekonomiya wê jî ewçend qels be. Bi ya min kurd dixwazin bi tirkan re li hev bikin, ev pêşniyaza kurdan red dibe.

- Iro li Tirkîyeyê hêzek an jî partiyeke ku bixwaze bi kurdan re rûnê heye?

- Mesele iro partiya Refahê hin pêşniyazên nerm tîne. Turgut Özal jî hin tişt digotin. Süleyman Demirel ev dît, Erdal öönü dît.

- Gelo Sosyaldemokrat dî vê derheqê de ci difikirin?

- Iro sosyaldemocrat li Tirkîyeyê qet tiştikî naflakirin.

- Tiştê xuyayî di navbera partijen kurd û tirkan de diyalog tune ye. Gelo diyalogek di navbera rewşenbirêne kurd û tirkan de dest pê bike, wê ci tesîra wê ji hatina demokrasiyê û çareserkirina pirsa kurd re çêbibe.

- Berî her tiştî, divê hebûna zimanê kurdî ji aliye hemû rewşenbirêne tirkan ve were qebûlkerin û kurd jî bi riya bikaranîna zimanê kurdî di pratîkê de nîşanî hem rewşenbirêne kurdan, hem jî raya giştî ya Tirkîyeyê bidin. Yanî divê kurd bi riyê zanistî zimanê xwe bicivînin, gîmerekî bingeh amade bikin, ferhengêne bingeh amade bikin, enstitû û akademiyan ava bikin û di wan de karêne zanistî bidomînin. Yanî divê dîroka ziman û kultura kurdî bêî ku zêde bête mezin kirin, bêî mubalaxa, bi rûyê rastûn têkeve ortê. Ha, divê rewşenbirêne kurdan ji vê bi rê bikevin, hem di warê navneteweyî de, hem jî li Tirkîyeyê nîşan bidin ku zimanê wan zimanekî kevin û yê nivîsandinê ye. Ev jî, ji bo ku nivîskar û rewşenbirêne tirkan ji vê haydar bibin, şâir û nivîskarêne kurdan şîr û kurteçirokêne xwe di kovarêne tirkan de biweşînin, da rewşenbirêne

- Gelo ev xwesteka kurdan jî aliye kîjan hêzê ve tête redkirin?

- Wele ev ne tiştikî ku mirov bi gotinekê bersivîne.

tirkan wan nas bikin, bibînin ku zimanê kurdî ji mîna zimanê îngilîzî, pê helbest û bi tevayî edebiyat tête nivîsandin. Lî, wê mîna xelkekî ku tê pelçiqandin, problemên devok û zaravan derkeve. Gava mirov bi awireke gelempêrî lê dinihêre, mirov dibîne ku li Tirkîyeyê du zaravayê kurdî hene. Yek jê kurmancî ye, yek ji zazakî. Zaravayê zazakî, li gorî ku ez dizanim ji aliyê sedî panzdehêne kurdan tête peyivandin. Herçî zaravayê kurmancî ye, li nava kurdên Tirkîyeyê zaravayê mezin e û piraniya kurdan bi vî zaravayî dipeyivin. Yanî, gava rewş weha be, jihevtêgîhiştina kurdan ne ewqas zehmet e. Piraniya caran ji cepheya tirkan tê gotin ku ev hevdu fêhm nakin, ger em kurdî serbest bikin ji wê hevdu fêhm nekin. Bi ya min ev behane ne û kes bi van behaneyan ji naxapin. Di vê çerçeweyê de, kurmancî û zaza dikarin li hev bikin û bi zimanê xwe perwerde û weşana xwe bikin. Ev, nayê wê manê ku wê zaza ji heqê xwe bêpar bimînin. Ji xwe gava destûra bikaranîna zimên were dayin, her ku here wê ferqiyeta di navbera zaravayan de ji kêm bibin û wê dawî ji hev tê bigihîjin. Yanî yekkirina van zaravayan nebêîmkaniyek e. Li Tirkîyeyê yek ji pirsa paşeroja medreseyên kurdan e. Medreseyên kurdan bi sedsalan e mîna sazgehêne pir bi bingeh dixebeitin. Di hundurê van medreseyan de di çerçeweyâ îslamê de ji bo danasîn û belavkirina nasnava kurdan gelek xebat hatine kirin. Di van medreseyan de bi xwendina dînê îslamê re klasikên kurdî ji dihatin xwendin.

- İro, li welatên Eurûpayê mirov dibîne ku danûstandinek di navbera rewşenbirêne kurd û tirkan de heye. Ev dibe ku ji ber tesîra demokrasiya Eurûpayê be ji. Gelo li Tirkîyeyê danûstandineke

weha di navbera rewşenbirêne kurd û tirk de heye?

- Erê, komek hevalêne me yên kurd hene. Komêk şâîrên me yên bi eslê xwe kurd hene. Qis-mek ji wan miriye.

- *Tu ê bikaribî navêne bin şâîr û nivîskarêne bi eslê xwe kurd bidî?*

- Yên mirî?

- *Hem yên mirî hem ji yên ku dijîn.*

- Erê, ez dikarim navekî du navan bidim. Mesele Cemal Süreya kurd bû. Niha Murathan Mungan kurd e. Tu kes iro ji bo ku Murathan Mungan kurd e, nikarin bibêjin, ew şâîrekî xerab e. Ji ber ku Murathan Mungan hînî nivîsandina bi tirkî bûye, ji dengê kurdî bêtir hînî dengê bi tirkî bûye, ew bi tirkî dinivîsîne. Yek ji, divê berê kurd bi xwe ji biryara xwe û nivîsandina bi kurdî bidin da ev pirsa han zelalbbe. Ger zimanek neyê bikaranîn, ew ziman mehkûmê mirinê ye.

- *Niha em dizanîn, gelek rewşenbir û nivîskarêne tirkan ji ji ber pirsan kurdan, ji ber ku wan rastiya Tirkîyeyê nivîsandine, ew di zîndanan de ne. Wek mînak, em dikarin navêne ismail Beşîkçi, Haluk Gerger, Fikret Başkaya û hwd. bidin. Lî em dînerin ku ev gavêne îndividuel in, ji girseya rewşenbirêne tirkan deng dernayê. İro li Tirkîyeyê sendîkaya nivîskarêne tirk heye, klûba PEN'ê heye. Ev herdu sazgeh ji bêdeng in, berpirsiyariyên xwe naymin cih. Lî em dev ji wê ji berdin, ez dixwazim vê bipirsim, gelo li Tirkîyeyê nivîskarêne ku bi kurdî dinivîsînin, an ji nivîskarêne kurd bi nasna-*

va xwe dikarin bibin endamên van sazgehan? Ev sazgeh wan mîna endam gebûl dîkin?

- Niha yekî ku derkeve û bibêje ez şairekî kurd im tuneye. Hemû li derive ne. Lê ez bi neh-deh hevalan re li ser vê pirsê peyivîme û me cidî cidî ji munaqşe kiriye. Ez bala te bikişînim ku ez bi xwe ji ne endamê klûba PEN'ê ya Tirkiyeyê me. Lê, li hember klûba tirkî ya kurdi ji vebâye. Ez bi xwe nizanim bê PEN'a kurdi wê bixwazibe were ba PEN'a tirkî û ji bo çareserkirina vê pirsê tiştekî bike an na. Ez bi xwe vê nizanim. Lê belê mesele ne meseleya PEN'ê bi tenê ye. Mixabin, li Tirkiyeyê hemû sazgehêن hunerî naxebitin, berpirsiyariyên xwe naynin cih. Gava naxebitin wê bal û meyla xwe ji bernedin ser problemen weha. Yanî, mixabin ev ji nîşan dide ku sazgehêن hunerî û edebî li ser problema ziman û edebiyata kurdi serê xwe naêşînin, nêzîk nabin. Gava ew nekin, dîsan ev li ser gavavêtin û fedekariyên şexsî dimîne.

- *Em dizanin ku niha nexweşiyek di navbera Tirkîye û Yunanîstanê de heye. Herweha di vê keştiyê de delegasiyona tirk û yunan ji heye. Mîna ku tu ji dizanî di navbera van herdu delegasiyonan de hevdudîtinek çebû. Herdu grûban bîryar girtin ku ji bo aşî û hevkariya herdu gelan belavokékê binivîsinin. Em dizanin ku di navbera gelê kurd û tirk ji berberiyek heye, herweha ev berberî di navbera rewşenbirên kurd û tirkan de ji heye. Ji bo berbihevhatina herdu gelan û berbihevhatina rewşenbirên van her du gelan, gelo hevdudîtineke rewşenbirên kurdan û tirkan ji ne hewcedariyek e? Yanî ji bo ku rewşenbir bikaribin serkêşîya vê yekê bikin, bi ya min divê mîna peymanekê di navbera rewşenbirên herdu wela-*

tan de çêbibe, wek mînak mirov dikare fonekê ava bike û bi pişigirî û alikariya rewşenbirên herdu gelan, berhemên wan wergerin zimanê hevdu. Yanî berhemên tirkî wergerin kurdi û berhemên kurd ji wergerin tirkî? Tu ji pêşniyazeke weha re ci dibêjî?

- Ev pêşniyazeke gelekî baş e. Lê ez bawer nakim ku wê ev pêşniyaza han niha ji aliye sazgehêن me yên nivîskaran ve were qebûlkirin. Ev bi tenê dikare ji aliye yek û yek nivîskar û rewşenbiran ve were qebûlkirin. Ev rewşenbir û nivîskar dikarin li dor vê pêşniyazê bicivin û bi hev re vê daxwazê ji raya giştî re bînin ziman. Ger sazgehêن me yên nivîskarî û rewşenbirî mîna Sendikaya Nivîskarîn Tirk û PEN'a Tirk wê çiqasî bikaribin ji vê yekê re bibin asteng, ez nizanim. Lê ev pêşniyazeke baş e û divê em li dor maseyekê li hev rûnên û ji bo pêşeroja gel û welatê xwe fîkrêñ hevdu bistînin, li hev werin. Ev ewqas rast e ku, em mîna nivîskar ji, ji bo çapkirin û belavkirina berhemên me ji bicîhanîna vê pêşniyaza han pêwîst e. Sibe du sibe, mîna hin nivîskarîn tirkan bawer in wê xwendevanê kurd her tim yên wan bin, ne rast e. Em di talûkeyke ku xwendevanê kurd winda bikin de ne. Loma, ez bawer im, ev pêşniyaza te ya ku em berhemên hevdu wergerînin zimanê hevdu gelekî di cih de ye. Yanî gava em xwendevanê kurd mîna xwendevanê tirk winda bikin, em vê carê xwendevanê kurd mîna xwendevanê kurd bi dest dixin. Divê em bi rastî vê pêşniyazê qebûl bikin û bi xurtî berhemên tirkî wergerînin kurdi û berhemên kurd ji wergerînin tirkî. Van di planeke fireh de, di planeke rexnegirî de, ez nabêjîm rexnegirîza zanistî, lê em ji aliye dîroka edebiyatê ve, ji aliya

rexneya rojane ve ji, em biryarê bistînin û em mîna qîmetên objektîv bixine ortê. Ji ber vê yekê hem di nava kurdan de hem ji di nava tirkan de, rexnegirênu ku bikaribin di bin vî barî de rabin divê derkevin. Tirk edebiyata kurdî, kultura kurdî nas nakin. Gava mirov ji wan dipirse, ma tu Mem û Zîn çawan dibîni? ji wan we ye ku mirov dibêje, Lîmozin. Ji bo ev nezaniyê ji navê rabe, divê em bi çavekî rexnegirî berhemênen hev bidin naskirin û bi hev re têkevin dialogeke kûr.

- *Kî ê gava pêşî biavêje, an ji divê kî gava pêşî biavêje?*

- Ger bi hev re gav bête avêtin wê baştı̄r be.

- *Ji ber ku pirsa kurdan, pirsa ziman û kultura kurdan her tim derdikeve plana yekemîn, loma me get behsa te, behsa şârtiya te nekir. Em dîzannu ku tu yek ji şâtrîn Tirkîyeyê herî baş e ku li jiyanê yi. Gelek şâtrîn baş ji Tirkîyeyê derketine. Mina Nazim Hikmet, Cemal Süreya, Ahmed Arif, Hasan Huseyîn, Enver Gökcê û geleken din. Evên ku me navê wan hejmartin yek ji ne sax in. Gava mirov vê ji bide ber çavan, gelo rewşa helbesta tirkî iro çawa ye? Helbesta tirkî di ci reuşe de ye?*

- Hemû entelegisiya tirkî, mîna ku tête dîtin, di hundurê xwe de darbeyeke mezin xwar. Yekî hebekî aqil li serî, dikarîbû bibûya şâîr, bi milê wî girtin avêtin zîndanê. Van kesan firsenda xwendinê, firsenda ku ew xwe bi rîk û pêk bigihînin, nedîtin. Geleg salan di zîndanan de

man. Loma di helbesta tirkî de tevliheviyek çêbû.

- *Ma mirov nikane klasifikasiyonike helbesta tirkî iro şêbike.*

- Na. Pirr zor e. Ji ber ku weke tendens tiştek derneketiye, bi tenê yek yek şâîr derdikevin, hin derdikevin, disan binav dibin, zemîna û zemîneke pirr leqleqokî ye. Lî bi ya iro ev ber bi cihekî baş ve diç. Armanca min bi cihê baş ev e, ku her kesî serê xwe xistiye ber xwe û difikire. Ez texmîn dikim wê di hundurê helbesta tirkî de sentezek derkeve. Ev, ez bawer im wê di hundurê çar-pênc salan de bibe. Yê ku ji Nazîm dest pê bike, mecbûr e ku xwe bibîne, berrevajiya wê, wê helbesta tirkî bimire. Armanca bi Nazîm ne ew e ku divê ew rûnên û weke Nazîm helbesten xwe raxînin, helbesten xwe binivîsinin. Divê Nazîm di tirkî de çawan were nivîsandin. Ger Nazîm di tirkî de xwediyê cihekî be, belkî du qatan tesîra wî heye. Ger mirov li hemberî vê rewşê di hundurê xwe de neji, di hundurê xwe de gotinê xwe nehûnin. Nazîm ji hem gava di hundur de bû hem ji gava derkete derive, di hundurê xwe de helbesten xwe hûna. Tu iro nikanî rabî li Tirkîyeyê mîna Nazîm helbestan binivîsinî. Ji ber ku şerd hatine guhertin. Suret hatine guhertin. Danûstandinê mirovan hatine guhertin. Şîklê bikaranîna zimîn hatiye guhertin. Gelek tişt li der û dora me hatine guhertin. Tesîra vê jiyana mîna traşikeke xurt li helbeste ji dibe. Ev ji di helbeste de guhertinan tîne. Ev guhertin wê ne bisibe Nazîm, ne bisibe Nuhîtiya Duwemîn, dikare neşibe tu yekê ji, yanî pêşîya me vekiriye. Yanî helbest bi mirovan re peyivîn e. Ü divê mîjîyê helbestkar bi planen nû ve bixebite, pîvanen nû

bibînin. Wê ev pîvanên nû derbas bibin. Gava ev pîvanên nû rûniştin, tu bêjî nebêjî wê hingî tevgerên nû, di helbestê de gotinên nû derkevin. Êdî dema vê hatiye. Ez bawer im, di hundurê çar-pênc salan de wê li Tirkiyeyê di warê helbestê de teqandineke mezin çêbibe.

- *Gelo iro mirov li Tirkiyeyê helbestê û prosayê, an jî helbestê û romanê bermaberî hevdu bike, kîjan di pêş de ye?*

- Bi qasî ku ez dibînim, li Tirkiyeyê her tim helbest di pêş de ye. Yanî, iro jî, ne ku edebiyata Diwanê miriye. Tradisyonike helbestê li Tirkiyeyê heye. Lê romana me bi sînor e. Ez vê yeka han ji bo pîvana hevalên me yên romannivîs nabêjim. Roman hunereke burjuvazî ye. Burjuvazîbûna Tirkiyeyê, bajarvaniya wê ne bi rêk û pêk e. Tesîra vê yeka han li ser romanê jî heye. Mesele bi serketina Yaşar Kemal, bi nostaljiya hebûna tirkmeniya windabûyî û kurdan e. Ya rastî Yaşar Kemal di derheqa Tirkiyeya iro de tu berhem nedaye. Yek ji sedemên biserkerkin û hezkirina Yaşar Kemal ya li derve ew e ku ew perçeyek ji edebiyata nostalji ye.

- *Baş e, digel vê nostaljîbûnê li Tirkiyeyê beshsa Postmodernîzmê tête kirin. Nêrîna te ya di vê derheqê de ci ye? Li Tirkiyeyê romana postmodern, an jî bunera postmodern heye?*

- Me do bi hev re bi Orhan Pamuk re sohbet kir, wî got ku ew ne nivîskarekî postmodernîst e. Min jê pirsî: Ma tu Avant-Gard î?" Got: "Ez Avant-Gard im." Tiştê ku ez dixwazim bibêjîm, ji bo ku mirov bibe Postmodernîst, divê mirov di modernîzmê de derbas bibe. Yanî, di-

vê gazinên mirov ji modernîzmê hebe, wê çaxê mirov hewcedariya derbasbûna Postmodernîzmê dibîne. Bi qasî ku ez dizanim, Postmodernîzm ji edebiyatê wêdetir termeke mîmarî ye. Ez bawer im li dinyayê pir kêm mirov hene ku xwe bi Postmodernîst bi nav dikin.

- *Em bixwazin nexwazin, êdî li Tirkiyeyê nîvîskarênu ku xwe dixin kategoriyen cihê cihê, yên mina; Modernîst, Postmodernîst an jî Avant-Gard hene. Lê belê ev celebmirov hê jî li Tirkiyeyê hebûna kurdan, hebûna zimanê kurdî qebûl na-kin. Tu reva van ya ji rastiya kurdan bi ci ve girê didî? Yanî ez vê meraq dikim, çawan dibe ku di vê sedsla bistan de mirovekî bi fikir û ramanîn modern, postmodern û avant-gard bi rê dikevin, dikarin miletekî bi nifuseke zêdeyi bist milyonî ïnkar bike? An jî ji yên ku ïnkar dikin re, li cepikan bixin?*

- Ev yeka han, di gava pêşî de, pirseke wijdan e. Ya dudan, pirsa zanebûnê ye. Ger ev herdu negihîjin hev, wê çîrok weha be.

- *Nîha, ez dibînim ku di navbera me rewşenbirêne tirk û kurd de tu problemeke zêde tuneye. Yanî problema me bi rewşenbirêne tirk yên ku hebûna me qebûl dikin re tuneye. Me li jor behsa diyalogeke berdewam kiribû. Yanî diyalogeke berdewam di navbera nîvîskarênu kurde û tirk de. Em ê bi riya kovara xwe NÜDEM'ê hem pêşniyaza vê diyalogî bigihînin rewşenbir û nîvîskarênu kurdan, hem jî li ser wergerandina berheman, wan haydar bikin. Gelo hûn ê jî, ji raya giştî ya Tirkiyeyê re bi riya çapemeniyê behsa hebûna kurdan, hebûna ziman, edebiyat û kultura wan û herweha behsa pêşniyaza ku berhemên kurdî wergerin*

tirkî û berhemên tirkî ji wergerin kurdî bikin?

- Danûstandina min ya bi çapemeniyê re ew e ku ez carinan di rojnameyan de dinivîsînim, carinan jî hin kovar li min digerin û fikra min ya di derheqa mijarên cihê cihê de dipirsin. Herçî televizyon e bi tenê li ser helbestê bi min re dipeyivin. Tu çapemeneya ku di derheqa welêt de mafê gotinê bide min, nîn e. Tiştek ku ez dikarim bikim, gava ez herim ez dikarim bi kovara Evrensel Kültür re rûnêm, em bi hev re metnekê binivîsînin, tê de behsa fê fikra hevbeş bikin û vê metna han bi tirkî di Evrensel Kültûrê de û bi kurdî jî di kovara we de biweşînin. Bi vê yeka han re em dikarin dest pê bikin û helbesten bi kurdî jî di Evrensel Kültûrê de biweşînin. Yanî ji bîlî vê jî, ez ji dil nêzîkî pirsa kurdî me. Lî gava ez di çapemeniyê de bixwazim bîbêjîm, peyva min dibirrin, nahêlin ez bipeyi-vim.

Tu ya rastî bixwazî li Tirkiyeyê ne bi tenê ji bo edebiyatê cihêtî heye. Ev cihêtiya han ji bo muzîkê jî weha ye.

A niha stranbêjekî we tê bîra min, Şivan, dengbêjekî gelekî baş e. Demekê hin celebhu-nermendan li Tirkiyeyê bi gelempêr stranên kurdî û bi taybetî jî stranên Şivan kirin bi tirkî û stran û negotin ku ev stran yên bi kurdî ne. Û ev yeka han ji xwe re marifetek hesibandin. Ev yeka han jî asîmîlasiyona berheman e. Bi-nîr, niha Şivan hemû stranên xwe bi kurdî dis-tirê. Ger ew çend stranan bi tirkî jî bistirê ew ê wê çaxê bibîne bê kasetên wî çawan werin firotin. Lî belê Şivan jî di israrkirina bi kurdî gotinê de mafdar e. Û bi ya min baş jî dike. Lî bala xwe bidinê, ji bo şahî û konsera vekirina ava Heranê bang Şivan nakin. Ji bo ci bang Şivan

nekirin, ne wilo? Yanî wan bang Şivan jî bikiran-a û Şivan çend stranên xwe yên bi kurdî li wir bigota, ma wê ci bibûya? Ma wê bobelat rabû-ya? Naa, tiştek jî nedibû.

Ji aliye din ev ji bo resaman jî weha ye. Divê resamên kurdan jî werin û êdî pêwîstiya ku ew mîna Cemalê me (Cemal Süreya) bibêjin em tirk in û heta demekê eslê xwe winda bikin jî nema ye. Bila bi serbilindî werin, bibêjin em resamê kurd in û li Tirkiyeyê pêşangeha xwe vedidin. Ji bo ku ew resamê kurd in, kes nikare têkilî wan bibe. Herweha hêkeltraşen kurd dikarîn werin, destanbêj dikarîn werin, grûbê folklorê dikarîn werin.

- Niha ev rîwîtiya han hebekî cihê bû. Nivîskarên beşdar zêde rastiya Tirkiyeyê nedîtin. Gelo mirov rîwîtiyeke biçûk jî ji bo Kurdistanê amade bike wê çawan be. Yanî mirov bi otobusekê, çil-pencî nivîskarên ji deb-panzdeh welatan û herue-ha çend nivîskarên tirk jî tê de here Diyarbekirê, here Mêrdînê, here Hekariyê, here Şîrnaxê... Tu jî gereke wilo re ci dibêjî?

- Ez bi xwe, ez ê bixwazim bi kêfxweşî beşdarî rîwîtiyeke wilo bibim. Ez bawer im wê hebekî zehmet be. Ji ber ku gava heyetê Ewrûpayî ji bo lêkolînên mafen mirovî têne Tirkiyeyê, zilamên me destûr nadîn ku ew herin cihê cih. Ew nahêlin kes herin cihê cih. Gelek ji giregir û siyasetvanên mezîn yên tirk jî nikarin herin hin cihên Kurdistanê. Ji wezîr û serokwezîran re jî destûr tuneye, Amnesty International nikare herin wan deran. Li Tirkiyeyê rewseke weha heye. Loma ez bawer im wê bicihanîna vê pêşniyaza te hebekî zehmet be.


(Foto: F. Cewerî)

DILÊN ŞIKESTÎ DI PIRTÛKA KEVOKA SPÎ DE

XELÎL DUHOKÎ

Zivistan li deverên Kurdistanê pîrr sext û dijwar e. Jiyan li wan deran diraweste û mirov li dûr û berên avahî û cihêن pêdivî dikane karêن xwe bi rêve bibe. Belê; ew jî cihêن mukum û asêne ji bo bingehêن pêşmergan. Erê; li deverêن wesan me jiyan dibûrand.

Di zivistana 1982-an de, bingehêن me, di befrê re mabûn. Befir, mij û domanê, cîhana me dagirtibû. Di wê rewşê de, baştîrîn heval û hogir, pirtûk, kovar û rojname bûn, ew jî bi hêsanû dest nediketin. Hîngê çend ji wan -bi kurmanciya jorî, tîpêن latînîji hindek rêxistinêن Kurdistana bakûr ve, ku bingehêن wan nêzîki yên me bûn, gehîştine destêن min. Her çend xwendin û nivîsîna me bi tîpêن erebî bû, lê min bi alîkariya du



pirtûkêن hêja Ezîz Akreyî, ku di salêن şêstê de çapkiribûn, xwe fêrî tîpêن latînî kiri-bû. Lewre ez wek nivîskarekî bi kurmaciya jorî dinivise, bi wana pîrr kîfxweş û dilşad bûm. Rûpelên wan jî, bi babe-têن siyasi, edebî û roşenbirî, di xemlandî bû. Min bi germî dest bi xwendina wan kir. Di Kovara Berbangê de, kurteçirokek bi navê "Kurmê darê ji darê ye" kete ber çavêن min.

Bi rastî ew cara yekê bû ku ez çirokekê bi tîpêن latînî bibînim- heta hîngê jî, min Hawar, Ronahî û Roja Nû nedîtibûn- ew ji bo min çirokek balkêş bû. Lewre min ew û hinde çîrok û serhatiyêن dinpişti hîngê min peydakirin- wergerandin tîpêن erebî û çapkirin. Belê; têkelyêن min û xudanê çîrokê Fîrat Cewerî, hîngê dest pêkirin.

Heta niha wî du pirtûkêن kurteçirokan bi navên "Girtî" "û "Kevoka Spî" çap kirîne. Lewre ew wek nivîskarek yê hatiye qada edebiyata kurdî û kaniye cihê xwe jî bike.

Di vê vekolînê de, ez dê xwe dahêlime nav cîhana pirtûka wî Kevoka Spî. Ez hêvîdar im bikanim berhemêن wî bisengînim û layêن geş û tarîyêن wan pêşçav bikim.

Pirtûk ji 8 kurteçirokan

pêkhatîye û dîroka wan jî ne xuyaye. Ez naxwazim behsî hunerê çîrokê bikim, lê hêvîdar im di şirovekirin û behis-kirinê de, ew çend ji xwendevanî re xuya bibe.

Hêvînê çîrokêni Firat Cewerî, li ser rewşa paşdamayîna civata kurdî ye. Nebûna edaleta civatî, nemaze di navbera jin û mîran de, ku dibine sedemên mezin ji bo peydâbûna giriftarî û pirobliman. Paşketina xelkê me û negotina rastiyê, du-rûyî, ruhmezinî û quretî, girêdan bi adet û titâlên kirêt ve, bi efsane û tiştên aşûpî ve, netegehiştina wan di civata Ewrûpî de û her wesa hinde meselân sade yên rojane di jiyana xelkê de. Belê; çîrokê wî van babetan himbêz dikan. Bi xwendina van çîrokan, mirov agehdarî pişkeka giriftariyên civata kurdî û ya Ewrûpî dibe. Wî bi vê pirtûkê, kaniye xwendevanî rabikêse cîhana nivîskariya xwe û pirtûkxana kurdî ji xemlandiye.

Di civata kurdî de, jin ne mîna zelamî xwedan maf e, eve jî dibe sedemên giriftariyên mezin, ku yek ji wana mela revandinê ye. Ew jî di civata feoladî de, bi pere, jin û pirr caran jî bi kuştin û xwîn-riştinê çareser dibe. Belê; di çî-

roka Kevoka Spî de, çendin derdeserî ji bo çendin malbatâ çê dibin. Ji zarokiyê keçikê didine pismamê wê, lê wê ew nevê û dilê xwe daye xortekâ din. Çare, tenha revandin e û ew jî wê dikin... Li vêre karesat dest pê dike:

"Ji bo ku dîsan rûyê malbatâ xwe spî bike, şeref û namûsa wan bi dest bikeve, kuştina keçikê pêwîst bû. (Rûp 13)

Her çend birayê wê nedixwest wê gunehê bike, lê mamê wî û civata paşketî, hemî rê li ber girtibûn. Hîngê kurik jî diête girtin û pazde salan dikeve zîndanê. Lê dema ew derdi-keve, ci tiştek jê ra nemaye. Dezgirtiya wî xwe kuştije, wî jî aqilê xwe wunda kiriye û li dawiyê xwe jî dikuje...

Firat Cewerî, zîrekane kaniye biçe nav derûnê qaremanê xwe û wesa bide xuyakirin, ku kurik pirr peşîman e û berde-wam di hizra wê de ye. Ev çende ji aliyê naverokê ve, çîrokê bi ser têxe û pileya wê bilindir dike. Her sewa lanetê li karên hosan dike û daxwaza nehêlan û binbirrkirina wan jî dike. Babetê vê çîrokê ne nû ye, anku berî niha jî li ser hatiye nivîsîn. Lê çînku eve giriftariyekê mezin e di réya pêşketina civata me de, lewre li ser

nivîsîn û peyivîn, karekî pirr pêwîst û hêja ye. Di bingehê avakirina çîrokê de, hindek kêmasiyên teknîkî hene. Çewa rêk dikeve ku: "Tam hûn ê wê rojê bizewiciyana û min ê wê rojê, serê govenda birakê xwe, tayê bi tenê bikişanda. Tam wê rojê destgirtiya te bû mîvanê min..." (Rûp 7)

Keçikê xwe dabû revandin û li wî bajarî nemabû, evca çewa da govenda wî ket!

Her wesa ji layê zimanî û dariştina hevoka ve, zêdeyî di çîrokê de hene. Keçik dixwaze bêje birakê xwe ku, ew herdu wî efû dikin. Firatî dikarî bi hevokekê wê çendê xuya bike, lê ew bi çendin hevoka xwe digehîne mebestê:

"... Min jê rica kiribû, ku kekê min efû bike. Wê jî soz dabû min ku ew ê te efû bike. Min gotibû, ci dibe, birakê min tayê bi tenê ye, wî efû bike." (Rûp 8)

Her wesa di cihekê din de dibêje:

"Min ji te re gotibû, kekê min, got. Min ji te re gotibû, ku desten te bi min bibin, ez ê winda bibim. Niha dîvî tu desten xwe bi min neki. Ger tu desten xwe bi min bikî ez ê dîsan winda bibim." (Rûp 14)

Li şûna çar rêza, mirov bi duya, mebesta xwe digehîne.

Li welatêna paşketî, bihayê jinê kêm e. Lewre ew nikane birtyara li ser jiyanâ xwe bide. Hemî heyî û ferman di destê zelamî de ne. Eve jî li Kurdistânê wilo ye, lê mixabin, dema rewş digehe welatêna Ewrûpa jî, zelamên kurd her li ser yeka xwe ne û çi bihayî nadene jînê. Lî li Ewrûpa, wekhevîya mirovan heye û qanûn hemyan diparêze. Ev çende dibe sedem ku jina kurd jî daxwaza hindek mafen xwe yên xwezayî bike. Ji ber hindê jî, ev e bi dilê zelamê kurd nîne û hîngê giriftarı rû didin. Zelam naxwaze hindek deselata xwe bide jinê, yan jî bi çavekî bilindir lê binêre. Eve jî aliye kî û ji aliye din, pişkeka zelama hene ku divêna civîna de û li cem jin, xwîşk û keçen xelkê, xwe bi mirovîn pêşketî û mafparêzên jinê nîşan bidin, lê her ew kes li malen xwe, diktator in û nahêlin jin û keçen wan ronahiyê bibînin. Belê; li vêre Fîrat Cewerî, vê mesela girîng dike naveroka çîroka xwe û bi formeke serketî dadinê ber desten xwendevanan. Mebesta wî jî ew e ku, mirovîn durû û kevnisperist bide xuya kirin û ji aliye din ve jî, biha û qîmetê bide jina kurd a reben û bindest. Belê; di çîroka "Heşte

Adarê" de, ew rewş û têgehiştina mamoste Çetîn xuya dike, ku çewa di civînê de berevaniyê li mafen jinê dike:

"Erê hevalno! Wek bûn dizanîn, jinêna kurdan bindest in. Ew hem cinsî, hem netewî û hem jî sinifî bindest in." (Rûp 55)

Lê dema mamoste Çetîn - pişti vexwarina bîrê- di saet yazdeh û nîvê şevê de diçe malê, hîngê cewherê wî xuya dike. Fîrat zîrekane perdê ji ser rûyê Çetîn radike û kakila bîr û bawerên wî yên genî aşkera dike. Wî kilita derî jî heye, lê dîsan:

"Ma qey beta ez bist caran li derî nidim tu derî venakî?" (Rûp 57)

Her çend jineka jêhatî û baş e jî û bersiveka giran neda zelamê xwe, lê Çetîn wê kirêt dike û jê re:

"Hiş, disa devê te ve bû." (Rûp 57) dibêje.

Disan jinik xwe dilteng na- ke û dixwaze li gor dilê wî bi- peyive, lê ew bêhin teng dibe û bi vî rengî bersiva wê dide:

"Min xêr e? Êdi tu ne xwari- nekê çê dikî, ne kincekî dişoyî, ne malê pakij dikî! Tu ancax bi Gulê re rûnî û paşgotiniyan bi- kî. Binibêr, carek din jî tu bêyî xebera min neçî cihekî." (Rûp

58)

Belê; pirr caran mirovîn wi- lo aşkera nabin û xwe di bin perdê ve vedîşerîn, taku jinik bi xwe behis bike yan jî heval- lek bi ser rewşê de were. Pirr- niya jinêna kurdan, zû behsa derdêna xwe nakin, eger kîr negehe ser hestî.

Me got ku giriftariyêna jina kurd, li Ewrûpa gelekin û xe- mîn wê hindî çiyan e. Bi xwe- ragirtin û bêhînfirehiya hinde- ka jî, dîsan ew piroblim nayê- ne çareserkirin. Eve wê çendê nagehîne ku hemî jinêna kurd, bêguneh in û bi tenê her ze- lam, zîlm û zorê beramber wê dike. Nêxêr, pirr jinêna xirab û bênamûs jî hene ku, mîrêna xwe rezîl dike û çi bihay na- dene mal û zarokên xwe jî. Lî ew kêm in û pirraniya astenga zelam dadinê, çînku civat, kultur û ayîn jî, rî didete wî ku bi kîfa dilê xwe be û hemî birtyara jî ew bide.

Fîrat Cewerî, di destnîşan- kirina vê piroblima mezin de zîrek, şareza û bîrtîje. Ev me- sele bi ciwanî pêşçav kiriye û bênamûsiya zelamekî kurd xuya dike. Di çîroka Dilê Şkestî de, behsî rewşa malbateka kurd dike ku, zelamek xwedan jinek baş û komek zaroka ye. Jinik li ber ferman û xizmeten

wî jî rawestaye û ci kemasî beramber mal û zarokên xwe nekirîne. Her wesa ji aliyê exlaq û rewuştên kurdewariyê ve jî jehatiye- di çîrokê de wesan xuya ye- ci egerên hindê nînin ku dilê zelamî bişkê û wê bêrûmet bike. Zelam heta nîva şevê digel keça swêdî ye û ci pîtey nadete jina xwe. Pirr caran dixwaze wê çendê li ber jinkê berzeke. Jin rastiyê dizane, lê dîsan jî, ji wî tika dike ku dest ji vê şûlê berde. Ew her li ser yeka xwe ye û guh nede peyiv û tikayêن jina reben. Lewre jînik gelek dixeyide û jê re dibêje:

"Ger tu ê vê bi min bikî, min bişîne welêt çetir e. Ez hew karim idare bikim, bes e ji derde te." (Rûp 21)

Lê ew wê jî nake û her li ser yeka xwe berdewam dibe. Heqaretê li jînikê dike û hemî dergeha jî li ber digire. Li dawiyê jînik ji neçarı biryara xwe dide. Rast e, wê li Kurdistanê nikarîbû bi hêsanî biryarekê bide, çinku civatê rê lê digirt. Lê li vêre Ewrûpa ye, qanûn û civat jî maflidînê ku, ne zilmê, lê berevaniyê li xwe bike. Her wesa ji aliyê aborî ve jî, pêwîstî bi zelamî nîne, çinku kar dike yan sosyal alîkariya jiyanê didetê. Dîsan zelam ni-

kane li jinê bide û eger lê xist, polîs amadene rê lê bigirin û heta nas û dostêن wê jî alîkariyê dikin û ci gazinda jê nakin. lewre ew bi aşkeray jê re dibê:

"Ji mala min here! Jînikê got. Bi wê heramiya xwe nekeve nav nivînê min, nivînê min neherimîne." (Rûp 25)

Her çend zelam bi qanûnê Ewrûpa jî dizane, lê wî ci car hizir nedikir ku dê peyvîn wesan tal ji devê jînikê derkevin, lewre mîraniyê lê da û jinik da ber pêñ û şemaqa. Hîngê jî polîsa ew havête zîndanê... Rewş bi vê çendê gehîste berdan û jêkcidabûnê...

Lê mesele bi dilê zelamî bi dawî nehat, çinku pişti çendekê keça Ewrûpî jî, jê bêzar bû û hêla. Dema bi tenê ma û rezîl bû, jî nû daxwaza vegerînê kir. Digel hemî zilm û neheqîya zelamî jî, dîsan dilovaniya jina kurd rê dayê û hate nav zarokên xwe.

Firat Cewerî, di çendin çîrokên xwe de, li ser rewşa kambaxa jina kurd radiweste û bi hostayî azar û piroblimên wê pêşçav dike.

Forma çîrokê serketiye û zincîra rûdanîn jî bi hevre girêdayîye û xwendevanî radikêşê kûratiya çîrokê. Zimanê wî sivik e û destpêk baş xemlani-

ye, lê eger çîrok li vêre: "Ne ji wan bêtir be jî, bi qasî wan zarokên wan jî kêfîxwêş bûn." (Rûp 30) bi dawî anîba, çîrok ciwantir dibû, anku ew heft rêzên dawiyê di zêde ne...

Her mirovek di tebîet, taybetî û têkelyên xwe de azad e, lê divê kesen zana, pêşewa û nivîskarênen mileta, ku ala hilgîrin di qonaxên pêşketinê de, xwe li ser gelî mezin nekin û wan jî, ji xwe biçûktir nebînin. Lê mixabin, rûh mezin û qure jî hene ku xwe ji xelkê bilinditir dibînin û xwe ji rewuştên xirab dûr naêxin, hîngê ew bihayê xwe li cem hevalan kêm dikan. Ereb dibê:

"Mezinê mileti, xulamê wî ye."

Di çîroka Şeva Sersalê de, Firat Cewerî, perdê ji ser rûyê entelektuelekî kurd radike. Her çend heval û nas biha û qîmetê jî didine Metûn Canseverî, lê ew bi rewuştên xwe yêñ çewt, wê çendê ji xwe re nahêle û xelkê neçar dike ku bi çavekî kêm lê binêrin. Bibênin, ew berovajî tevaya hevalan, direng digehe cihê pêwîst, bi wê mebestê ku merivekî girîng e. Lê vemannâ wî dilê hevalan diêşîne. Dema ew li cem Alanê ku çend salan ji wî mezentire rûdine, bi qureti dipir-

se:

"Ma xorto tu zûde hatiyî Swêd?"(Rûp 32)

Dîsan wesa dide xuyakirin, ku merivekî modêrin e û di kultura Ewrûpa digehe, lê ya xwe biçûk dibîne. Rast e, mîletê me paşketiye û qonaxên şaristaniyetê nebîrrîne, lê egera vê çendê, ne her kurd in, belku zilm û sitema dijmina, ew rewşa hosan di cîh de hîştiye. Her çend kar û diyardeyên çewt û pîs di nav mîletê me de hene, lê disan yên baş jî pirr in, cihê dilxwesiya me ne û şanaziyê pê dikîn. Ev mîletên Ewrûpî jî, di van qonaxan de derbazbûne û bi qurbanî, xweragirtin, dilsojî û xebata, zana û bisporêñ xwe, gehîştîne vê rewşa bilind di şaristaniyetê de. Metîn Cansever di munâqesa xwe de, dide xuyakirin ku kurd di gelek tiştan nagehin:

"...Kurd romana min şêhim nakin. Ji bo têgîhiştina romaneke wilo, kulturek bilind lazime. Lê tu a rastî bixwazî ez vê, ne ji bo kurdan dinivîsim, min bêtir berê xwe daye Ewrûpiyan. Ji xwe berî kurdîya wê, ew ê ji aliyê du hevalên min yên nivîskar bi fransî û îngilizî derkeve."(Rûp 33)

Erê, nivîskarê hosan rê li

pêşketina mîletê xwe digire û çi rolek baş jî naleyize. Ne bes ev, belku ew li dij hunermen-dêñ kurde jî:

"Ka pismamê Alan, ka ji me çi derketiye?"(Rûp 36)

Tevaya müsika kurdî wî têr nave, lê bilûra şivan û derwêşekâ hejar î kurd, helbestvanê nemir Goranî dihejîne û dibe sedemê efradina bilindtirîn helbestê, her sewa nivîskar û stiranbêjê nemir Heme Salih Dîlanî jî sewdaser dike û wê dike xwestirîn stiran:

"Ne herfi mektebeküti xwendî, ne ustâdê pelî girtî..."

Sîrif berz deka em hunerey ferkirdî be şîmşal it...

Hemû weznêkî goranî, le tûlanî heta kurtî

Be ser pencey huner kirdit, be dîlî koşîşî zal it...

Ewendem bîst le müsika, xi-roşî rohî bêgane...

Mîzacî kurdevarîm têkçûwe, derwêş Ebdulla...

Dexîlit bim desa bew lawuk, ay ay û heyrane...

Şepolî zewqî millî, pirr derûnî mat û çû lim ke

Le Bêthovin gelê ziyatîr, be rohim aşnayî wella...

De ey derwêş, skalayek le

gel rohî kilolim ke...(Ebdulla Goran. Dîwana Beheşt û yadgar, firmesk û huner. Çapa intîşarat Goran, Sine, Kurdistan.)

Mana wê bi kurmanciya jorî eve

"Ne te herfekê medresê xwendîye û ne jî mamostayekî alîkariya te kiriye. Tu bi têge-hîştina xwe van awazan ji bilûrê berdidî. Tu hemî rengên awaza dizanî û diafirînî. Dê were bi wan lawuk û heyrana, hinavêñ min bi zewqa millî pirr ke. Hîndî min guh li mosîka biyaniya bûye, êdî zewqa kurdevariya min xera bûye. Tu gelek jî Bêthovin pêtir nêzîkî ruha min î. Dê li hewara ruha min ya damay û westi-yay were..."

Cîra em mîna Metînî, mîletê xwe biçûk bibînîn? Ma gelo eger di nav tevaya mîletên cîhanê de, yên mîna Picasso, Franz Kafka û Bethovenî heban, da cîra rewşa vê cîhanê wilo aloz û şepirze be? Em dixwazîn me yên ji wan zana û bilindtir jî hebin, lê divê em xebatê bikîn, qurbanîya bidîn. Metîn Cansever direwa dike û ew wesan hîzir dike ku, eger wî navêñ çend nivîskarêñ mezin yên dinê zanîn, yan behsî müsika kilasîka Ewrûpî kir,

hîngê dê xelk wî bi şareza û zana zanin. Lê dema ew bi ser-giranî ji cem hevalan derdike-ve, bi rêve vê stirana kilasîka meyxanên Turkiyê dilûrîne û cewherê xwe yê rasteqîne ji xuya dike:

*Hatasız kul olmaz
Hatamla duy beni
Dermansız derd olmaz
Derdimle duy beni*

Bi kurdiya wê:

*"Mirov bê şasî nabe
Bi şasyîen min, min bibihîze
Derd bê derman nabe
Bi derdê min, min bibihîze"*

Di çîroka Xewna Orhanov de, Firat Cewerî bebekî gi-ring heldibijêre û serinca xwendevanî radikêse rewşa pi-sikolojî û aloza mirovê kurd li derveyî welatî. Çinku pirrani-ya xelkê me ji ber sitema dij-minan revîne û nikanin vege-rin. Lewre bi tenê xewna bi welat, kes û karên xwe ve dibî-bin.

"... Oxx... Dê çigas xwes bi-be. Azadê birayê min çav li min keve, ewê ji dûr ve baz de pêsiya min û mizgîniyê bide diya min." (Rûp 61)

"Oxx... Şukur, tu hatî lawê

min. Maşale, maşale lawê min bûye weke şerekê." (Rûp 64)

Xerîbiyê dilê Orhan xwariye û bi şev û roj di xeyala welatê xwe de ye, lê dijmin rê nadînê û ew ji naxwaze xwe teslimî ri-jêmê bike. Anku ew ji bo bi cianîna hindek armancê pî-roz derbeder bûye û heta ew misûger nebin, vegera wî tû-neye. Welat di dili de ye û ew şewutiyê dîtina wî ye. Her çend dijmin rê li çûna wî digi-rin, lê ew qet nikarin rê li xew-nêñ wî bigirin. Ew berdewam li welatî ye û di nav kes, kar û havalêñ xwe de ye. Belê; ew welatparêz e û xebatê dike ta-ku rojekê zû, welatê wî ji, ji destêñ dagîrkeran rizgar bibe:

"Binhêre, me ji te re dînîvî-sand û digot, welatê me xwes bûye, bûye cenet, te bawer nidi-kir. Esker mesker nemane, polîs nemane, tu kes hevudu naku-jin, her kes ji hev hez dikin. Ma-ne te ji wisa dixwest? Binhêr, binhêr bê çigas xwes bû ye." (Rûp 65)

Eve çîrokeka wî ya jêhatiye û ji layê naverokê ve serketiye, lê kêmasiya wê ew e ku zincîra rûdanî bi hevre girêdayî nîne û çîrok bi rengekê normal bi dawî naê. Lewre hinde aloziyê têxe forma wê. Her ji destpêkê û heta nêzîkî qonaxêñ dawiyê

dibe, rûdan xwendevanî bi germî radikêsin, lê ji nişkave, bêy ku sedemek hebe, dibê:

"Ev xewn e, bi xwe xwe got. Ev disa weke her car xewn e." (Rûp 66)

Li vêre xwendevan ji digehe armancê û xuya dibe ku Or-han di xewnê de ye û mirov tiştîn normal û ne normal ji di xewnan de dibîne. Lê disan ew dest bi rûdanîn dike: "Oto-bosa wan gîhişte Diyarbe-kir..." (Rûp 66)

Erê, li vêre çîrok tev li hev dibe û dilê xwendevanî, ji xwendinê sar dike...

Di çîroka Doktor Sertaç de, Firat Cewerî, dixwaze di rêya qaremanê xwe de, xwendevanî agehdarî rewşa gelek bispor, ronakbîr, nivîskar û dewle-mendêñ kurda bike, ku çewa ketîne bin sîbera hîzir û bîrêñ dagîrkeran û digehe hindê ku Sertaçê diktor û ji malbata qa-reman û şehîdê doza kurdî Şêx Seîdê nemir, wênekê Ataturkî li ser masa jora rûniştina xwe dane. Ji wê pêtir ji, dema li ser doza kurd û maşen kurdan, digel Perwînî minaşqê dike:

"... Ger ji kurdan re musade bê dayîn ew ê sibe Ereb ji, Çer-kes ji, Asûrî ji, Ermen ji, Gurcî ji doza vî heqî bikin û ger bi vî awayî here ew ê Tirkî hilweşe û

ev Cumhuriyeta ku li ser heqiyê ji aliyê Kemal Ataturk ve hatiye li dar xistin, ew ê nemîne û bi vê yekê ew ê bi tenê këfâ emperyalîstan bê.” (Rûp 50)

Belê mirovên hosan di nav kurda de hene. Wene be ku bi zîlm û sitema dijminan û rê girtina şaristaniyete li ber mîletê me, ev çende bâye, lê ji aliyê din ve ji, xelkê me bi xwe zû ji bin vê perda reş û tarî dernakeve.? ...Zanayê turk ismaîl Beşikçî dibêje:” Mirov bi ci zimanî bipeyive, ew ê bi keve jêr tesîr û katêkirina wî mileti.”

Dijminî zimanê me qedexe kiriye, rê li pêşketina me girtiye. Lê cihê daxêye ku, li Ewrûpa û di vê azadiyê de, kesen ku şoresser bûn û ji ber terora dijminî revîn, zarokên xwe dinêrine fîrbûna zimanê turkî û di malên xwe de ji, bi turkî dipeyivin!!! Eve ji dibe sedemên windabûna zimanê kurdi. Gotineke Çikoslovakiya heye dibê: “ Heta ku netewe, xwedîyê zimanê xwe be, heye.”

Xortekê kurd, piştî deh salen Ewrûpa, ji nû vedgere we latê xwe. Dilê wî pirr xweş di be, nemaze bi razana ser bana.

Tiştê balkêş di çîroka “Stêrkek ji ezmanê me xurici” de, ew e ku niha li Kurdistanê şoreşek gerim heye, lê di nav wê de, keçen kurd ji hene û xebateka berdewam dikin. Dema şehîd dibin, kes û karêwan cepika lê dixin û tililiya vedidin.

Di çîroka Kêzika Bênav de, kurdek ji Swêd diçe Qamişloyê. Çinku çend sal e li derve, êdî xwe ji bîr kiriye ku ew ji yek ji wê xelkê bû. Dibe ew bi xwe ji gundekê deşte yê bê av û di nav tozê werbûyî ji hatibe, lê kêza bûnamûs wî dilteng dike û xewa şêrin lê heram dike. Başe leşkerê kêç û spîha hêriş ne anîye ser, nexwe ew di jiyana xwe de ji ne vedgera Kurdistanê!

Her çend nas û heval wî mîvanî mal dikin, lê efendi ji xwe nagire here malên wan yên bê ava gerim û pîs!

“Ji seruştun û razanê pêve tutist nedîhate bîra min.” (Rûp 71)

Yê guh lê bibe, dê wesan hizir ke ku, kurd serên xwe naşûn û cihê razanê ji li cem wan tuneye. Ev çende dibe cihê diltengiya wan û ew ji êdî ci pîtey pê nakin.

Firat Cewerî di hindek çîro-

kên xwe de, teknîka kevin- şêwê vegêranê-bikar anîye û eve ji dibe sedemên peydabûna hinde lawazîyan di formê çîroka hunerî de. Her çend zimanê wî yê sivik û xweş e, lê carna dariştina hevokên wî sistin. Xeletiyê çapê ji hind di zûrin ku mirov ji bin dernakeve.

Li dawiyê ez dikarim bêjim ku, Fırat Cewerî, çîroknişekî şerkiye û xwedan taqet û şîyanen huneriye. Paşeroja geş li benda wî ye, çinku bê şik wî kaniye cihê xwe di qada edebiyata kurdî de bike. Çîrokên wî ji bo xizmeta mirovatiya bîndest û pêşketina mirovê kurd, ji bo cîhaneka nû ya bê sitem û çewsandin û rojêن xweş, yêñ hatîne efrandin.

Meksîm Gorkî dibêje:” Erkê hunerî ew e ku mirovî bi hêz bike, giriftariyê jiyana wî sivik bike, bawerî, omêd û evîniyê di dilî de, mukum bîke.”

KOVARÊN KURDÎ LI SÛRIYÊ

Lokman Polat

Kurdên Suriyê di hêla ziman, çand, huner, dîrok û edebî de gelek xebatên baş dikin. Ew kovar û rojnamên xwe bi alfabeşa Latinî-Kurdî derdixin. Li Kurdistana Suriyê ji sala 1960'î û vir ve gelek kovar û rojname derçûne. Hê jî bi dehan kovarên kulturî, edebî û rewşenbirî têne weşandin. Ez ê di vê nivîsa xwe de kovarên Kurdî ku hatine weşandin û hinek ji yên ku niha jî têne weşandin bidim naskirin. Bi qasî ku ez dizanim, kovarên ku piştî 1990'î derketine, ev in:

1- Gulistan, 2- Xelat, 3- Gelawêj, 4- Aso, 5- Zanîn, 6- Pirs, 7- Stêr, 8- Bihar, 9- Gurzek Gul. Dibe ku hinek kovarên din jî hebin, lê ez bi wan hayîdar nîn im.

Ev kovarên jor ku min bi nav kir, herkê gelek hejmara wan derketine. Ez ê ew hejmaren ku di destê min de ne bidim naskirin.



BIHAR

Bihar, kovareke rewşenbirî û folklorî ye. Hejmara di destê min de hejmara yekem e. Di sala 1994'an de derketiye. Wek hemû kovarên Kurdî li Suriyê, di vê kovarê de jî navnîşana xwestinê tune ye. Navê xwedî û berpirsiyârê kovarê jî ne diyar e.

Kovara Biharê 55 rûpel e. Bi sernevîsa "Gotina Jimarê" nivîsek dest pê dike. Di vê nivîse de armanca derxistina kovara Biharê û karektera kovarê têt diyarkirin. Daxwaza wan ew e ku kovareke zanistî û to-

revanî derfînin.

Nivîskar Konê Reş, li ser "Nelson Mandela, xelata Atatürk û gelê Kurd" nivîsandiye. Diya Ciwan bi navê "Bazbend" serpêhatî nivîsandiye. Salihê Heydo, li ser "Pesnê mîrxasiyê di strana Kurdî de" disekine. Bavê Narîn, navê nivîsa xwe "Bangek ji Dil" daniye û ew li ser pirsa yekîtiyê disekine. Bavê Narîn di nivîsa xwe de yekîtiyê gelek xweş îdealize jî dike. Wek mînak; weha dibêje:

—«Yekîti xweşî ye, yekîtu dermanê her nexweşiyê ye.»

Dilbirînê Omerî nivîseke dirêj li ser "Şoreşa Şêx Seîdê Piran- 1925" nivîsandiye. Di vê hejmara Biharê de gelek helbest û çîrokên jî bo zaro-kan hene. Evîndarê Xemgîn li ser keç û jînên Kurdan, bi ser- navê "Hêviyek Rûmetê" nivî- sek gelek xweş nivîsandiye. R. Amedî jî li ser ziman şirove di- ke. Bihar kovarek xweş e. Herdu bergêñ wê jî bi rengîn in.-




PIRS

Pirs kovareke rewşenbîrî û serbixwe ye. Hejmara ku di destê min de ye, hejmara çaran e. Di vê hejmara de bi ìmza kovara Pirsê pêşgotinek heye. Kovarê bi rojnamevan Mumtaz Elheyderî re hevpeyvîn çêkiriye. Di hevpeyvînê de li ser pirs û pirsgirêkên rojnamevanî û rojnamegeriyê têt sekinandin. Azad Ehmed Eli, romana Mahmûd Baksî "Gundikê Dono" dide danasînê. R. Amedî, li ser pirtûka Diya Ciwan a ku bi navê "Pêlek ji derya yê kovanê min" hatibû weşandinê, disekine. Kovara Pirsê bi navê quncika "Rûpelê Cegerxwîn" rûpelek vekiriye. Di vê rûpelê de li ser mamoste Cegerxwîn û berhemên wî nivîsek heye.

Nivîskarek bi navê Aro, kurteçirokek nivîsandiye. Na-

vê kurteçirokê "Newala Xencere" ye. Li ser helbesta Kurdâ nivîsek dirêj heye. Nivîskarê vê nivîsê diyar nîne. Nivîs bê ìmze ye. Kamiran Haco, li ser guherandina "i" û "î" di alfabeşa Kurdî de disekine. Tîrêj, du çirokên folklorî nivîsandiye. Rezo ji, ji İbrahim Samoel çirokek wergerandiye zimanê Kurdî. Di kovara Pirsê de ji gelek helbest hene.



GELAWÊJ

Gelawêj kovareke çandî, torevanî û serbixwe ye. Her ji sê mehan carekê dertê. Ev hejmara di destê min de ye, hejmara 23 ye. Kovara Gelawêjê di vê hejmara xwe de, di berga pêşin de armancê kovarê weha diyar dike:

1- Fêrbûna xwendin û nivîsandinâ bi zimanê dê.

2- Parastina folklorâ gelê me ji wendabûnê û danasina

wê.

3- Hezkirina astî, dostanî û merovperestiyê.

Ev hersê armancê kovarê armancê pîroz in.

Di vê hejmara Gelawêj de ev nivîs hene: Di şuna pêşgotinê de nivîsek bi navê "Hêşirê çavê Memo" heye. Li ser kovara "Çiya" ku berê li Ewropayê derçûbû nivîsek danasînê, ji alî Dr. Pêşrewê Berwarî ve hatiye nivîsandin. Ev nivîs gelek dirêje û hêj dûmahika wê ji heye.

Hevpeyvîn bi Prof. Îzedîn Mustefa Resul re hatiye çêkirin. Prof. Îzedîn dibêjê:


«Milet yek e, divê zimanekî edebî ji hebe..»

Ji bo helbesta Kurdî ji ew dibêjê:

«Helbesta me gelek bilind e, mîne helbestvan Goran li hemberî Nazim Hîkmet e... Wêjeya Kurdî ji pêşde çûye.»

Prof. Îzedîn ji Silêmaniye ye. Wî bi Kurdî, Erebî û Rûsî nivîsiye. Kovarênu ku wî ji wan re nivîsine evin: Jin, Hêwa, Azad, Birayî, Nûserê Kurd, Bilîs, Ehâlî, Tîhad, Seqafê Cedîde, Serxe, Elseqafe, Terîq, Exbar, Seqafê Elwetenîye, Asya û Efriqa...

Ditîn û birhatinên Hesen Hişyar ji di vê hejmara de heye. Di vê hejmara Gelawêj de gelek helbest ji hene. Çar rûpelên kovarê ji, ji bo zarakan "Em bixwînin" e.



ZANİN

Zanîn kovara torevanî û çandeyî ye. Zanîn kovarek pi-çûk e -di ebata pirtûkê de ye-lê kovareke xweş e. Hejmarên wê yên pêşîn reş û spî, yên dawiyê bi rengîn derketine. Di destê min de hejmara 7'an he-ye.

Ev hejmar ji alî naveroka
xwe û ji alî pergela rûpelan ve
ji hejmarén berê spahitir e.
Rûpelên vê hejmarê jî zêde ne.
128 rûpel e. Bergên kovarê jî
bi rengîn in. Di berga pêşin
de wêneya keleha Zembîl Fi-
roş, wêneya Şêrgo Bêkes û wê-
neyek Robotê heye. Di berga
paşin de jî wêneya Destana
Memê Alan heye.

Ferhad Çelebi, li ser destana Zembil Firoş nivîsek dirêj nivîsandiye. İbrahim Yûsif û E. Huseynî bi Şêrgo Bêkes re hevpeyvîn çêkirine. Nivîsek ji

li ser Kurdên Êzêdî ye. Di rû-pelên nûçeyên çandî de çend nûçeyên cure hene.

Di vê hejmarê de 8 kurteçî-rok hene. Nivîskarên van 8 kurteçîrokan; E. Yûsîf, M. Ba-qî, Qado Şêrîn, Xemgînê Remo, Alan Osman, B. Helebçe, Darşînê Qeregecî û E. Huseyîne. Deh, duwanzdeh heb ji helbest hene.


"Nivisandin û lêkolînên civakî, sosyolojî li ser civaka Kurdî pir û pir kêm in...."

Hejarê Darî, li ser Nişti-manperweriya Ehmedê Xanî disekine. Ew di nivîsa xwe de E. Xanî kîye?, xebata Xanî li ser zimanê Kurdî û berhemên Xanî bi xwendevanan dide naskirin û gelek dirêj li ser babeta "Çîma Xanî bi Kurdî ni-vîsiye?" ye, sekiniye.

Kovara ASO, bi xwedî û berpirsiyârê kovara NÛDEMê Firat Cewerî re hevpeyvînek dirêj çekiriye. Firat Cewerî di vê hevpeyvînê de li ser kovara NÛDEMê gelek aghdarî di-de xwendevanê kovara ASO.

CEWERÎ, kovara ASO dike xwişka kovara NÜDEMê û ji bo kovara ASO weha dibêje: «.....Ev cara yekem e ez di çapemeniya Kurdên me yên binxetê de rastî kovareke ewçend bedew têm..... “Kovarên berê”.....ji aliyê çap û estetik de gelekî li paş bûn û bi amatorî bûn..... Lê xwişka NÜDEMê ASO di ví warî de şo- reşek kiriye û bi çapeke bedew berpêşî xwendevanên Kurd bûye. Ev ji bo Kurdên me yên Binxetê çıruskek hêvî ye. Ew li gelê Kurd pîroz be.»

Pîstî van gotinêñ jorîn yên
Mîrza Firat CEWERÎ, hewce
nake ku ez kovara ASO bi di-
rêjayı bidim naskirin. Divê
Kurdên Kurdistan Bakûr vê
kovarê bixwinin. Di vê hejma-
ra duyem de gelek nivîsên
xwes hene.



ASO

Kovara Aso bi hemû awayî ji kovarê din -yên ku min li jor ew bi nav kirin û dan nas-kirin- cudatir e. Ebata kovarê mezin e. Berg û wêneyên kovarê bi reng in. Ji ali naveroka xwe ve ji dewlemed e. Heta niha sê hejmarêن Kovara Aso derketine.

Hejmara 2 û 3 bi hevre der-ketine. Loma jî rûpelên wê zede ne. 120 rûpel e.

Di vê hejmarê de Behzad Resûl, li ser pirs û pirsgirêkên civakî dîsekine. Ew dibêje


TEFSÎRA QURANÊ YA BI KURDÎ

Zeynelabidîn Zinar

Zimanê kurdî çewa katêن xwe bi her ba-
bet û şaxan ve bera ser medeniyet û to-
reyên cuda dane, herweha êdî bera ser
ol û oldariyan ve jî dide û di navê de dihêwire.
Çendî heta niha dihate gotin ku Tefsîra Qurâ-
nê ji aliyê çend kesên ji herêmên cuda ve bi
kurdi -kurmancî- hatîye nivîsandin, lê wisan bi
temamî ta niha jî nehatibûne çapkîrin. Îcar ma-
mosteyê hêja û wefadarê ol û nijadê Mele Ev-
dila Warlî, Qurana pîroz tefsîr kiriye û daye
çapkîrin. Mele Memê, di Nîsana 1939-an de li
gundê Garisan çêbûye. Bavê wî Mihemed Ho-
ko, kurê Mele Brahîm e û ji binemala Xaniyan
e. Navê diya Melê jî Xecê ye. Malbata Memê, ji

gundê Bonizlê yê li Gelyê Zîlan e, lê piştre çû-
ye Patnosê û li cem Kor Hiseyn Paşa bi cih bû-
ye. Memê, pêşî li cem bavê xwe olî xwendîye,
piştre çûye li hin medreseyên Kurdistanê, dû re
jî li Xizna û Şamê xwendîye. Di dawiyê de li
Tirkiyê unîwersîte jî kuta kiriye.

Memê Warlî di 12 06 1964-an de li Erdîşê
bûye bernivêj, piştre bûye waiz, dû re jî mistîtî
kiriye. Di 1976-an de ew hinartine bajarê Ma-
çkaya Trabzonê. Di 1978-an de li Mûzeya Et-
nografîyayê bûye mutercim û di arşîvê de şixuli-
ye. Di 1984-an de jî li bajarê Edenê di pirtûk-
xana Adnan Ötükenê de bûye pisporê pirtûkên



Amadekarê Qurana pîroz Abdullah Varlı

Midûriyeta Giştî ya Lêkolîna Çanda Xelkê û di
wê salê de jî emellî bûye.

Ferkers R'ed (13)	cuz /
35 - Hecwetkîya wê beligta, tu ji bona want xwe (ji bê fermâna Yezdan) pariseend haticeye meyhandane (cavye): "Dîbîne (dare) wê enîm kiyas, wîşen ke hîne her yaferî. Encana wanê e wî evave. Encana filan ji aiger."	
36 - Ewan (în îm de bêrd ji ja wan ra partûni sandige) bi vê partûni me li bûl te da qaydipende pubbin. Lî ji partûni hinek hene! he la hinek (Quran) beher nazîn. Tu (în ja wan ra) bejî: "En hîne maa kînît (Quran) beher nazîn. Tu (în ja wan ra) bejî: "En hîne qet nökim, ez bî si (Yezdan) da gazi (we) dixim tî éwra (para bey) (îl bid Yezdan) dane."	
37 - Ode de bîte ye ta partûni hîne azamîn ko komî bi ser wa (hînîteye) wasa ji ne ser et de partûni (in Quran aziman) êrebane hinartîye (ki la bu tu bi was bîryane wê, fermâna berewaî hîne). Hete ji şogut, ji te ji ra- zîn hanîte, pag er bû bîbî pag ey Hewasa filan (îl dij) hona te ra pariseva hîne sûret, ku te (ji papata) Yezdan ferete hîne tuncye.	
38 - O bi sondî de bîra tada ji (ewan Pejyembrekele we) te mîn berîm me li bî tefan (da) pandîne, bûna warra me li jî zat et dir me bûne. (Ewan filan) pi dibejen bar bejin, tu neyezî. Tu Pejyembreke nikare be destûrî Yezdan berenîce, ku mevîcî dan) è papî et pîre, heyn da was pa- patan nöye, papî et was da asyî kona jî bona her boyecan dîz (hatîna) weye.	
39 - (Ko aera hîyerâ de da) da de bî dîwi dîwi da de dîpiç. Yezdan bîrîna ave, ita ta bîvî (ewan filan) de hîfîne li ta be myîtan wan bîve (ewan ji hîye daus wan dibeke). Deytan wan pîva et bid Yez- dan: (Dîwi hîye de) da de pîra dayîn heyn. Yezan wan gen pîsî pî leye, ya ji dîsan murîn wi indye, evi de wi	

Mamoste Mêmê, rûpelên Tefsîra xwe weha amade kirine: Di nîvê rûpelan dé de teksta Qurânê ya orijinal bi cih kiriye. Di hemû rûpelên aliyê rastê de, li aliyê rastê wan kurdîya bi tîpêñ latêñû li aliyê çepê wan jî kurdîya bi tîpêñ ere-bî nivîsiye. Di hemû rûpelên aliyê çepê de jî, li aliyê çepê wan kurdîya bi tîpêñ latêñû li aliyê rastê wan jî kurdîya bi tîpêñ erebî nivîsiye. Jî her Ayetekê re nimre nivîsiye. Ew nimre hem li

ber kurdiya bi tîpêñ erebî û hem jî li ber kurdi-
ya bi tîpêñ latêñî nivîsandine.

Mele Memê ji bo amadekirina Tefsîrê, ji 340 pirtûkên babetcihê alîkarî wergirtiye ku navêwan (hem bi tîpênerebî û hem bi yên latêni) di heft rûpelan de nivîsîne û li aliyê çepê bi cih kîrine.

1

Jê re 16 rûpel
ferhengokek jî
(hem bi tîpén
erebî û hem bi
yên latêni) çêki-
riye û di eynâ de-
verê de bi cih ki-
riye. Jê re pêşgo-
tineke şesrûpelî
jî (sisê bi tîpén
erebî û sisê bi
yên latêni) nivâ-
siye. Herweha jî
bo dawilêinana
Tefsîre jî rûpele-
kî dustûnî, dîsa
bi herdu alfabe-
yan, bi navê La-
vatî û Xwestina
jî Xwedê nivâsi-
ye.

Tefsîra Qurânê bi hawayekî pir delal, bi cild û bi forma quranan hatiye çapkirin ku ji olda-

ran re devera serbilindiyê ye. Lê ji aliyê teknik û rêzimaniyê ve, hin kîmasî û nerastî dikevine ber çavan. Ew jî pir normal e ku ev barê hewqasî giran, ji aliyê sexsekî ve hative ragirtin.

KURDÊN TIRKIYÊ DI DEMA HERÎ NUH DA



Ev pirtûka hêja, di 1990-î de ji aliyê Profesorê Ermenî Manvel A. Hasretyan ve, pêşî bi zimanê rûsi hatiye nivîsandin û Weşanxaneya Hayastanê jî ew li Êrivanê çapkiriye.

Hasretyan di pirtûka xwe de behsa dîroka Bakûrê Kurdistanê (Tirkiye) ya Sedsala Bîstî, xasma serhildanên ji 1925-1937-an kiriye. Piştre ji behsa rôexistinê Kurd ên siyasî yên vê besê kiriye û xebata wan a ji 1960-î hetanî fro anîye zimên.

Nivîskarê Kurd Tîmûrê Xeillî, pirtûk di 1992-an de ji zimanê rûsi wergerandiye zimanê kurdî. Enstituya Kurd a Brukselê jî, ew di Elûna 1994-an de li çapxaneya Acco-Leuvenê daye çapkirin.

Qabê pirtûkê nerm e, 405 rûpel e û mezinayîya wê 13,5x21 cm ye.

NAVNIŞANA XWESTINÊ:

Enstituya Kurdî ya Brukselê. 4, rue Bonneels-1040, BRUXELLES.

DÎROKA KURD Û KURDISTAN BI KURTEBIRI



Nivîskar û kurdperwerê hêja Ekrem Cemîl Paşa vê pirtûkê, piştî xebat û légerîna 14 salan û di 81 saliya xwe de, li Şamê di 1972-an de kuta kiribû. Di wê salê de jî wergerandibû zimanê tirkî û herduyan bi navê "Cemîl Paşa Burc" dabûne çapkirin. Pirtûk behsa dîroka Kurdan a 10.000 sal berî İsa dike û tê hetanî 1918-an radiweste. Tê de gelek babet û çavkaniyên balkêş û çend nexşîneyên wan deman jî hene.

Ev pirtûka hêja ji aliyê Enstituya Kurdî ya Brukselê ve di Çileyê Paşîn 1995-an de, li çapxaneya Acco-Leuvenê hatiye çapkirin. Qabê wê nerm e, 346 rûpel e û 13,5x21 cm ye.

NAVNIŞANA XWESTINÊ:

Enstituya Kurdî ya Brukselê 4, rue Bonneels-1040, Bruxelles.

Tel: 02/230.89.30. Fax: 02/230.34.02

MEHKÜM




Ev pirtûka M. Elf Kut, di 1994-an de, ji aliyê Weşanen Welat ve hatiye çapkirin. Di pirtûkê de 14 çîrokên babet-cihê hene. Qabê wê nerm e, 108 rûpel e û mezinayîya wê 11,5x18,8 cm ye. Wêneyê E. Delacroix (1798-1863) li ser berge pêşî ye. Devera çapê

ne kifş e, lê li serê "Çap: Li derveyî welêt" hatiye nivîsandin.

Navnîşana xwestinê:
Box 4123, 141 04 Huddinge/SWEDEN.

6NAME




Pirtûka 6Name ji aliyê Rojan Hazim ve hatiye nivîsandin û li Danîmarkayê di Îlûna 1994-an de, di nava weşanên Weşanxana Xanî & Bateyî de derketiye.

Di pirtûkê de şes nivîsen cihê hene ku berê ew di kovara NÜDEM-ê de hatibûne weşandin, lê nivîskar ew bi forma pirtûkê ji nû ve dane çapkîrin. Qabê wê nerm e, 93 rûpel e û mezinayîya wê 13x19 cm ye.

Navnîşana xwestinê:
Postbox 39, 2660 Brondby Strand, DANMARK.

STRAN

Berhevkarê pirtûkê Rojan Hazim, hin stiranên danîmarkî, hînek stiran û çend merşen



kurdî civandine, ji hînek stiran re ji nota çêkirine û kiriye wek pirtûk, di 10/1994-an de daye çapkîrin. Qabê wê nerm e, 113 rûpel e û mezinayîna wê 13x19 cm ye.

Navnîşana Xwestinê:
Postbox 39, 2660 Brondby Strand, DANMARK.

BEDIÜZZAMAN'IN VOLKAN YAZILARI

Bediuzzaman'ın Vulkân Yazılıları

Oscar Resülan

Amadekarê pirtûkê Osman Resûlan, vê berhemâ Mele Seidê Kurdi, ji nû ve bi tirkî-

ya latêni daye çapkîrin û teksta wê ya bi tipêne erebî ji li aliyê rastê bi cih kiriye. Di pirtûkê de 17 nivîsen babetcihê hene ku bala mirov pir dikişînin. Qabê wê nerm e, 108 rûpel e û mezinayîya wê 12,5x19 cm ye.

Pirtûk di 1994-an de ji aliyê weşanxaneya NÜBIHAR-ê ve, li Stenbolê hatiye çapkîrin.

Navnîşana xwestinê:
Kıtaşı cad. Kuriş apt. 51/3 Fatih-Istanbul, Tukiet.

HEY GERILLA

MEDENİ FERHO

HEY GERILLA



Ev pirtûka Medenî Ferho, ji 24 helbesten babetcihê hatiye holê û Yaşar Kaya jê re pêşgotin nivîsiye. Qabê wê nerm e, 96 rûpel e, mezinayîya wê 14x20,5 cm ye û di 1994-an de ji aliyê Weşanxaneya ABeCe-yê ve hatiye çapkîrin.

Navnîşana xwestinê:
Brusselsesteenweg, 638, 1731 Zellik (Asse), BELCIKA.

BERXWEDAN JIYAN E



Medenî Ferho vê romana xwe bi balkêşîyeke ramandar girtiye ber pêlên qelemê. Wêneyê li ser rû ku ji aliyê Jaza Bakir ve hatiye çêkirin, hûn balkêşîr e. Qabê pirtûkê nerm e, 187 rûpel e, mezina-tiya wê 14x20,5 cm ye û di 1994-an de ji aliyê Weşanxaneya ABeCe ve hatiye çapkirin.

Navnîşana xwestinê:
Brusselsesteenweg, 638, 1731 Zellik (Asse), BELCIKA.

XWEŞBER



Ev pirtûka Çirokên kurdî ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve ji bo zarûkan hatiye amadekirin û wêneyê wê jî Kemal Heyran çêkirine. Di pirtûkê de çar çirok û 57 wêne hene; qabê wê nerm e, 84 rûpel e û mezinayîa wê 17x22,3 cm ye. Pirtûk di 1994-an de li Stockholmê, ji aliyê Weşanxaneya PENCİNAR-ê ve, li çapxaneya BARAN-ê hatiye çapkirin.

Navnîşana xwestinê:
Pencînar, box 3088, 16103 Bromma, Stockholm, SWEDEN.

MİRATE




Ev pirtûka Leyzîkên Kurdi ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve hatiye amadekirin. Pirtûk du beş e: Di beşa *Leyzîkên Zarûkan* de 32 cûre, di ya *Leyzîkên Mezinan* de jî 15 cûre hene û 17 wêneyê té de ji aliyê Kemal Heyran ve hatine çêkirin. Pirtûk di 12/1994-an de, ji aliyê Weşanxaneya PENCİN-

NAR-ê ve li Şamê hatiye çapkirin û hatiniya wê (qe-zenc) ji *Komika Ehmedê Xanî* re ye. Qabê pirtûkê nerm e, 116 rûpel e û mezinayîa wê 13,5x19,5 e.

Navnîşana Xwestinê:

- Komika Ehmedê Xanî, Qamişlo-Sûriye.
- Pencînar, box 3088, 16103 Bromma, Stockholm, SWEDEN.

XWENÇE CILD VIII



Ev pirtûka folklorî, ji aliyê Zeynelabidîn Zinar ve (mîna her heft cildên pêşiyê) hatiye amadekirin. Di pirtûkê de du beş hene:

Beş I, a) *Stiranên Dîrokê*, yazdeh in. b) *Stiranên Evînî* û *Gelêrî*, heşt in.

Beş II, a) *Meselok*, neh in, b) *Serpêhatî*, şes in, c) *Çirok*, sisê ne.

Pirtûk di 1/1995-an de, ji aliyê Weşanxaneya PENCİNAR-ê ve li Şamê hatiye çapkirin û hatiniya wê (qe-zenc) ji *Komika Ehmedê Xa-*


nî re ye.

Qabê pirtûkê nerm e, 286 rûpel e û mezinayîya wê 13,5x21 cm ye.

Navnîşana Xwestinê:

- Komika Ehmedê Xanî, Qamışlo-Sûriye.
- Pencînar, box 3088, 16103 Bromma, Stockholm, SWEDEN.


**HELBESTA
HEVÇERX YA KURDİ
BERGÊ I**



Ev pirtûka amadekirin û nivîsîna Xelîl Dihokî, di 1992-an de li Swêdê derketiye. Dihokî di pirtûka xwe de kurtejiyana 16 helbestvanan û hinek ji helbestên wan nivîsîne, herweha wêneyên wan jî tê de bi cih kirine û jê re ferhengokek jî di dawiyê de çêkiriye. Qabê pirtûkê nerm e, 432 rûpel e û 14,7x21 cm ye.

**HELBESTA
HEVÇERX YA KURDİ
BERGÊ II**

Ev pirtûka amadekirin û



nivîsîna Xelîl Dihokî, di 1994-an de li Swêdê derketiye. Dihokî di pirtûka xwe de kurtejiyana 32 helbestvanan û hinek ji helbestên wan nivîsîne, herweha wêneyên wan jî tê de bi cih kirine û jê re ferhengokek jî di dawiyê de çêkiriye. Qabê pirtûkê nerm e, 219 rûpel e û 12x17,5 cm ye.

JIN Û ZÎNDAN



Di vê pirtûka Loqman Polat

de 22 nivîsîn babetcihê hene ku her yekê bi rengekî cuda naveroka xwe tîne zimên. Pirtûk ji aliyê Weşanê Çanda Nûjen ve, li Stockholmê, di 1995-an de hatiye çapkirin.

Qabê wê nerm e, 80 rûpel e û 14,5x20,5 cm ye.

Navnîşana xwestinê:

Tensta Alle 43-2 tr. 16364 Spånga-Stockholm/Sweden.

CD'ya CIWAN HACO



Ev sêlika bi navê DÛRÎ li Tirkîyê di nava weşanê Çarçirayê de derketiye. Stiranê tê de geleki balkêş û xwes in ku bi germî kela dilê mirov radikin.

Stiranê wê ev in:

- 1) Serbûriyek.
- 2) Ziravê.
- 3) Bida.
- 4) Gula Deviya.
- 5) Siba.
- 6) Şervan.
- 7) Dûrî.
- 8) Yara Derew.
- 9) Dil Ji Min Bir.
- 10) Çavres.
- 11) Esmer.
- 12) Lawê Min.

- *Ji bo dibistanan*
- *Ji bo komelênu ku kursênu zimanê Kurdi didin*
- *Ji bo kesênu ku bixwazin Kurdiya xwe pêşde bibin*

destpêka
Rêzimana Kurdi

Haydar DILJEN

Rûpel: 64, form: A4

Çapa duyem: Jîna Nû,
 Tebax 1994, Stokholm

Çapa yekem: Çarçira,
 Hezîran 1994, İstanbul

Biba: 65 SEK, 15 DM, \$8

Navnîşan:


Jîna Nû Förlaget

Box: 152 16

161 15 Bromma / Sweden

Fax:(46)-08-801825

tel: (46)-08-803135



- Ev pirtûk, ji qaydeyên giştî yên rîzimana Kurdi pêk hatiye. Di vê çapa duyem de hin guhertinê piçûk hatine çekirin.. .

- Kesênu ku bixwazin qaydeyên giştî yên rîzimana Kurdi fêr bibin, yan ji fêr bikin, divê ji xwe re vê pirtûkê peyda bikin.

- Ev pirtûk bi metoda înduktîv hatiye nivisîn. Ev metod li ser aktîfbûna şagirttan dimeşe. Li gor vê metodê dersdar bes rînîşandar e.

- Ev pirtûk ji bo pengava navîn (sinifên 4.5.6.) hatiye amadekirin, lê salmezinênu ku bixwazin qaydeyên giştî yên rîzimana Kurdi fêr bibin jî dikarin bi kar bînin.

PÛSKÎN

KÜÇÜK KAPİTAN



ÇÊXOV

MİRİNÂ KARMEND



ARDÛ

İLK YILDEĞERİN GELİŞİ



Smimoff

Fragrance Water



Mehmed Uzun

BOŞEK İYİ BOŞEK EYVALË ZEVÝNE



MUSA ANTER

HATIRALARIM



TILÛRË BÈGANE

Redwané Ali



Mehmed Uzun

MİRİNÂ EGİDERİ



SIWARËN ÈŞË

Feruz Hasca



Qabirenta Cinan

Hesam Metz



Weşanên Welat

Box: 4123

141 04 Huddinge/Swêd

Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYİ

Welatê Me rûmeta me ye

**"Xortên Kurdan!
Heta niha we guhê min bir,
bê çîma ez bi Kurdi
nanivisim. Ev e ez dînîvisim,
îea hûn jî bixwînin."**

**Gerek e di deh rojan de hûn
hîni alfabeşa xwe bibin,
name û nivîsên xwe bi Kurdi
binivîsînin. Bavê mino,
xortino de ez we bibînim!"**



BIBE ABONEYÊ WELATÊ ME
Navîşan:
Ayhan Işik Sk. No:23/3
Çaygûlu-İstanbul/TURKI

Nûbihar

MEHNAMEYA ÇANDI HUNERI EDEBİ
(AYLIK KÜLTÜR SANAT EDEBIYAT DERGİSİ)

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. 51/3
Fatih-Istanbul
Tel: (212) 533 75 88
Faks: (212) 524 00 38

Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazişleri Müdürü)
Süleyman Çevik

Berpirsiyarê Giştî
(Genel Yayın Yönetmeni)
Sabah Kara

Mudîrê Tîpîzî û Arşîvê
(Dizgi ve Arşiv Müdürü)
Ali Karadeniz

Muşawîre Nivîsaran
(Yayın Danışmanı)
Mustafa Goyani

Nûbihar kovareke mehanî ya çandî, hunerî û edebî ye. Raman û rayên xwedyêñ berheman, lizûmen ne raman û rayên Nûbihar in. Nivîsaran ku bi imzeya Berpirsiyarê Giştî weya bi navê Nûbihar têñ weşandin raman û raya me nişan didin. Nûbihar di serrastkirina berhemên şandî de azad e.

Bedela Abonetiya Salane
(Yıllık Abone Bedeli)

Li hundir (Yurt içi): 360.00 TL
Li derive (Yurt dışı): 60 DM

Jimareyên Hesaban
(Hesap Numaraları)

Li hundir (Yurt içi): Postgiro (Posta Çekti): Süleyman Çevik, 658265
Li derive (Yurt dışı): Süleyman Çevik, İş Bankası Yavuzselim Şubesi, 1079-30100-3118770

Tîpîzî û Pergala Rûpelan
(Dizgi ve Mizanpjaj)
Nûbihar

Berg (Kapak)
Nûbihar

Wêneya Berga Pêşî
(Ön Kapak Resmi)
Hebîb Sadiqî

Çapxane (Matbaa)
Nesil Matbaacılık

NAVEROK

NÛBIHAR

XWEXAPANDIN:

"TU JI ME YÎ, BAŞ Î, NE JI ME YÎ, NE BAŞ Î" 3

MEWLANA CELEALEDİN È ROMÎ

SABAH KARA

MESNEWÎ / 7 4

BEDÎUZZEMAN SEÎD NORSÎ

SÜLEYMAN ÇEVİK

SEŞ PIRS 7

SABAH KARA

MERSİYEYÊN ROJHILAT / 10 9

AQÎL MIHACIR

HOVİTİYA HOVAN Û EM 10

MELE ALAEÐDÎN HAYDAROĞLU

NEWZAT NURULLAH

BEDÎUZZEMAN SEÎD È NORSÎ 12

AZAD BERÎVANI

BIKARANÎNA ZIMANË KURDÎ 14

BABA TAHİR È URYAN

SABAH KARA 14

DUBEYTÎ / 66 - 75 16

AYHAN YEKTA

NETEW Û PÊŞVEÇÜNA ZIMÊN 18

OMER XEYYAM

SABAH KARA 18

RUBAIYAT / 36 - 40 20

HUSÎN BİRÎNDAR

CÎROKA MIN Û BAPÎRÊ MIN 21

MELE EVDILQADIR

EHMED BAWER 21

NEZIRE 22

SEYYID QUTUB

BEVÊ XECA ZÊRÎN 22

PÊŞHATÎ YA İSLAMÊ YE 24

EMîRSÂH KAHRAMAN

Jİ XEBATKARÊN NÜBHARA XWEŞIK RE 25

TEKOSİN

MAR Ú ROVÎ 26

AQÎL MIHACIR

ZANÎNA ZİMEN Û RONİKIRINA GEL 27

NURULLAH GENÇ

MERYEMXAN 29

XİYAL 29

HÜSEYİN AKKAR

TENYAYİŞ MERGO 29

ABDULHADî TİMURTAS

MINAFIQ Û MESCIDA DIRAR 30

SULEYMAN ŞORES

SEFÎNETUN KESEFÎNETÎ NÛH 32

• NÜBHAR 27 • ÇILEYA PÊŞİN 1994 •

BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ

Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd hebe, pêşniyazeke me heye; bibe aboneyê Nûdemê!

Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya her çar perçeyên wê-lêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê Nûdemê!

Nûdem dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alî-kariya wê bike, bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê Nûdemê

Ji bo Swêd salekê 190 Sek, welatên din 50 \$

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....

Vê karta jor dagirin û li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiyê ji we re bişînin

Xorto wilo bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya ewan bike ko çêdikin, ava dikin... Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bit. Di her tiştî de, nemaze di karên nû destpêkirî de, pirîcar, kêmanî hene. Heke te kêmanî dîtin, hema dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan biedilînî. Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stûna xwêl de ye.

Celadet Alî Bedir-Xan